

K.T.

ZANÎNGEHA VAN YÛZÛNCÛ YILÊ

ENSTITUYA ZIMANÊN ZINDÎ

ŞAXA MAKEZANÎSTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ



**DI ÇÎROKÊN MELE MEHMÛDÊ BAZÎDÎ DA
KESAYETÊN DÎROKÎ**

TEZA LÎSANS A BİLİND

AMADEKAR

FEHMÎ KAREEM HAMAD SALIM

VAN- 2020

K.T.

ZANÎNGEHA VAN YÛZÛNCÛ YILÊ

ENSTITUYA ZIMANÊN ZINDÎ

ŞAXA MAKEZANÎSTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ



**DI ÇÎROKÊN MELE MEHMÛDÊ BAZÎDÎ DA
KESAYETÊN DÎROKÎ**

TEZA LÎSANS A BİLİND

AMADEKAR

FEHMÎ KAREEM HAMAD SALIM

ŞÊWIRMEND

Doç. Dr. NESİM SÖNMEZ

VAN- 2020

T.C.
VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENİSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI



**MOLLA MEHMÛD BAZİDÎ'NİN HİKAYELERİNDE
TARİHİ ŞAHSİYETLER**

YÜKSEK LİSANS TEZİ

HAZIRLAYAN

FEHMÎ KAREEM HAMAD SALIM

DANIŞMAN

Doç. Dr. NESİM SÖNMEZ

VAN- 2020

BİLDİRİM

Hazırladığım tezin/raporun tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi taahhüt eder, tezimin/raporumun kâğıt ve elektronik kopyalarının Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Kürt Dili ve Kültürü ABD arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım:

- Tezimin/Raporumun tamamı her yerden erişime açılabilir.
- Tezim/Raporum sadece Yüzüncü Yıl Üniversitesi yerleşkesinden erişime açılabilir.
- Tezimin/Raporumun yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/raporumun tamamı her yerden erişime açılabilir.

[Jüri Tarihi]

[İmza]

Fehmî Kareem Hamad SALIM

NAVEROK

KURTE	VIII
ÖZET.....	IX
ABSTRACT.....	X
PEŞGOTIN	XI
KURTEBÊJE	XIII
DESTPÊK.....	1
1. JIYAN Û BERHEMÊN MELE MEHMÛDÊ BAZÎDÎ (1797-1867)	6
1.1. Jiyana Wî.....	6
1.2. Bazîd û Mîrektîya Serhedê	10
1.3. Peywendîya Mele Mehmûd û Aleksander Jaba.....	15
1.4. Berhemên Wî.....	17
1.4.1. Camî'eya Risaleyan û Hikayetan.....	17
1.4.2. 'Adat û Rusumatnameê Ekradiye	18
1.4.3. Tewarîxa Cedîdê Kurdistan	19
1.4.4. Şerefnameya Şerefîxan a Tercuma Mele Mehmûdê Bazîdî	20
1.4.5. Mem û Zîn, Yusif û Zuleyxa, Leyla û Mecnûn, Sêxê Sen'an	21
1.4.6. Xebatên Ferhengî.....	21
1.4.7. Kilam, Bêrîte, Gotinên Pêşîyan	24
2. PÊNASEYA ÇÎROKÊ Û DÎROKA ÇÎROKA KURDÎ	25
2.1. Pênaseya Çîrokê	25
2.2. Cureyên Çîroka.....	26
2.2.1. Çîrokên Ajalan (Meselokên Lawiran).....	28
2.2.2. Çîrokên Rasteqîn.....	29
2.2.3. Çîrokên Zîncîreyî (Muteselsîl).....	29
2.2.4. Çîrokên Neasayî (Fewqulade).....	29
2.2.5. Çîrokên Pêkenok	30
2.3. Naveroka Çîrokê.....	30
2.4. Çavkanîyên Çîrokê	31
2.5. Lehengên Çîrokê	32

2.6.	Çîrokê de Cih û Dem.....	32
2.7.	Çîrokê de Bûyer.....	33
2.8.	Li Dinyayê Çîrok.....	33
2.8.1.	Çîrokên Hindan	34
2.8.2.	Çîrokên ‘Ereban	35
2.8.3.	Çîrokên Îraniyan.....	35
2.8.4.	Çîrokên Ewrûpiyan	35
2.8.5.	Çîrokên Kurdan	36
2.8.5.1.	Taybetiyên Çîrokên Kurdî Yên Gelêrî.....	38

3.DI 40 ÇÎROKÊN MELE MEHMÛDÊ BAZÎDÎ DA KESAYETÊN DÎROKÎ 44

3.1.	Şiroveya Çîroka Yekê.....	46
3.2.	Şiroveya Çîroka Duyê.....	46
3.3.	Şiroveya Çîroka Sêyê.....	47
3.4.	Şiroveya Çîroka Çarê.....	48
3.5.	Şiroveya Çîroka Pêncê.....	49
3.6.	Şiroveya Çîroka Şeşê.....	50
3.7.	Şiroveya Çîroka Heftê	50
3.8.	Şiroveya Çîroka Heştê	51
3.9.	Şiroveya Çîroka Nehê.....	52
3.10.	Şiroveya Çîroka Dehê.....	53
3.11.	Şiroveya Çîroka Yanzdeyê	54
3.12.	Şiroveya Çîroka Duwanzdeyê	55
3.13.	Şiroveya Çîroka Sêzdeyê	56
3.14.	Şiroveya Çîroka Çardeyê	57
3.15.	Şiroveya Çîroka Panzdeyê	57
3.16.	Şiroveya Çîroka Şanzdeyê	58
3.17.	Şiroveya Çîroka Hefdeyê.....	60
3.18.	Şîrovaya Çîroka Hejdeyê	61
3.19.	Şiroveya Çîroka Nozdeyê	61
3.20.	Şiroveya Çîroka Bîstê	63
3.21.	Şiroveya Çîroka Bistûyekê	64
3.22.	Şiroveya Çîroka Bistûduyê	65

3.23. Şiroveya Çîroka Bistûsiyê	66
3.24. Şiroveya Çîroka Bistûçarê	67
3.25. Şiroveya Çîroka Bistûpençê.....	68
3.26. Şiroveya Çîroka Bistûşeşê	69
3.27. Şiroveya Çîroka Bistûheftê.....	70
3.28. Şiroveya Çîroka Bistûheştê.....	71
3.29. Şiroveya Çîroka Bistûnehê	72
3.30. Şiroveya Çîroka Siyê	73
3.31. Şiroveya Çîroka Sîûyekê	74
3.32. Şiroveya Çîroka Sîûduyê	75
3.33. Şiroveya Çîroka Sîûsisê	76
3.34. Şiroveya Çîroka Sîûçaran	77
3.35. Şiroveya Çîroka Sîûpencê.....	78
3.36. Şiroveya Çîroka Sîûşeşê	79
3.37. Şiroveya Çîroka Sîûheftê	81
3.38. Şiroveya Çîroka Sîûheştê.....	82
3.39. Şiroveya Çîroka Sîûnehê	83
3.40. Şiroveya Çîroka Çilê.....	85
Tabloyek Derheqê Kesayetiye Dîrokî Da	86
ENCAM.....	89
ÇAVKANÎ.....	92
JÎYANAME	

Teza Lîsansa Bilind
Fehmî Kareem Hamad SALIM
ZANÎNGEHA VAN YÛZÛNCÛ YILÊ
ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ
Adar - 2020

DI ÇÎROKÊN MELE MEHMÛDÊ BAZÎDÎ DA KESAYETÎYÊN DÎROKÎ
KURTE

Ev xebata li ser berhema “*Cami’eya Risaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*” ya Mele Mehmûdê Bazîdî bi hêla 40 çîrokên da “Kesayetên Dîrokî” derbarê perwerdehî û civaknasîyê de hat nivîsandin. Ji ber ku çîrok, dîrok, wêje, çand ji bo hemû layenên civakê pêwistin. Ji ber vê yekê di vê xebatê de hewcebûna rawestina li ser Mele Mehmûdê Bazîdî û berhemên wî yên hikayetên pend û şîret me girîng dît û analîza wan bi awayekî aqademik da dîyarkirin.

Dîrok, kesayetên dîrokî, ziman, wêje, çand wek raporteka (xulaseyeka) gelên kevnare jibo îro tên bikaranîn. Anko e’ynika gelane kû di hemû astên civakê ronî dikin. Ev xebata jî despêk, sê beşan û encamê ve pêktê.

Beşa Yekem: Ev beşa bi navê “*Jîyana Mele Mahmûdê Bazîdî û Berhemên Wî*” bi awayekî giştî behsa jîyan, perwerdehî, berhem û têkeliyên Mele Mehmûd dike.

Beşa Duyem: Ev beşa jî bi navê “*Pênaseya Çîrokê û Çîroka Kurdî*” ye. Anko pênase, babet, cure û edebiyata dînya û Kurdî da behsa çîrokê dike.

Beşa Seyem: Ev beşa li jêr jî nav û nîşan behsa “*Di 40 Çîrokên Mele Mehmûdê Bazîdî Da Kesayetên Dîrokî*” dike..

Peyvên Sereke : Çîrok, Kesayetên Dîrokî, Edebiyata Klasîk, Aleksandre Jaba û Mele Mehmûdê Bazîdî.

Hejmara Rûpelan : XIII+97

Şewirmendê Tezê : Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ

Yüksek Lisans Tezi
Fehmî Kareem Hamad SALIM
VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANA BİLİM DALI
Mart - 2020

**MELA MAHMÛD BAZİDÎ'NİN HİKÂYELERİNDEKİ TARİHİ
ŞAHSİYETLER**

ÖZET

Bu çalışmada Molla Mahmûd Bazidî'nin "*Cami'eya Risaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*" (Bütün Risale ve Hikayeleri) adlı eserindeki 40 hikâyede geçen tarihi kahraman ve şahsiyetlerin topluma etkisi üzerinde duruldu. Çünkü hikâyedeki kahraman ve tarihi şahsiyetlerin toplumun bütün katmanları üzerindeki rolü önemlidir. Bunun içindir ki bu çalışmada 40 hikâyedeki kahraman ve tarihi şahsiyetler üzerinde durmayı gerekli gördük ve analizlerini akademik bir şekilde açıklama ihtiyacı duyduk.

Hikâyedeki kahraman ve tarihi şahsiyetlerin rolü eski milletlerin bir aynası gibi günümüze yansımaktadır. Yani bir ayna gibi toplumun bütün yönlerini aydınlatmaktadır. Bu çalışma başlangıç, üç bölüm ve sonuç bölümünden oluşmaktadır.

Birinci Bölüm: Bu bölümde "*Molla Mahmûd Bazidî'nin Hayatı ve Eserleri*" üzerinde duruldu. Yani genel olarak hayatı, eserleri ve sosyal ilişkileri üzerinde durulmaktadır.

İkinci Bölüm: Bu bölümde ise "*Hikâyenin Tarifi ve Kürt Hikâyesi*" üzerinde duruldu. Yani hikâyenin tarifi, konusu, çeşitleri, dünya ve Kürt edebiyatında yeri üzerinde duruldu.

Üçüncü Bölüm: Bu bölümde de "*Molla Mahmûd Bazidî'nin 40 Hikâyesindeki Tarihi Şahsiyetler*" üzerinde duruldu.

Anahtar Kelimeler : Hikâye, Tarihi Şahsiyet, Klasik Edebiyat, Aleksandre Jaba, Molla Mehmûd Bazidî.

Sayfa Adedi : XIII+97

Danışman : Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ

Master Thesis

Fehmî Kareem Hamad SALIM

VAN YUZUNCU YIL UNIVERSITÛY

INSTITUTE OF THE LITERATURE OF LIVING LANGUAGES

KURDISH LANGUAGE AND CULTURE DEPARTMENT

March - 2020

THE HISTORICAL PERSONALITIES IN THE STORIES OF MELE

MEHMÛDÊ BAZÎDÎ

ABSTRACT

This study focuses on the impact of historical heroes and personalities in 40 stories of Molla Mahmûd Bazidî's work "*Cami'eya Risaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*" on society. Because the role of the stories' historical personalities and heroes on all parts of society is important.

On this basis, it is essential to focus on the historical personalities and heroes and it is needed to analyze them academically in this study

The role of the historical personalities and heroes have reflected to the present time like a mirror of old nations. In other words, they illuminate all aspects of society like a mirror. This study contains introduction, tree sections and conclusion

Section I: It emphasizes on "*Life and Works of Molla Mahmûd Bazidî*" in this section. Namely it mentions about his life, works and social relations in general.

Section II: It emphasizes on "*Description of Story and Kurdish Story*" in this section. So it focuses on decription of story, its types and place in World and Kurdish Literature.

Section III: It emphasizes on "*The Historical Personalities in the stories of Molla Mahmûd Bazidî*". In other words it tells about the role of the historical personalities and heroes on society.

Key Words : Story, History Personality, Clasis Literatüre, Aleksandre Jaba, Molla Mehmûd Bazidî.

QuantitÛy of Page : XIII+97

Thesis Supervisor : Doç. Dr.Nesim SÖNMEZ

PEŞGOTIN

Mele Mehmûdê Bazîdî kesayet û zanayekî girîng e ku di gelek waran de berhem dane. Çîroknivîsî jî yek ji van waran e. Çîrokên Mele Mehmûdê Bazîdî, çil çîrok yê berhema Camî'eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî, Mem û Zîn, Leyla û Mecnûn, Yûsûf û Zuleyxa û ji 83 çîrokên farsî werger pêk tên. Li gorî mijara tezê, şîrovekirina çîrokên Mele Mehmûdê Bazîdî, ji aliyê dîrok û qehremanên dîrokî ve hate analîzkirin. Em dixwazin ku di vê xebatê de Mele Mahmûdê Bazîdî jî zêdetir bidin nasîn. Piştî hinek agahiyên din derbarê jiyana û berhemên Mele Mahmûd Bazîdî em bi gelemperî li ser çîrokên wî bisekinin.

Di asta yekemîn de li ser jiyana Mele Mehmûdê Bazîdî û berhemên wî hate rawestandî. Di asta duyemîn a beşa praktîkê da li ser pênasa çîrokê û cureyên vê hat sekinandin. Di asta sêyemîn da jî di çîrokên Mele Mehmûdê Bazîdî da pêwendîya di navbera qehreman û kesayetên dîrokî bi civaka kurdan ra yê serdema wî zêdetir ronî dikin hat sekinandin. Lêkolîn li ser çîrokên Bazîdî û kesayetên dîrokî yê wan çîrokan da derbas dibin hate kirin. Bi vî awayî çîrokên Mele Mehmûdê Bazîdî ji aliyê dîrokî û qehremanî ve hate şîrovekirin. Çîrokên Mele Mehmûdê Bazîdî yê di berhema "*Camî'eya Rîsaleyan û Hikayetan*" de wergera ji pirtûka Ziya Avci transkîrîp kiriye hatin girtin. Teza me xebateka dîrokiye ku em zêdetir li ser kesayetên dîrokî û naveroka çîrokên Mele Mehmûd yê civakî rawestîyan. Ango me çîrok li gorî dîrok û qehremanên ku nivîskar hilgirtine dabeş û şîrove kirin.

Ji bo ku analîza dîrokî hêsantir bê kirin, me çîrok li gorî kesayetên dîrokî kategorîze kirin û di bin banê sernivîsên diyarkirî de civandin. Piştî wan çîrokên ku me tesnîf kiribûn, dem dem dan berhev û li ser dîrok, qehreman û kesayetan şîrove kirin. Ka çî ra Mele Mehmûd ev kesayet bilbijiratin û rola wan çîrokê da çî ye.

Çîrokên Mele Mehmûdê Bazîdî di navbera asta çîroka gelerî û çîrokên nûjen de cih digre. Hêmanên vegotinên gelerî û nûjen bi hev re di nava xwe de dihewîne. Ev taybetî, girîngiya van çîrokan derdixe holê. Wekî ku tê zanîn li gorî zêdetir çîroknivîsan çîroka "*Mem û Zîn*" a Ehmedê Xanî yekemîn çîrok û pexşana Kurdî tê qebul kirin. Çîrokên Mele Mehmûdê Bazîdî di vê kategorîyê da di asta pîra modernî dane. Ev taybetiya bihevrebûna unsûrên modernî ligel gelerî yê çîrokên Bazîdî ne taybetiyeke çîroka Kurdî ye. Li ser dabeşkirina çîrokên destpêka modernî gelek wêjevan li ser fikra zehmetiya tesnîfkirina çîrokên pêşîn disekin. Xeta tenik ya di

navbera çîroka modern û gelerî de, carinan dibe ku qet xuya jî nabe. Hin çîrok hene ku mirov dikare wan ji herdu cureyan bihesibîne. Di wêjeya cihanê de mirov li destpêka çîroknûsiya nûjenî binere heman tecrube di her wêjeya gelî de heye. Wêje her çiqas ji pêwajoyê sûde wergirtiye jî, ji carekê dest ji reha xwe ya gelerî bernedaye û bi derbekê de terza nûjen bidest nexistiye. Di destpêka çîroka Erebi, Farisî û Tirkî de jî heman rewş xuyaye. Di edebiyata Kurdî de di pêvajoya derbasbûna ji çîrokên gelerî ber bi çîrokên nûjen de çîrokên Mele Mehmûdê Bazîdî merteba pêşîne. Ji alîkî dest ji ‘adet û taybetiyên gelerî bernade û dajo ji aliyê dinê bi hêmayên rojavayî pêşengiyê ji çîroka Kurdî ya nûjen re dike.

Ez berîya her tiştî spasîya mamosteyên hêja û rêzdar yên beşa zimanê Kurdî li Zanîngeha Van Yüzüncü Yil ê dikim ku bi ked û dilsozîyeke herî zêde bi me re westîyan. Her wiha ez pir spasîya Doc. Dr. Nesim SÖNMEZ dikim ku erkê serpereştîkirina vê lêkolînê bi stûyê xwe ve wergirt. Her wisa pir ji dil spasîya mamoste qedirgiran Salih EZÎZ dikim ku bi pêşniyarî û rê nîşankirina wê ve gelek arîşe li ber min ron bûn. Hem di warê Kurdîzanebûnê de hem jî di warê akademîk de alîkarîyên wî gelek çê bûn. Ji ber parvekirina fikir û ramanên xwe yên nirxînd. Ji bo sererastkirin, werger û xwandina tezê ji birêz lêkolîner û wergervan Ehmed SERHEDÎ, her wisa rewşenbîr û lêkolîner Tehsin İbrahim DOSKÎ û Dr. Qubad KELARÎ re jî gelek spasdarim û mala wan ava.

Her wiha di pêvajoya vê xebatê de ji bo sebr û tehemûl û alîkarîya wan ya manewî û heman dem vê xebatê pêşkêşî dayîk û birayên xwe dikim ku hertim alîkarên min ên maddî û manevî bûn zêdebarî xoşik û bira û hemû malbata xwe û dayîka mindalê min Akar dikim. Û li dawîyê spasî ji bo her kesê ku alîkar bûye digel me ji bo bi dawî anîna vê lêkolînê.

Fehmî Kareem Hamad SALIM

Van- 2020

KURTEBÊJE

amd.	: amadekar
bnb.	: berhema navborî
bnç.	: berhema neçapbûyî
bnr.	: binêrin
br.	: berhevkirin
b.z.	: Pêşiya zayendê
c.c	: Cellecelaluhû
c.	: cild
ç.	: çap
g.	: gotar
g.n.	: gotara navborî
h.	: hejmar
h.b.	: heman berhem
h.d.	: heta dawî
hwd.	: her wekî din
s.x.l.	: slava Xwedê lêbe.
tîp.	: tîpgehezî
vgz.	: veguhezêr
wer.	: wergêr
z.	: zayînî

DESTPÊK

Di vê xebatê da mijar e ve ku li ser Mele Mahmûdê Bazîdî, serdem û berhemên wî û bi taybetî jî pirtûka wî ya “Cami’eya Risaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî” çava hatiye nivîsandin û mijar û lehengên dîrokî yên vê pirtûkê çî ne. Ango jiyana wî çawa derbas bûye, serdema wî çî buyer qewimîne û hikayetên rasteqîn yên vê berhema wî da kîjan leheng û kesayetên dîrokî hatine hilbijartin. Di nav wan risteyên 40 hikayetên ku di nav gelê xwe raste rast da tomar kirine kîjan kesayetên dîrokî nirxandine û pesnê wan kirine yan jî rexne lê girê dane. Erkê wan kesayetan çîye, ji bo civakê çî şîret û pendê dide.

Di naveroka berhema “Cami’eya Risaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî” da gelo kîjan kesayetên dîrokî hatine nivîsandin û ev kesayet gelekî an na. Ji e vê xebatê mabeset e ve ku em bikarbînînin hem kesayetên di nav çîrokên vê berhemê de derxînin holê hem jî qehremanên dîrokî yên di nav çîrokên wî da bidin nasandîn.

Dîsan armancaka din jî ya vê xebatê taybetiyên qehreman, kesayet û pêwendiyên dîrokî yên di çîrokên di berhema “Cami’eya Risaleyan û Hikayetan” ya nivîskarê Kurd yê navdar Mele Mahmûdê Bazîdê ye. Di warê çîrok û dîroka mijarên çîrokan da Mele Mahmûd Bazîdî di naveroka çîrokan da çî kesayetî û meseleyên dîrokî hatine amaje kirin. Ew pirtûka wî ya “Cami’eya Risaleyan û Hikayetan” da di nav 40 çîrokan da çî sûd û mafê dide dîrok, çand û edebiyata Kurdî.

Di nav çîrok, jiyana û berhemên Mele Mahmûd Bazîdî da kîjan taybetiyên dîrokî, kesayetî tekilîyên bi bîyanîyan û welatên dewrûdore ra hene. Em ê li ser wan mijaran rawestin. Şîrove û tehlîlên nû bi awayekî nû akademîk bînin holê.

Naverok û Toxûbên Xebatê

Birastî jî naveroka vê xebata me her çiqasî girîng be jî mixabin çavkaniyên wê dewra berhema çîrokên nivîskarê mezin Mele Mehmûd dide nîşan agahi hê tamam nebûne an veşartî mane, an jî ji ber ku nivîskarên Kurdan bidestxet nivîsandine û car din hezar car mixabin hêjî kismekî wan lê nehatine weşandin û nayêne dîtin, heta wan salan kêma hatine belavbûn. Ev jî ji bo xebata me toxûbekî neyînî ye û astengeke û benda diyarbûna wêjeyê û derketina agahiyên taze dike.

Tiştêkî hêjayî pesnê ye ku di wan salên dawî da wergerên çîrokên Mele Mehmûd Bazîdî wek pirtûk, gotar û tezên akademîk hatine amadekirin.

Di vê xebatê da em ê bes li ser 40 çîrokên ku di pirtûka “Cami’eya Risaleyan û Hikayetan” da bisekinin. Despêkê da em dixwazin derbare vê berhemê da hinek kurte agahîyan bidin.

Ev berhem bi navê “*Cami’eya Risaleyan û Hikayetan*” ve di sala 1860’î da hatiye nivîsîn. Navê vê berhemê digel wergera wê ya fransî ya ku ji layê A. Jaba ve hatiye kirin ji layê P. Lerch ve bi Kurdî bi navê “*Cami’eya Risaleyan û Hikayetan*” di arşîva Petersburgê de cihê xwe digire.¹ Ev berhem li Petersburgê bi navê “*Recueil de Notices et Recits Kourdes*” hatiye çapkirin. Piştî bi navê “Çîrokên Kurmancî” ji aliyê Weşana Çanda Nûjen ve li Stocholmê hatiye çapkirin.² Piştî bi navê “*Cami’eya Risaleyan û Hikayetan bi Zimanê Kurmancî*” bi traskirîpa mamoste Ziya Avcî, çapkirina çapxana Lîsê ve li Stenbolê amade bûye.

Ev pirtûka nav û nîşan ji sê maqale û çil çîrokên rasteqîn pêk tê. Navê maqaleyên tê da jî bi vî şiklî ne: “*Be’zê Eşair û Qebail û Taîfeyêd Kurdîstanê*”, “*Navên Mêr û Jinên Kurmancan*” û “*Behsa Şair û Musenefên di Kurdîstanê*.” Ev beşa sê maqaleyan hatiye nivîsandin berî çil çîrokan tê. Di van maqaleyan de behsa hejmar û malbatên eşîran, navên kurmancî çi jin çi mêr û çend helbestvanên Kurd yên navdar hatiye kirin.³

Çîrokên vê berhemê ji layê Mele Mehmûd Bazîdî ve hatiye nivîsîn û berhevkin. A. Jaba jî bi mabesta ku vê arşîva ku ji destxetên pêk tê tomar bike û bişîne Akademiya St. Petersburg a Rusyayê têkiliye dema bajara Erziromê bû bi Mele Mehmûd Bazîdî re datîne û wî ji xwe re wek mamoste, rênîşander û rêheval dibîne.⁴

¹ Ferhad Pîrbal, *Mele Mehmûdê Bayezîdî (1799-1867) Yekemîn Çîrok Nivîs û Pexşan Nivîsî Kurd*, Weşanxana Aras, Hewlêr, 2000,9-12. ; Şerif Güzel, *Lêkolîneke Sentaksî Li Ser Berhema Camî’eya Risaleyan û Hikayetan*, Zanîngeha Mûş Alparslan, Enstîtuya Zanîstên Cîvakî Şaxa Makezanîsta Ziman û Çanda Kurdî, Teza Mastîrê Ya Çapnebûyî, Mûş, 2018, 2-7; Mela Mehmûdê Bazîdî, *Cami’eya Risaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, (Amd.: Ziya Avcî), Weşanên Lîs, Stenbol, 2010, 18.

² Abdurahman Adak, *Destpêka Edebîyata Kurdî Ya Klasîk*, Weşanên Nûbiharê, Stenbol, 2014, 340-343; Güzel, *b.n.b.*,2-7.

³ Bazîdî, *Cami’eya Risaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 9.

⁴ Mustafa Öztürk, “Çîrokên Wergerên Mela Mehmûdê Bazîdî (1797-1870)”, *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, h. 8, Bingöl, 2018, 33-63; Güzel, *b.n.b.*, 2-7.

Her çîqas ewan çîrok wek meselokên gelêrî, serpêhatî, hikayetên dîrokî û gotinên mezinanin. Di heman demê da jî çîrokên ku em ê li ser bixebitin yên di nav vê berhemê da derbas dibin yên rasteqîn û civakî ne.

Astengîyên Xebatê

Di vê xebata me de di jwariya herî mezin kêmasiya çavkaniyan e. Nivîsên derbarê nivîskarê mezin Mele Mehmûd û berhema “Cami’eya Risaleyan û Hikayetan” de hatine nivîsandin kêmîn û destxetîn. Peydabûn û wergêra wan hikayetan hinekî zehmetiye lewra tekstên wan kevin bûne û êdî nayên dîtîn û xwandin.

Dîsan peydabûna agahiyên derbareyê jiyan û berhemên Mele Mehmûd jî wek gelek şair û navdêrên beriya xwe yan berze bûne yan di arşivan da riziyan yan jî weşandina wan qedexe bûne. Digel vê rastîye di jwariyeka din jî eve ku piraniya arşivên welatên bîyaniyan da jî heta radeyekê agahî hatine destxistin û li ser lêkolîn çêbûne.

Di ware rastxwendin û destxetan da jî gelek di jwarî hene. Wergerên vê berhemê jib o çend zimana çê bûne û di wan wergeran da peyvên nêzikî 200 sal berê hatine bikaranîn. Fehm kirina wan peyvên pisporiyeka zêde dixwaze û pêwîste lêkolîner zimanê kurdî, ‘erebî û farsî û heta osmanî jî baş bizanê. Lewra zêdetir peyvên ‘erebî û farsî di nav çîrokan da derbasdin.

Digel wan di jwariyan dema ku mirow çîrokên Mele Mehmûd dixwunê dibîne ku behsa dîrok, erdnîgarî û lehengên dîrokî ji tê kirin. Çimkî çîrok rasteqînin û ji ber vê jî astengiyeka din jî eve ku pewistiya dîrok zanîn û erdnîgariya kurdan naskirinê heye.

Lêkolîner û nivîskar Ziya Avcî derheqe hinek astengîyên wan çîrokan da wiha dibêje: *“Di esyanê transkîrîpteya nivîseke kurdî ya ji alfabeya erebî li ser alfabeya latînî de, hinek astengî hene. Çend heb ji wan ev in, ku em li vir jî lê rast hatin. Yek jê ew “y”a alfabeya erebî ya di dawîya bêjeyê de tê nivîsandin e. Mirov di esnayê transkîrîpteyê de dikare wê “y”ya alfabeya erebî hem “î” bixwîne û hem jî “ê” bixwîne. Ji ber vê me ew li gor zayenda gotinê xwend û nivîsand. Yanî li gor nêr û mêtiya gotinê. Xaleke din jî ku min di çend ciyên din de jî dabû xuyakirin, wekî nimûne halê lêkera “kirin”ê ya dema niha, ku di esnayê transkîrîpteya ji alfabeya*

*erebî li ser alfabeya latînî de, mirov dikare “em diken” an jî “em dikin” bixwîne. Min, li vir û li ciyên din jî forma “em diken” bijart û bêjeyên bi vî awayî bi tîpa “e”yê xwendin.”*⁵

Hinek astengîyên din jî wergêr û cureyên wergeranin ku ango çawa hatin wergerandin. Hinek dijwarî ji bi layê zaraveyên ziman û Kurdîya sed sala nozdehem da jî hene.

Dîsan di vê sernavê de, materyalên ku bên bikaranîn çî ne, çawa û bi çî awayî û kengê tîna bikaranîn; ji bo gihiştina armanc û mabestê, plansazîya cerabî û rêbaz çî ne; daneyên ku bi dest dikevin dê çawa bên nirxandin; Divê tev bi şiklekî berfireh û aşkere bên dîyarkirin ku astengîyên xebatê rabin.

Çavkaniyên Xebatê

Ev xebat li ser lêkolînên nivîskî, malperî, destxet û wergerên çîrokên Mele Mehmûd hatiye amadekirin û li wan çavkaniyan sûd hatiye wergirtin. Lê belê heta wan salên dawî derheqê Mele Mehmûd û berhemên wî da kêma agahî hebûn. Piştî ku arşîva Mele Mehmûd hat zanîngeha Mêrdînê ji bilî nivîskarên biyanî û rewşenbîrên Kurd û lêkolînerên ehlî jî gelek xebat kirin.

Derbarê mijara teza me de birêz Ferhad Pîrbal, Xelîl Dihokî, Se’d Derêşî, Murad Celalî, Ziya Avcî wek kitêb, Şerif Güzel, Evîn Bilge û Ahmet Öner wek tez (name) û Têmûrê Xelîl, Muhsîn Seyda, Mustafa Öztürk, Mehmet Gültekin wek maqale nivîsandine. Her çî qas heta wan dawiyên çavkanî kêmbin jî me di teza xwe da zêdetirîn li wan xebatên jêrîn îstîfade kirin.

Cami’eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî, Ev kitêba Mele Mehmûdê Bazîdî, di sala 2010 an da bi layê nivîskar û lêkolînerê hêja Ziya Avcî va hatiye latînîze kirin. Bi layê weşanxana Lîsê bajara Stenbolê hatiye çapkirin. Ev berhem traskirîpta xwe da hinek şaşî û zelal nebûyîn jî bixevîne jî kedeka hêjayî xwandin û pêsnê ye. Me di xebata xwe da beşa jiyana Mele Mehmûd û şîrovêyên çîrokan da gelek sûd vê berhemê wergirt.

Mele Mehmûdê Bayezîdî (1799-1860) Yekemîn Çîroknûs û Pexşannûsî Kurd, Ev pirtûk jî bi layê birêz Ferhad Pîrbal, di sala 2000 an da bajara Hewlêrê

⁵ Bazîdî, *Cami’eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 9.

hatiye amedekirin. Weşanxane Aras ev xebata qedrû qîmet herî zûtir çap kiriye. Ev berhema xebateka akademîk û zanîstiyê. Her çiqas birêz Pîrbal ev berhem di nav kêma agahiyan da jî amade kiriye. Lêbelê gelek mijarên derbareyî Mele Mehmûd û Berhemên wî zelal û ronî kiriye. Me di xebata xwe da beşa jîyan û berhemên wî da zêdetir agahî lêgirtine.

Ji Hêla Naverokê ve Dahûrîna Çîrokên Mele Mehmûdê Bazîdî, Ev name jî bi layê Evîn Bilge ye sala. 2013an da Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî wek teza lîsansa bilind, bajara Mêrdînê hatiye amedekirin. Lêbelê gelek mijarên derbareyî çîrokên Mele Mehmûd yêna rasteqîn zelal û ronî kiriye. Me di xebata xwe da beşa şîroveya çîrokan û pênasêya çîrokê da zêdetir agahî lêgirtine.

Lêkolîneke Sentaksî Li Ser Berhema Camî'eya Rîsaleyan û Hikayetan, mamoste Şerif Güzel di sala 2018an ev name Zanîngeha Mûş Alparslan Enstîtuya Zanîstên Civakî Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî da wek teza mastirê ya çapnebûyî, li bajara Mûşê amade kiriye. Lêbelê gelek mijarên derbareyî berhema "Camî'eya Rîsaleyan û Hikayetan" ya Mele Mehmûd zelal û ronî kiriye. Me di xebata xwe da beşa şîroveya çîrokan da zêde agahî lêgirtine.

Tarihi ve Kültürü ile Doğubayazıt (Digel Dîrok û Çanda Xwe Bazîd), Ev xebat bi layê Ahmet Öner va di sala 2019 an da di Zanîngeha Wan Yüzüncü Yilê, Enstîtuya Zanîstên Civakî da wek teza mastirê ya çapnebûyî bajara Wanê hatiye amedekirin. Ev nameya ku bi nave "Digel Dîrok û Çanda Xwe Bazîd)" di warê dîroka sedsalan ya Bazîdê û jîyana Mele Mehmûd Bazîdî û gelek helbestvan û şairên Kurd da agahiyên akademîk û nûjen yêna herî dawî wek çavkanîyeka berfireh dide xebatên nû. Me jî di xebata xwe da derheqê mîrekiya Serhedê ku bajara wê ya sereke Bazîde, cihe ku Mele Mahmûd lê dayîk bûye û beşa jîyan û berhemên Mele Mehmûd da gelek agahiyên nû ji vê xebatê wergirtin.

1. JIYAN Ê BERHEMÊN MELE MEHMÛDÊ BAZÎDÎ (1797-1867)

Derheqê jiyana Mele Mehmûdê Bazîdî heta niha agahiyên li ber dest, pir zêde nînin, feqet her roj ev agahî zelal dibin û pêşva diçin. Lê bi saya destnivîs, berhem û hevalê wî Aleksandır Jaba⁶ em gelek tiştan hîndibin û dikarin bibêjin. Dema ku mirow bibêje derheqê wî da agahiyên zêde, yanî li ku xwend, mamoste, dayîk û bavên wî, malbata wî kî bûn. Dîsan gera wî ji bo zanîne û detayên din ên jiyane ku mixabin hemû klasîkên me jê bêpar in. Jiyana Bazîdî jî eger agahiyên heval û şagirdê wî A. Jaba ne bûya ewqasî zelal nedibû.

1.1. Jiyana Wî

Mele Mehmûd Bazîdî edîb, zanyar, dîrokzan, civaknas, wergervan û nivîskarekî Kurde ku di sedsala 19 an de dest bi nivîsandina berhem û çapemenîya Kurdî kiriye. Wî bi pirtûka Şerefname Bedlîsî ya Şerefname wergerandiye zimanê Kurdî, bi vê va dest xebatan kiriye, herweha gelek rêziman,⁷ çîrokên gelêrî û dîroka Kurdan jî nivîsandine.

Mele Mehmûdê Bazîdî, yek ji wan zana û rewşenbîrê Kurd yê herî pir berhem e. Ew yekem rewşenbîr û zanyarê Kurd e ku di sedsala 19an de, di hemî danûsitandin û xebatên xwe de tenê zimanê Kurdî bikar aniye. Her wekî tê zanîn, bi taybetî di sedsala 19an de, Farisî û Erebî di nav zana û rewşenbîrên Kurd de gelek di rewacê de bû. Hema bêje nêzikî temamê zana û rewşenbîrên Kurd di karên xwe yê nivîsandinê de, ev herdu ziman bikar anîne. Lê em dinêrin Mele Mehmûd bi eksê vê hereket kiriye. Di hemî kar û barên xwe de û ew kitêbên ji aliyê wî ve hatine nivîsandin, bi zimanê Kurdî ne.

Mele Mehmûd, di sala 1797'an li navçeya Bazîdê ji dayîk bûye. Ji bo dayîk bûna wî tevlihevbûnek heye. Çarna 1799 çarna jî 1797 tê gotin. Peter Lerch nivîseke

⁶ Alexander Jaba (1803-1894), di sala 1804an de li Polonyayê hatiye dinê û di sala 1824an de di wezareta derve de dibe werger. Di sala 1828an de xwendina xwe ya bilind xelas dike. Di sala 1830an de, di beşa zimanên rojhilatê de, dibe wergerê zimanê tirkî. Di sala 1832an de bi wezîfe diçe Stenbolê û di sala 1835an de jî cardin ji aliyê wezareta derve ve li Îzmîrê tê wezîfedar kirin. Di sala 1843an de, dibe sekreterê diwana serokatiyê û di sala 1848an de jî dibe konsolosê Erziromê. Ev wezîfeya wî heta sala 1869an dewam dike. Li wir li ber destê Mele Mehmûdê Bayezîdî kurdî jî hîn dibe. Bnr: Murad Celalî, *Mele Mehmûdê Bazîdî û 'Adat û Rusûmatnameê Tewayîfê Ekradiye*, Weşanên Nûbihar, Stenbol, 21016, 52-58; Rohat Alakom, "Bir İzmir Lavanteni Auguste Jaba", *Kovara Kürt Tarihi*, 2014, h.11.

⁷ Rêziman: Gramer, fonetik û qaydeyên nivîsê: (D.Îzoli, *Ferheng Kurdî-Tirkî, Tirkî- Kurdî*, Weşanên Deng Stenbol, 2013)

xwe de temasî nameyeke Jaba dibe ku ji Lerch re di îlona 1857an de şandiye. Ew di nameye de dibêje ku temenê Mele Mehmûd 60 sal in. Ev jî dide xuyakirin ku Mele Mehmûd di sala 1797an de ji dayîk bûye.”⁸

Piştî ku medreseyê diqedîne û dibe meleyekî çê, navê Mehmûd dibe Mele Mehmûd û dûv ra jî navçeya Bazîdê ya ku lê ji dayîk bû, dibe paşnavê wî. Herwiha di nava gel de weke Mele Mehmûdê Bazîdî tê naskirin. Piştî temenkî têr û tijî di sala 1863an çûye dilovaniya xwe. Mele Mehmûd, zaroktiya xwe li Bazîdê derbas dike. Dûv re dest bi xwendinê dike û pêşî fêrî xwendina Quranê dibe. Ji bo xwendina Nûbihara Ehmedê Xanî û berhemên din, derbasî medreseya Bazîdê dibe.⁹ Medreseya Bazîdê û digel hemû medreyên Kurdan despêkê da bi alîkarîya rêvebirê mîrektîyên Kurda pişra jî bi alîkarîya dewleta navêndî a Osmanî xebatên xwe domandine. Yek ji wan medresayan jî medresaya rê û rêbazên xwe bi fikr û ramanên Ehmedê Xanî ve hatiye damezrandin ya Bazîdê ye ku perwerdeya wê piranî zimanê ‘erebî û kurdî dibe, teqez hemû ders bi Kurdî tên şîrovekirin.¹⁰ Mele Mehmûd jî wek şakirdê Xanî li vê medreseyê berdevam bûye wek xwandekar pişra jî mamoste û rê nîşander.

Piştî demekê ku dersên wî û zanîna wî pêşve diçe, dikeve rêza medresayan û li gelek medreyên Kurdistanê digere. Jibilî zimanê dayîkê zimanê Erebi, Farisî û Osmanî jî fêr dibe. Piştî qedandina dersan ku îcazê werdigire, carekî din vedigere Bazîdê. Li wir ji aliyekî ve dersê dide feqîyan, ji aliyê din ve jî li ser wêje û rêzimana Kurdî dixebite.¹¹

Mele Mehmûdê Bazîdî ne tenê di herêma xwe de, heta li seranserê Kurdistanê, kesekî gelek bi siyanet û qedirbilind bû. Bêguman ev birûmetbûna wî ji ber alimî û zanetiya wî dihat. Bazîdî kesyetekî zana, qedirbilind û xwedî bandorê ku di nav kurdan da rênîşandar bû. Mîrên kurdan li ser soza wî kemerbeste diman. Di dema şerê ku di navbera Osmanî û Mîrektiya Bedirxaniyan de diqewime, Sultan Abdulmecîd, Mele Mehmûdê Bazîdî dişîne cem Mîr Bedirxan da ku qanî bike û serî

⁸ Mela Mehmûd Bazîdî, *‘Adat û Rusûmetnameê Ekradiye*, (Amd.: Jan Dost), Stenbol, Weşanxaneya Nûbihar, 2012, 15.

⁹ Bazîdî, *‘Adat û Rusûmatnameê Ekradiye*, 102; Murad Celalî, *Mele Mehmûdê Bazîdî û ‘Adat û Rusûmatnameê Tewayîfê Ekradiye*, 76-77.

¹⁰ Nesim Sönmez, *Dîwana Şêx Muşerrefê Xînûkî*, Weşanên Seyda, Diyarbakır, 2018, 5-7; Zeynelabidîn Zinar, *Xwendina Medresê*, Weşanên Pênçînarê, Stokholm, 1991, 21-26; Ehmedê Xanî, *Cewheru’l Me’anî Fî Şerhu’l Dîwanu’ul Ehmedî Xanî*, (Wer.: Tehsîn Îbrahîm Doskî), Weşanên Spîrêz, Duhok, 2005, 25-59.

¹¹ Muhsin Seydâ, <http://www.syriakurds.com/2007/adab/mulla.html>. Ragihandin: 10.07.2019; Can Dost, <http://www.medaratkurd.com/?p=60>, Ragihandin: 28.06.2018.

li hemberî dewletê raneke. Aşkerekirina van gotinan jî ev e ku di dema serhildana Mîr Bedirxan Beg (1847) de, ji aliyê siltanê osmanî Abdülmecîd bi wezîfeya navbeyntiyê tê peywirdarkirin. Jê tê xwestin ku Mîr Bedirxan Beg îqna bike ku bi osmaniyan re nekeve şer û pevçûnê. Ji aliyê çavkaniyên cihê cihê ve ev bûyer bi vî awayî tîn neqilkin.¹² Her wiha: “*Sultan Evdilmecîd, Mele Mehmûdê Bazîdî ji bo ragirtina şer û serhildana li dijî Dewleta Osmanî, dişîne Cizîrê ba Mîr Bedirxan Beg. Dixuye ku nasiya Mîr Bedirxan Beg û Mele Mehmûdê Bazîdî beriya vê bûyerê bi hev re hebûye. Wî wextî serleşkerê Osmanî, Osman Paşa ye û beriya Mele Mehmûdê Bazîdî biçe Cizîrê ba Bedirxan Beg, wî ji vê çûna xwe û wezîfeya jê re hatiye spartin agahdar dike û jê re dibêje, heta ez cewabekê ji Bedirxan Beg nestînim, gerekê hereketa eskerî çênebe, lê dixuyê, Osman Paşa kesekî terefdarê şer e û li hêviya cewaba Mele Mehmûd nasekine û diçe ser Cizîrê. Lê dema ew digihîje wir, dibîne ku amadekariya Bedirxan Beg ji bo şerekî gelek bi rêk û pêk in. Li ser vê, ew ji vê rêkûpêkiyê Mele Mehmûdê Bazîdî tawanbar dike û jê re dibêje, ku wî Bedirxan Beg hişyar kiriye û sirên wan gihandiye Bedirxan Beg. Ji ber vê yekê, Osman Paşa, Mele Mehmûd dide girtin û ew qeyd û lele dike û dişîne Stenbolê. Lê qasek şûnde ew ji aliyê sultan ve tê efûkirin û wî dişînin Wanê.*”¹³

Dîsa dema Mele Mehmûdê Bazîdî li Wanê bû, şerê di navbera Xan Mehmûd û Osmaniyan de berdewam dikir. Vê carê Mele Mehmûdê Bazîdî bi dema vî şerî û bi hevkarîya serokê serhildanê Xan Mehmûd re hate tawanbar kirin. Li ser vê, wî digrin û panzdeh roj li Wanê di zindanê de dihêlin. Lê pişt re wî berdidin, ew tehdîd dikin û tim di bin çav de didin girtin. Bêgûman Osmaniyan, Mele Mehmûdê Bazîdî, ji ber di demeke wiha de ji tirsê firehbûna cebheyek li dijî xwe nedixwestin û qedrê Mele Mehmûdê Bazîdî yê di nava civaka Kurdan hesab dikirin, serbest berdan.¹⁴

Tekilîyên Mele Mehmûd li Seraya Osmanî ra xurtê û gelek name serayê ra dinivîse heta demekî digel kurekî xwe yî duwanzdeh salî Stenbolê bûye wê demê ji ber aboriya xwe û malbata xwe daxwaza meaşekî li padîşahê Osmanî dike.¹⁵

Mele Mehmûd digel xebatên îlmî û edebî kesekî berhevkar û arşîvkar bû. Xebatên ku dikirin û ew belgeyên ku bidest wî diketin, tev arşîv dikirin û ev arşîv ji

¹² Pîrbal, *Mela Mahmûdê Bazîdî*, 9-30; Bazîdî, *Cami'eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 11-14.

¹³ Bazîdî, *Cami'eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 13.

¹⁴ Bazîdî, *Cami'eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 11-14.

¹⁵ Mehmet Gültekin, “Di arşîva Osmanî de Mela Mahmûdê Bazîdî”, *Kovara Nûbiharê*, h. 130, 16-18.

her kesî re vekirîbû. Gelek lêkolînan û zanyaran ji pirtûkxane û arşîva wî sûd digirtin. Piraniya berhemên wî, ji aliyê Rojhilatnasên Sovyetî ve di arşîvên Petersburgê de hatine komkirin. Yek ji wan Rojhilatnasan, balyozê Rûs Aleksander Jaba bû.¹⁶

Mele Mehmûdê Bazîdî, ji warê dîrokê de xwe berdewamkirê Şerefexan û di ziman, netewiyet, rastnivîs û îspatkirina hêza zimanê Kurdî de xwe wek şagirtekî Ehmedê Xanî dibîne. Lê bi wergervanî û arşîvgiriya xwe jî, ji herduwan jî dubihure û ji wan derbas dibe. Çawa pêşengiya dîroknivîsandinê Şerefexan; ya netewiyet, felsefeya siyasî û edebî, Ehmedê Xanî dike, pêşengiya arşîvgirtin û wergerê jî Mele Mehmûdê Bazîdî yê Bayezîdê dike.¹⁷

Derheqê perwerdehiya wî û sebaba çûyîna wî ya Erziromê de birêz Ziya Avcı van agahiyên dide: “*Mele Mehmûdê Bazîdî, di sala 1797an de (di hinek çavkaniyan de 1799) li Bazîdê hatiye dinê. Li eynî ciyê dest bi xwendina medreseyê kiriye. Piştî temamkirina xwendina xwe, çûye Tewrîzê û hînî farisî bûye. Dû re vegeyriyê bajarê xwe û dest bi seydatiyê kiriye. Lê ji ber sedemên pevçûnekê biryara dîrketina ji bajarê xwe dide. Seydatî û Meletiyê li Erziromê didomîne û li vir bi cih dibe. Ji rewşa Bazîdî û ji tîkiliyên bi derdora wî re em fehm dikin ku yekî digel malbata xwe payebilind bûye.*”¹⁸

Dema babet tê ser navê Bazîdî divê konsolê Erziromê A. Jaba jî pê re bê bilêvkirin. Ji ber ku di hemû xebatan de ked û alîkariyeke mezin ya Jaba jî heye. Lewra Jaba ji Bazîdî berhevkirina çand û kelepora Kurdî dixwast wî jî jê re cem dikir. Piştî derbasî nivîsê dikirin Jaba jî wan berhemên hem werdigerandin hem jî ji bo Akademiya Zanistîya Petersburgê dişandin. Ji ber vê yekê xebat bi piranî bi keda her duyan çêdibûn.¹⁹

Herwisa Mele Mehmûd, li Erziromê bi Konsolosê Rûsyayê yê Erziromê rojhilatnas Alexandere Jaba ra hevaltî dike. A. Jaba derheqê Bazîdî de wiha

¹⁶ Bazîdî, *Cami'eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 11-12; Pîrbal, *b.n.b.*, 9-30; Şukriye Mustafa Resul, *Dab û Nerîti Kurdekan*, Çapî Yekem, Bexda, 1982, 25-34; Şukriye Mustafa Resul, *Rolî Magred Rudenko Zindikirdina Keleporî Kurdî Da*, Çapî Yekem, Weşanxaneyê Zankoyî Selaheddîn, Hewlêr, 2009, 115-121.

¹⁷ Pîrbal, *b.n.b.*, 9-30; Feqî Huseyn Sağniç, *Dîroka Wejeya Kurdî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2014, 443-445.

¹⁸ Bazîdî, *Cami'eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 11; Gültekin, Mehmet-Nihat-Bahar, *Salnama Ehmedê Xanî 2012*, Weşanên Belge, Stenbol, 2013, 15-25.

¹⁹ Pîrbal, *b.n.b.*, 32 ; Şukriye Mustafa Resul, *Rolî Magred Rudenko Zindikirdina Keleporî Kurdî Da*, 115-121 ; Bazîdî, *Cami'eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 14; Güzel, *b.n.b.*, 6.

dibêje: “*Wî ziman û edebiyata farisî, erebî û osmanî jî xwendîye û wan zimanan baş dizane... Ew di nav hevalên xwe de ji hemûyan zanatir bû... Di nava rewşenbîrên welat de jî bi nav û deng û bi qedir bû... Piştî sala 1856an Mele Efendî bû seydayê min û derbarê dîrok, ziman û kultura milletê Kurd de alîkariya min kir. Ew karê ji min re hatibû spartin, yanê hînbûna zimanê Kurdî, min bi saya rewşenbîrê Kurd, Mele Mehmûdê Bazîdî dan hev. Piştî min ew destnivîs ji Akademiya Zanistî ya Petersburgê re şandin.*”²⁰

1.2. Bazîd û Mîrektîya Serhedê

Di mêj da erdnîgarîya cîhanê da zêdetir guhertin, erdhej, sirgun, şer, koç û şert û mercên aborî bûne sedemên guhertin, wêrankirin û dagirkirina bajaran. Welatên Kurd lê dijîn jî zêdetir ber çavîn û ware rûzemîn û aborîyê da cihên taybetin. Gelek dugel û mîrektî li vê coğrafya kurdan da hatine damezrandin. Lê bele heya îro gelek wan an xirab bûne an jî cih û navên xwe guhertinê. Bajar û mîrektîya Bazîde da jî dîyare nav û cihe bajaran li gor desthilatarîyê tê zivirandin. Yek herêma Kurdan a sereke û dîroki jî ev herême. Bajara Bazîdê ji ber stratejîya xwe bûye navênda gelek dewlet û mîrektîyan. Dîyare ku her dewlet û mîrektîyan jî navekî bi cuda daye erdnîgarîya vê bajara Serhedê.

Li vira em daxwazî bi hûrgilî hinek navên bajara Bazîdê binin ziman. Ka gelo pirtûk û gotinên rojhilatnas û geroknasan û nav gel da çava nav û rewşa Bazîdê derbasdibe. Di dîrokê û nav gel da heta roja me bajara Bazîdê ra wek “*Daryunk, Darûnk, Daryung, Darîong, Daronk, Basenia-Basean, Baze, Bazed, Basse-Bazze, Vazit, Qelat Nûr, Sipîkan, Duza Sipî, Qela Sipî, Duzesipî, Duze Bazîd, Qelat Sifîd, Qelat Sipî, Qelat el' Beyza, Beyz, Aydın Qale, Ciniviz Qale, Qelat Ribat, Eleşgêrta Kevnar, Silivanî, Qel'a-ı Bayezid, Bayezid, Bayazid, Bayazıt, Bazîd, Bazîda Ehmedê Xanî, Doğubeyazid an jî Doğubayazıt*” gelek nav xwe ve giredane.²¹ Esta vê sedsalê

²⁰ Bazîdî, *Cami'eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 12; Gültekin, Mehmet-Nihat-Bahar, *Salnama Ehmedê Xanî 2012*, 15-25.

²¹ Ahmet Öner, *Tarihi ve Kültürü ile Doğubayazıt*, Zanîngeha Wan Yüzüncü Yilê, Enstitüya Zanîstên Civakî, Teza Mastirê, Wan, 2019, 1-20; Ebdullah Varlı, *Dîwan û Jînewarî ya Ahmedê Xanî*, Çapxana Sîpan, İstanbul, 2004, 295- 298.

da di nav gelê herêmê da navê wê yî mayînde “*Bazîd*” an jî “*Bazîda Ehmedê Xanî*” tê bi levkirin.²²

Vê bajar û herêmê her tim bala dîrokna û gerokna ehlî û bîyanî kişandinê li ser xwe. Bala lêkolîner û nivîskarên misliman jî zêdetir kişandîye ser xwe lawra ev bajar serdema xelifeyan da daxilî devleta îslamê bûye û gelê herême jî piranî misliman bûn. Feqet girîngîyeka vê bajarê jî navbera pir dîn û mezheban da bu. Cîya yê gilîdax²³ (Agirîyê) û keştiya Nuh pêxember taybetîka vê herêmê ye ku kitêbên pîroz da bala her peyrewên olên cuda cuda kişandîye li ser xwe.²⁴

Herêma Bazîdê, ku parek ji bakûrê jorîn a Kurdistanê pêktîne, ji kûraniya dîrokê pê de bi navên Ararat (Urarat) û Bazîd hatiye nasîn. Di Tevratê de, dema qala Tofanê û Nûh Pêxember tê kirin, ji bona cihê ku keştiya Nûh li ser daniye navê “*Çiyayên Araratê*” derbas dibe.

Navê Bazîdê wek herêm û bajar di pirtûka dîrokzanê ermenî ê ji sedsala 5 an Moses von Khoren û di çavkaniyên Bîzansî wek *Basean/Basenia*, di pirtûka erdnîgarnas ê ereb Şerif el-Îdrisi ji sedsala 12 an de *Badjasis*, di bîranînên qasidê Îspanyayê Clavio (1403) de *Vazîd* û di nivîsên gerokna Sir Thomas Herbert (1627) de jî wek *Baezd* tê destnîşan kirin. Di çavkaniyên osmanî de navên Bayazid/Bayezid tên bikaranîn. Zanyarê navdar Mele Mahmûd jî paşnavê xwe wek Bazîdî daniye, diyar e mebesta wî bajar bi xwe ye, lê di nivîsên xwe ên ji salên 1856-1860 an de wek sancaq navê Bayazîd bikartîne.²⁵

Di çavkaniyên Kurdan da wek “*Duza Spî, Qela Spî*” û “*Bazîd, Elaşgira Kevin, Siliva, Silîvanî*”²⁶ û hwd. derbasdîbin û di nav gelê herême da jî rojanê Bazîd ango Bazîda Ehmedê Xanî tê bikaranîn. Ligor zêdetir çavkaniyan tekilîya navê Bazîdê tu bi silatanê Osmanî Şehzadê Yıldırım Bayezid ra tune. Lewra dîroka siltan û navê Bazîde nagehêje hev û pêşiya siltan Yıldırım Bayezîd ev nava jibo herêmê hatiye bikaranîn.

²² Öner, *Tarihi ve Kültürü ile Doğubayazıt*, 1-20; Ebdullah Varlı, *Dîwan û Jînewarî Ya Ehmedê Xanî*, Weşanên Sîpan, Stenbol, 2004, 42-75; Mehmet Gültekin, “Mîrên Herêma Bazîdê û Seraya Îshaq Paşa”, *Kovara Zend*, h. 24, 3-8.

²³ Umîd Demîrhan, *Ferhenga Destî Kurdî Bi Kurdî*, Weşanên Sewad, Agrî, 2002, 103.

²⁴ Gültekin, *Mîrên Herêma Bazîdê û Seraya Îshaq Paşa*, 3-8; Öner, *Tarihi ve Kültürü ile Doğubayazıt*, 1-18.

²⁵ Öner, *Tarihi ve Kültürü ile Doğubayazıt*, 1-18; Gültekin, *Mîrên Herêma Bazîdê û Seraya Îshaq Paşa*, 2; Varlı, *Dîwan û Jînewarî Ya Ehmedê Xanî*, 15-60.

²⁶ Varlı, *b.n.b.*, 10-50; Öner, *Tarihi ve Kültürü ile Doğubayazıt*, 1-18.

Nivîskar Ferhad Pîrbal di nivîsekê xwe da wiha dibêje: *“Berîya ez dawî li vê kurtenivîsê bînim, ez dixwazim li ser navê “Bazîdê” jî li vir çend gotinan bêjim. Di gelek cîyan de ew wek “Bayezîd” tê nivîsandin. Ev nivîs xelet e. Heta niha jî xelkê cih jê re dibêjin “Bazîd” ne “Bayezîd”. Mele Mehmûdê Bazîdî jî di berhemên xwe de “Bazîd” bikar anîye. Lê mixabin kesên ew transkirîpte kirine, cardin “Bayezîd” nivîsandine. Gerek e ev şaşî bê rastkirin.”*²⁷

Yek navê Bazîdê jî pêşîyê wekî Bayezîd bû. Pêşîya pêş ev bajar mîna Alaşgêra kevnar bibîr anîne. Wekî di Şerefnameyê de hatîye gotin, êla Pazûkî li wira dijîya û geh diket bin hukmê Osmanîyan, geh bin hukmê Îranê. Derengtîr, çaxa Osmanîyan, Sultan Muradxan dema sitandîna Yerîvanê, ji bajarê Bayezîdê ajotîye ser Farsan. Mirovekî bi navê Evdî Beg bi eslê xwe ji Merwanîyên Meyafarqînê²⁸ bûye, ji Dîyarbekirê, digel çend malbatên Silîvanî hatîye tevî leşkerên Sultan Murad bûye. Di şerê nêzîkî Yerîvanê de mêranîya nîşan daye û celalet Sultan Murad bajarên Bayezîdê, Alaşgirê, Mîlwe û hawirdorên wan bi yurtlik û ocaxlik xelatê Evdî Beg û Êla Silîvan kirîye. Wan li wir kela û gund ava kirine, li wira mane û navê Bayezîd û qezayên wê bûye Silîvanî, ser navê êlê.²⁹

Di Şerefnamê de behsa Bayezîdê û hakimên wê êla Silîvan nebûye. Ev bûyerên demek derengtîrîn û ew di vê “Dîroka Dema Nûjen” de hatine nivîsandin, gava behsa wan wilayetên me gotî dibe û behsa parvebûna êlên kurdan ên mezin û peydabûna qebîlên biçûk, ku navê hina ji wan di Şerefnameyê de hatine.³⁰

Bazîd di dîroka wêjeya Kurd de taybetîyeke xwe heye. Di medreseya Bazîdê de gelek helbestvan û wêjevanên Kurd gihîştine. Kurdan ev bajar bi navê Bazîdaxa yan jî bi kurtayî Bazîd binav kirine. Bazîd bajarekî Kurdistanê yê gelekî kevnare ye û dikeve başûrrojawayê Çiyayê Agirî. Bajarê kevin di gelîyekî teng de ye û bi pênc kîlometreyan dûrî bajarê nû ye. Xirbeyên Seraya Ishaq Paşa di navbera herdu bajarên de cîh digirin. Piştî şerê cîhanê yê duyemîn bajarê nû pêşket û bajarê kevin hat

²⁷ Pîrbal, *Mele Mehmûdê Bayezîdî* (1799-1867) *Yekemîn Çîrok Nivîs û Pexşan Nivîsî Kurd*, 9-12.

²⁸ Meyafarqîn (Silîva): Silvan, îro navceya Diyarbekirê ye.

²⁹ Varlî, *b.n.b.*, 15-60.

³⁰ Pîrbal, *Mele Mehmûdê Bayezîdî 1799-1867*, 9-12.

şemirandin. Bajara Bazîdê di navbera sinorê Îran, Osmanî û Rusya yê da cih girtîye bajareka Kurdan a kevne.³¹

Taybetmendîya Bazîdê ji bo Kurdan ev e ku piştî Ehmedê Xanî li wira cîwar bû, êdî bajar bû navendeke çand û wêjeya Kurdî. Gelek wêjevan, helbestvan û nivîskarên Kurd di Medreseya Ehmedê Xanî de gihîştin.³² Ji çend kesên navdar ku di vê medreseyê de xwendin û bi nav û deng bûn. Di medreseya Bazîdê³³ de yên xwandin û gihîştin ev in, despêkê da Ehmedê Xanî, Şewqîyê Xanîneşeb, Muradxan Bazîdî, Îsmailê Bazîdî,³⁴ Mele Mahmûdê Bazîdî,³⁵ Seîdê Nursî, Mele Mihemedê Celalî û Xelîfe Yûsiv hwd.

Erdnigarîyan vê xebate gelemperi hemû coğrafyaya kurd lê dijîn e. Lewra bila qeyd û merc seranserî welatê kurdan çand û wêje dişibin hev. Feqet ji bo ve tezê erdnigarîya hemû Kurdistanê nehate hilbijartine xebata me herêmiye ku ji ber ku bi hûrgilî bê xebatine.

Bazîd mîratgirê şarezayîyên mezin e. Gotî, Mîtanî, Hurrî, Urartû (Haldî), Medî, Sasanî, Rom, Şeddadî, Rewadî, Merwanî, Eyyubî, Hesnevî û wek Mîrektîya Serhedê, Dumbilî, Mehmûdî û Hekarî gelek mîrektîyên Kurda bandora xwe li vî welatî hîştine.³⁶ Mezopotamya ku parek axa Kurdistanê jî dikevê, wekî landika, dergûşîya mirovahîyê tê zanîn. Cara pêşîn li vir ajal hatine kedîkirin, mirovahî fêrî bikaranîna alavên jîyanê hêsantir dikin û cotyarîyê bûne.

Feqet ev xebata me her çiqas li ser ziman û çîrokan bajara Bazîda Serhedê û derdorên vê jî bûn. Lê mixabin Bazîd ji parçekî herêma Serhedê û bingehî û mîrateya wan dewlet û mîrektîyên Kurdan yên nav borî ne. Pêwiste kû em li vê derê qala welatê Serhedê (mîrektîya Bazîde) bikin kû mijar bira wek akademik be nasandin.

³¹ Naci Kutlay, "Mela Mahmûdê Bazîdî", *Kovara Nûbiharê*, h. 109, 37-38; Ahmet Öner, *Di Edebiyata Gelerî ya Kurdî da Di'a û Nifir*, Zanîngeha Wan Yüzüncü Yilê, Enstitüya Ziman û Çanda Kurdî, Teza Mastirê, Wan, 2017, 5-6.

³² 'Elaeddîn Seccadî, *Mêjûy Edebî Kurdî*, Weşanên Întîşarata Kurdistanê, Senendeç, 2011, 220 -242; Zeynelabidîn Zinar, *Nimûne Ji Gencîneya Çanda Qedexekirî*, Yekîtiya Nivîskarên Kurd, Stockholm, 1991, 15-52.

³³ Şakir Epözdemir, *Medreseyên Kurdistanê*, Weşanên Nûbiharê, Stenbol, 2015, 89.

³⁴ Baba Tahîrê Merdoxî, *Mêjûy Edebî Kurdî*, Weşanxanên Korî Zanyarî Kurdî, Hewlêr, 2012, 47-155.

³⁵ Can Dost, "*Muqaddimetü Kitâbi Âdâtî'l-Ekrâd ve tekâlîdühüm li-Melâ Maḥmûd el-Bâyezidî*", <http://www.medaratkurd.com/?p=60>, Ragîhandin: 28.06.2018.

³⁶ Şerefexan Bitlîsî, *Şerefname*, (Wer: Ziya Avcî), Weşanên Avestayê, Stenbol, 2012, 392- 401; M. Emîn Zekî Beg, *Dîroka Kurd û Kurdistanê* (Wer: Ziya Avcî), Weşanên Avestayê, Stenbol 2012, 25; Öner, *Tarihi ve Kültürü ile Doğubayazıt*, 22-38.

Li gor zanistê û erdnîgarîyê: “*Herêma Serhedê ku parek ji bakûrê jorîn a Kurdistanê pêk tîne di nava gel da wek warê sînoran, çîyan, berf û zozanan û dengbêjan tê hesibandin. Li gor dengbêjên ku ji wan kilam tîne guhdarkirin û dastan, helbest, gotinên gel taybetî jî gelek pirtûk, kovar û nivîskaran herêma Serhedê navbera wan sînoran dane. Ev sînor Erzînganê heta çîwarên Erzirom, Qers, Agirî, Îdir, Muş, Wan, Bedlis, rojhilatê Bingolê, bakurê rojavayê bajarê Xoya bajara Îranê tevî Makoyê û deşta Aranê a bakur û rojhilatê çiyayên Araratê bi tevayî herêma Serhedê pêk tînin. Ev coğrafya dibe beramberî erdê dewleta Urartuyan û para bakur a dewleta Kardûkan ku Ksenefon di pirtûka xwe ya bi navê Vegera Dehhezaran da qala wê dike.³⁷ Jixwe gelek avasazîyên kevnare û navê eşîr û gundên wek Kurdîkî û Kurdeka li Serheda îroyîn hêjî şopên wan herdu şaristanîyan dîyar dikin.”³⁸*

Li gor gelek zanayên Kurd welatê Serhedê kilam û stranan da cihê xwe girtîyê kû nevala bajara Bilîsê kevirê qul destpê dike Qefqasyayê hetanî Bakûya Azerbeycana îroyîn diçe ku berê da Kurd lê jîyanê û dewletên wek Hurrî, Gotî, Medya, Urartu (Xaldî), Şeddadî, Rewadî, Eyyubî, Merwanî,³⁹ Arana îroyîn Qerebax bi tê nasîn û mîrektîyên wek mirektîyên Bazîdê, Mehmûdî, Dunbulî, Bedlîs û Botan, Soran û Amîdîyê⁴⁰ hwd. ava kirine. Li vê herêmê hêj hezaran Kurd lê heyata xwe didomînin.

Em li vê derê dixwazin coğrafya Bazîdê û mîrektîya Serhedê û bajarên derûdorê bi navên nû digel navên kevnarê bidin nasîn. Bajarê Serhedê û navcên wê yên sereke wek navên kevnarê û nûjen wiha tîne rêzkirin: Îdir (Iğdır), Qers (Kars), Erdexan (Ardahan), Agirî/Qerekose (Ağrı), Erzirom (Erzurum), Erzîngan (Erzincan), Bilîs/Bedlîs (Bitlis), Mûş (Muş).

Bazîd, Bayezîd, Bayîz (Doğubayazıt) û navcêyên îro jî yên derûdora Bazîdê ev in: Gîhadîn, Avakevir, Zêtkan, Xemûr, Panos û Dûtax hwd.⁴¹

³⁷ Öner, *Tarihi ve Kültürü ile Doğubayazıt*, 10-20.

³⁸ Mohamed Emin Zeki Beg, *Mêjûwa Dewlet û Mirneşîniyên Kurd*, (Wer:: M. S. Cuma), Weşanxana Zanyari Kurd, Hewlêr, 2001,45; Gültekin, *Mîrên Herêma Bazîdê û Seraya Îshaq Paşa*, 3-8.

³⁹ M.E. Zeki Beg, *Mêjûwa Dewlet û Mirneşîniyên Kurd*,52; Şerefxan Bitlîsî, *Şerefname*, 85; Gültekin, *Mîrên Herêma Bazîdê û Seraya Îshaq Paşa*, 3-8; Öner, *Tarihi ve Kültürü ile Doğubayazıt*, 1-18.

⁴⁰ Cemal Nebez, *Emîr Al-Kurdî Mîr Mihemed El-Riwanudizî* (Wer: Fexrî Silahşor), Weşanên Aras, Hewlêr, 2003, 21-89.

⁴¹ Ebdullah Varlî, *Dîroka Dûgelên Kurdan(600-1500)*, Weşanên Sîpan, Stenbol, 1997, 47; Gültekin, *Mîrên Herêma Bazîdê û Seraya Îshaq Paşa*, 3-8:

Zana Farqînî, *Ferhenga Kurdî-Tirkî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî Ya Stenbolê, Stenbol 2004,125-340.

Û navên bajar, bajarok û gundê navendên bi awayî fermî hatine guhertin lê belê nav gel da xuyadike kû navên wan yên kavnarê bi awayekî 'esa nayên windakirin û birkirin. Gelê herêmê îro jî navên orjînal bikartinin.

1.3. Peywendîya Mele Mehmûd û Aleksander Jaba

Aleksander Jaba, di nivê sedsala 19an de, weke balyozê Rûsistanê tê Erziromê. Wî, hê ji berê de bi awayek mezin meyla xwe dabû, çand, wêje û dîroka Kurdan. Li Erziromê bi Mele Mehmûdê Bazîdî re peywendiyên datîne. Hêdî hêdî hevûdu nas dikin û êdî xebatên wan bi hev re dest pê dikin. Xebatan li ser dîrok, çand, wêje û rêzimana Kurdî pêktînin.⁴² Mele Mehmûd, ji pirtûkxaneyê xwe gelek pirtûkan dide Aleksander Jaba. Di nav van pirtûkan de gelek jî wan destxetên Mele Mehmûd in. Hinek jî van pirtûkên ku daye wî jî, pirtûkên "Cami'eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî" û "Adab û Risûmatnameya Kurdan" bûn.

Herwiha destnivîsên Mele Mehmûdê Bazîdî ketibûn destê Aleksander Jaba û dema ku ew vedigere welatê xwe Rûsistanê, van destnivîsên Mele Mehmûd Bazîdî jî bi xwe re dibe û van destnivîsan di arşîva St. Petersburgê de bicîh dike. Ji wê rojê û bi şûn de ji vê arşîva Mele Mehmûd gelek sîd hatiye wergirtin. Beriya Mele Mehmûd A. Jaba nas bike, bi çand, edeb û dîroka Kurd re mijûl bûye. Ne tenê di peywira herêma xwe de, heta li seranserê Kurdistanê, kesekî gelek qedir bilind bûye.

Bi alîkarîya Mele Mehmûd Bazîdî A. Jaba cara pêşin ferhengên fransî-kurdî û kurdî-fransî û wisa jî ferhenga zaravên kurdî yên Hekarî-Rewandî amade kir.

Mele Mehmûd Bazîdî di dema karkirina xwe salên 1858-1859 a bi pêşniyara A. Jaba destpê dike "Şerefnamê" ya Şerefxanê Bîtlîsî ji farisî werdigêrîne Kurdî û bi zaravê kurmancî. Ew werger di hêla zanyariyê da gelekî baldar e. Ya pêşin, ji ber ku ew hetanî niha dîroka bi zimanê kurdî ya tek tenê ye. Ya dua, destnivîsara Pirtûkxana Rûsîyayê ya gelî (Pirtûkxana dewletê ya berê) da bi destê Mele Mehmûd Bazîdî hatiye nivîsandin. Kurdzanên Pêterbûrgê ev yek û herwaha ew jî, ku van deh saliyên paşin li bal kurda, xesma ronakbîra, daxwaza bi zimanê dayka xwe dîroka gelê xwe bixwûnin rû daye, dane ber çava û sala 1986-a ew destnivîsar bi cûrê teksîr

⁴² Kutlay, *Mela Mahmûdê Bazîdî*, 37-38.

çap kirin û kirine milkê xwendevanên kurdîaxêv. Di hêlekê da jî ew firsendek e, ku mîrata kedkarê kurda yê sedsala XIX a ra nas bin.⁴³

A. Jaba, ku sala 1880 da karê wergera wan gotûbêja ser zimanê fransî bi serhevda tîne û xilas dike. Di pêşgotina wê da dibêje, ku nîyeta wî heye jînenîgarîya alîkarê xwe yê dilsoz Mele Mehmûd Bazîdî binivîse. Dibe konsûlê Rûsa sozê xwe pêk anîbe jî, ji ber ku ew merivekî cidî bû, lê îro destxeta ne gihîştîye destê me.

Hema di wan çaxa da Mele Mehmûdê Bazîdî bi pêşniyara A.Jaba pirtûkeke hewaskar dinivîse bi sernivîsa “*Rabûn-Rûniştin û Erf-Edetên Kurda*” û wê da derheqa timtêla Kurda, dem-dezgê wan, leyîstik û sazbandîya gelêrî, derheqa huner û çanda kurda da radixe ber çavên xwendevana. Ew pirtûk di sala 1963-a bi wergera Rûsî ji aliyê kurdzan M. Rûdênkoyê da hatiye çapkirinê.⁴⁴

Ji namên A. Jaba, ku ewî şandîye Pêterbûrgê, em pê dihesin, ku bi hîvîkirina wî Mele Mehmûd Bazîdî wek berdewama xebata dîrokzanê kurda yê bi nav û deng Şerefxanê Bîtîlîsî, xebateke dîrokî “*Dîroka Kurda Ya Nû*” wekê 1000 rûpelî nivîsîye. Di wê pirtûkê da dîroka ji salên 1785-1786 hetanî salên 1857-1858 weke hevtê salî ya bajar û navçeyên kurda yê sereke dihate ber çava. Mixabin, em nizanin çî hatiye serê wê pirtûkê. Xuya ye, ku destnivîsara wergera nîvcîmayî di arşîva A. Jaba ya Smîrnê da maye. Tenê wergera fransî ya "Pêşgotina" wê pirtûkê hatiye parastinê, ku A. Jaba kirîye û derheqa vê yekê da kurdzan Y. Vasîlyêvayê gotareke xwe da nivîsîye.

A. Jaba bi Mele Mehmûd Bazîdî ra tevayî koleksiyona destnivîsarên kurdî yê here tam û mezin wek 50 heb yê derheqa folklor, dîrok, êtnografîya, zimanê kurda da berev kirine.⁴⁵ Mele Mehmûdê Bazîdî ji pirtûkxaneyê xwe gelek pirtûk bexişand Jaba. Piraniya van pirtûkan pirtûkên destxetî bûn.⁴⁶ Li Petersburgê, destxetên ji pêûsa Mele Mehmûdê Bazîdî derketine hatiye parastin. Ji van destxetan

⁴³ Têmûrê Xelîl, <http://www.pen-kurd.org/kurdi/Mehmudbikurdi.html>, Ragehandin:21.007.2019; Qanatê Kurdo, *Tarîxa Edebyeta Kurdî*, Weşanên Lîsê, Stenbol, 2010, 20-21. Şukriye Mustafa Resul, *Rolî Magred Rudenko Zindikirdina Keleporî Kurdî Da*, 115-121.

⁴⁴ Şukriye Mustafa Resul, *Rolî Magred Rudenko Zindikirdina Keleporî Kurdî Da*, 115-121; Murat Çelik, ‘*Adat û Rusûmatnameê Tewayifê Ekradîye ya Mela Mehmûdê Bazîdî (Metn û Lêkolîn)*, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Teza Lîsansa Bilind A Çapnebûyî, Mêrdîn, 2015, 22-45.

⁴⁵ Têmûrê Xelîl, <http://www.pen-kurd.org/kurdi/Mehmudbikurdi.html>, Ragihandin:21.007.2019; Qanatê Kurdo, *Tarîxa Edebyeta Kurdî*, 20-21; Aleksandre Jaba, *Çirokên Kurmancî*, Weşana Çanda, Nûjen, Stocholm, 2000, 58-96.

⁴⁶ Feqî Huseyn Sağniç, *b.n.b.*, 443-445; Qanatê Kurdo, *Tarîxa Edebyeta Kurdî*, 20-21.

44 bi zaravayên Kurmancî 4 Farisî, 3 heb jî Osmanî ne.⁴⁷ Ev koleksiyon bi qasî 90 salan çap nebûn û di refên akademiya zanistî ya Petersbûrgê de li hêviya lêkolînavanekî/ê man. Heta sala 1957an Rûdenkoyê ew xebatên di Pirtûkxaneyê ya Petersburgê de bi navê Şaltikov-Şêdrîn de bû, da weşandin û naskirin. Li sala 1961ê xebateke wê ya bi nave “*Derheqa Destnivîsarê Kurdî yê li Lenîngradê*” çap bû.⁴⁸

Jaba, Bazîdî wek yekemîn pexşannûs û çîroknûsê kurd dibîne û dibêje ku Bazîdî ji ber ku ji xelkê şerm dikir navê xwe li ser berhemên xwe nedinivîsî. Lewra Jaba xirîstiyân û ew misilman û Mele bû. Nivîskar Ferhad Pîrbal vê angaştê xwe bi bîranînên A. Jaba piştrast dike.⁴⁹

1.4. Berhemên Wî

1.4.1. Cami'eya Risaleyan û Hikayetan

Ev berhema hêja ya Mele Mehmûdê Bazîdî, ji sê maqale û çil çîrokan pêk hatîye. Ew di bin sernivîsa jorê de, wekî kitêb bi hev re hatine çapkirin. Naveroka ku ji kitêbê re hatîye amade kirin bi vî awayî xwarê ye.

- Risale di behsa be'dê 'eşayîr e qebayîl û tayîfeyên di kurdan beyan dike.
- Îsim û navê kurmancîyan ku temam û bê kêmasî dibêjin beyan dibe.
- Îsim û navê di jinên di kurmancîyan ku bi temam û kêmasî dibêjin beyan dibe.
- Risaleyeke di behsa şair mezinên di Kurdistanê ku bi zimanê kurmancî ye cih û kitêb û şîir û hikayet û qîseyê di wan beyan dike.

- Muqqedîma Elîyê Teramaxî Serf û Be'zê Usûl Lazimeyê Te'limîye Bi Zimanê Kurmancî.

- Cami'i el-Hikayet.

Sê maqale û komek çîrok ên ji çil liban pêkhatî di kitêbê de hene. Ew ji aliyê Mele Mehmûdê Bazîdî bi xwe ve hatine berhevkirin û nivîsandin.

Maqaleya yekê, di derbarê hinek eşîretên Kurdistanê û agahdarîyên di warê jîyana wan de û ji lîsteke navê jin û mêran pêk hatîye.

⁴⁷Aso Zagrosî, <http://aso-zagrosi.over-blog.com/article-mella-mehmude-beyazidi-1797-1870-50904238>. Html, Ragihandin: 10.08.2019

⁴⁸Evin Bilge, *Ji Hêla Naverokê Ve Dahûrîna Çîrokên Mela Mehmûdê Bazîdî*, Mêrdîn, 2013, 12-16; Jan Dost, *b.n.b.*, 202.

⁴⁹Güzel, *b.n.b.*, 2-7 ; Pîrbal, *b.n.b.*, 11 ; Qanatê Kurdo, *Tarîxa Edebyeta Kurdî*, 20-21.

Maqaleya duduyan, bi kurtî behsa jîyana heşt şairên kurd ên kevin dike. Ew şair jî ev in: Elî Herîrî, Meleyê Cizîrî, Feqîyê Teyran, Meleyê Bateyî, Ehmedê Xanî. Şairê şeşan, Îsmâîl ê eslê xwe ji Bazîdê û şagirdê Ehmedê Xanî ye. Di sala 1065ê hicrî de hatîye dinê û di 1121ê hicrî de wefat kirîye. Şairê heftan, Şerefxan ê eslê xwe ji mîrên Hekarîyê ye û di 1101ê hicrî de li Hekarîyê koçê dawîyê kirîye. Şairê heştan jî Muradxan e û li Bazîdê di sala 1150yê hicrî de hatîye dinê û di sala 1199ê de koçê dawîyê kirîye.

Maqaleya sisîyan, jî nasandina destnivîsa Elî Teremaxî ya bi Kurdî û di derbarê rêzimanê erebî de ye.

Qismê vê berhemê yê din, ku em ji naveroka jê re hatîye amadekirin, dibînin, ji çil çîrokan pêk hatîye. Ev çil çîrokên han ên ji aliyê Mele Mehmûdê Bazîdî ve hatine nivîsandin, xwedîyê hinek taybetmendîyan in û wekî ew çîrokên ku em dizanin nîn in. Ew hemî ji bûyerên rasteqînî yên di nav xelkê Kurdistanê de qewimî ne pêk hatine. Mele Mehmûdê Bazîdî ew bi wersîyona di nav xelkê de tê gotin nivîsandine û ew kirine çîrok û bi awakî xweşik û hêja pêşkêş kirine. Ew navên kesan, gundan, cîyan û heta tarîxên tê de hatine bikaranîn, hemî yên rasteqînî ne. Ji ber vê, wekî tê gotin, ew ji çîrokên ku em dizanin cihê ne. Her yek ji wan li ser serpêhatî û bûyerekê ye. Naveroka çend ji wan çîrokan ev in: Çîroka yekê, di derbarê tamahîya Meleyan a ji bo malê dinê û menfeetperestî û ezûezîtîya wan de ye. Çîroka çaran di derbarê rêbirîya di Kurdistanê de û encamên wê yên di civatê de ne. Çîroka pênc û şeşan, rola pere û tamatîyê ya di mejî û hindurê însanê de nîşan didin.⁵⁰

1.4.2. ‘Adat û Rusumatnameê Ekradiye

Ev kitêb ji layê Mele Mehmûdê Bazîdî bi xwe ve bi gerokên wî yên bajar û gundên Kurdistanê gerîyaye hatîye nivîsandin. Ji aliyê A. Jaba ve wergera wê ya fransîzî hatîye kirin. Pişt re di sala 1963an de, ji aliyê Rodenko ve li Moskovayê wergera wê ya Rûsî hatîye kirin û li Moskovayê hatîye weşandin. Wergerên wê yên bi zimanên din jî hene. Transkirîpsîyona wê ya kurmancî jî hatîye kirin. Ev kitêb yekem lêkolîna civaknasî, etnolojî û etnografî ya li ser kurdan e ku bi kurdî hatîye

⁵⁰ Bazîdî, *Cami'eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 14-18; Adak, *b.n.b.*, 340-343; Sağniç, *b.n.b.*, 343-345; Pîrbal, *b.n.b.*, 9-30; Öner, *b.n.b.*, 128-134.

nivîsandin.⁵¹ Ev kitêba wan salên dawîda bûye mijara xebat û lêkolîna tezên aqedemîk. Murad Celalî, Xelîl Dihokî, Reşîr Findî û Jan Dost li ser vê pertûkê xebatên heja kirinê

1.4.3. Tewarîxa Cedîdê Kurdistan

Ev kitêb ji alîyê Mele Mehmûdê Bazîdî bi xwe ve hatîye nivîsandin. Lê mixabin ew wenda ye. Hete niha gelek hewil hatîye dayîn, lê ew bêyî netîce mane. Li gor ew agahdarîyên ji alîyê A. Jaba ve hatine dayîn, ew pêşgotina ku ji alîyê Mele Mehmûdê Bazîdî ve ji kitêbê re hatîye nivîsandin û A. Jaba ew wergerandîye fransîzî û heta niha hatîye parastin û gelek kesên din ku di derbarê vê kitêbê de nivîsandine, em bi hindikayî jî be di saya van de, di derbarê vê berhemê de dibin xwedîyê zanyariyekê.

Mele Mehmûdê Bazîdî, di sala 1857an de dest bi nivîsandina vê kitêbê kirîye. Ew yek nusxe tenê hatîye nivîsandin û hecma wê nêzîkî hezar rûpelan bûye. A. Jaba ew bi pêşgotina pênceh rûpelan pêkhatî ya ji alîyê Mele Mehmûdê Bazîdî ve ji kitêbê re hatîye nivîsandin, wergerandîye fransî û ew di 30yê Adara sala 1867an de ji bo zana û rojhilatnasên Rûsî di vî warî de nêrînên xwe bêjin û vê xebatê binirxînin, ji Akademîya Zanistî ya Peterborgê re şandîye.

Wekî me got, ji bo ku kitêb bi xwe wenda ye û heta niha gelek kes hewil dane ku ew bidest bixin, lê ev hewildan bê netîce mane. Ji ber vê, em pêwîst dibînin ku li vir hinek dirêj li ser vê berhema heja bisekinim. Ji bilî vê, em ê ew pêşgotina Mele Mehmûdê Bazîdî ya ji vê berhemê re nivîsandîye û ji alîyê A. Jaba ve wergera wê ya fransîzî hatîye kirin, Y. Vasîlîva jî di lêkolîna xwe ya li ser “Kitêba Wenda Ya Dîroka Kurdistanê”⁵² de behs kirîye û wê pêşgotinê jî weşandîye, dê em ê jî kurtîya wê wek raportekê binivîsin.

Mirov hem ji ew pêşgotina ji alîyê Mele Mehmûdê Bazîdî ve ku ji kitêbê ra hatîye nivîsandin û hem jî ew naveroka (fîhrîst) jê re hatîye amadekirin, bi awakî baş di derbarê kitêbê de agahdar dibe. Ji bilî vê, cardin mirov ji vê naveroka jê re hatîye

⁵¹ Bazîdî, *Cami'eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 14-18; Adak, *b.n.b.*, 340-343; Sağniç, *b.n.b.*, 343-345; Pîrbal, *b.n.b.*, 9-30; Öner, *b.n.b.*, 128-135; Murad Celalî, “Adat û Rusûmatnameê Ekradiye û Çend Gotin”, *Kovara Nûbihar*, 2010, H.112, 50-54;

⁵² Mehmet Gültekin, “Di Arşîva Prof. Ferdinaand Justî de Mela Mahmûdê Bazîdî”, *Kovara Nûbiharê*, h. 131,11-8; J. S. Mûsaêlyan, “Mele Mehmûd Bayezîdî”, *Kovara Roja Nû*, h.54, 1988.

amadekirin û ji vê pêşgotinê fêhm dike ku Mele Mehmûdê Bazîdî xwestîye berhemeke wekî ya Şerefnameya Şerefxanê Bedlîsî biafirîne. Ji ber vê jî wî û kitêba wî Şerefnameyê wekî mînak ji xwe re hilbijartîye. Cardin em ji naveroka wan herdu nivîsên di derbarê kitêbê de hîn dibin, ku ew li ser bûyerên di navbera salên 1785-1857an ên di beşeke zêde ya Kurdistanê de qewimîne sekinîye. Kitêb ji yanzdeh beşan pêk hatîye û her beş li ser mîrektiyek kurdan e.

Beşê yekê: Bûyerên ji sala 1785an heta sala 1857an yên li wilayeta Erziromê qewimîne.

Beşê duduyan: Bûyerên li êrdêma Rojkî, ku bajarên wê yên serekî Bedlîs û Mûş in.

Beşê sisîyan: Bûyerên êrdêma Mehmûdî, ku jê re Mehemedan dibêjin û bajarê wê yê sereke Xoşeb e.

Beşê çaran: Bi kurtî bûyerên li wilayeta Wanê qewimîne.

Beşê pêncan: Bi kurtî bûyerên li Hekarê qewimîne.

Beşê şeşan: Bûyerên li Rewandizê⁵³ qewimîne.

Beşê heftan: Bûyerên Behdînan, ku bajarê wê yê sereke Amêdî ye.

Beşê heştan: Bûyerên li Botan qewimîne, ku bajarê wê yê sereke Cizîr e.

Beşê nehan: Bûyerên êrdêma Silîvan, ku bajarê wê yê sereke Bazîd e.

Beşê dehan: Bûyerên Qersê û dagîrkirina wê bi destê Rûsan.

Beşê yanzdehan: Bûyerên Azerbeycanê û her wiha yên Xoyê, Tebrîzê, Yêrîvanê, Êrmê, Meraxê û Makûyê qewimîne.⁵⁴

1.4.4. Şerefnameya Şerefxan a Tercuma Mele Mehmûdê Bazîdî

Mele Mehmûdê Bazîdî, yekem kes e ku cara yekem cilda yekê ya Şerefnameya Mîr Şerefxanê Bedlîsî⁵⁵ ji orijînalê wê ya farisî û li ber ew nusxeya ji aliyê Zêrnov ve hatîye amadekirin, wergerandîye li ser zimanê kurdî. Wî ev xebat di sala 1858an de temam kirîye. Piştî sedûpenceh salan jî, dema ku mirov îro ew

⁵³ Kerîm Şareza, *Koye û Şairên Wê*, Weşanên Sipîrêz, Hewlêr, 1961, 45.

⁵⁴ Bazîdî, *Cami'eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 14-18; Adak, *b.n.b.*, 340-343; Sağniç, *b.n.b.*, 343-345; Pîrbal, *b.n.b.*, 9-30; Öner, *b.n.b.*, 128-134; Muhsin Seydâ, "Mellâ Maḥmûd el-Bâyezîdî ve'l-ḥurûc 'ani'l-me'lûf", <http://www.syriakurds.com/2007/adab/mulla.html>. Ragihandin: 10.07.2019; Şukriye Mustafa Resul, *Rolî Magred Rudenko Zindikirdina Keleporî Kurdî Da*, 92-68.

⁵⁵ Celadet Alî Bedirxan (Herekol Azîzan), "Klasîkên Me An Şahîr û Edîbên Me Ên Kevin", *Kovara Hawar*, H.33, Şam, 1941, 45.

dixwîne, kurmancîya wê ya wê demê zewq dide mirov û mirov jê têr nabe. Lê mixabin, Mele Mehmûdê Bazîdî bi ser hinek mijaran re gav daye û ew wernegerandine. Mesela: Temamê Mîrektîya Eyyûbîyan û Îmadîyeyê qismek ji Mîrektîya Hekarîyê wernegerandîye û sefheya çaran a li ser Mîrektîya Bedlîsê jî wekî kurtebirî wergerandîye.

Di sala 1986an de, ji vê wergerê re, ji aliyê Qanatê Kurdo û J. C. Musaelyan ve pêşgotineke hêja hatîye nivîsandin û ew wekî destxet bi xwe hatîye çapkirin. Di sala 2007an de jî, ew destxet ji aliyê Seîd Dêreşî ve hatîye transkirîpte kirin û ji aliyê Weşanxaneyê Spîrêz a li Duhokê ve hatîye çapkirin.⁵⁶ Pişra ev pirtûk bûye mijara lêkolîn û xebatan.

1.4.5. Mem û Zîn, Yusif û Zuleyxa, Leyla û Mecnûn, Sêxê Sen'an

Mele Mehmûdê Bazîdî, berhema hêja û giranbiha a Ehmedê Xanî Mem û Zînê (1856),⁵⁷ ya Selîmê Silêman Yusif û Zuleyxayê, ya Harîsê Bedlîsî Leyl û Mecnûnê, ya Feqîyê Teyran Şêxê Sen'an, Bersîsê Abid û Qewlê Hespê Reş wekî çîrokî nivîsandîye. Pişt re A. Jaba ew derbasê li ser alfabe ya latînî kirine û wergerandine fransîzî û pêşgotinekê jî ji wan re nivîsandîye û ew ji Akademîya Zanîstî ya Petersborgê re şandine.⁵⁸

1.4.6. Xebatên Ferhengî

1.4.6.1. Ferhenga Kurdî-Fransîzî (Dictionnaire Kurde Francais)

Mele Mehmûdê Bazîdî di nivîsîn û amadekirina vê ferhenga Kurdî-Fransîzî de alîkarîyeke gelek mezin daye A. Jaba. Ev ferheng hatîye çapkirin û ew yek ji wan

⁵⁶ Bazîdî, *Cami'eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 14-18; Adak, *b.n.b.*, 340-343; Sağniç, *b.n.b.*, 343-345; Öner, *b.n.b.*, 128-134; Aso Zagrosî, <http://aso-zagrosi.over-blog.com/article-mella-mehmude-beyazidi-1797-1870-50904238.html>, Ragihandin: 10.08.2019; Mele Mehmûdê Bazîdî, *Şerefnameya Şerefxanê Bidlîsî Tercumeya Mele Mehmûdê Bazîdî*, (Amadekar: Seîd Dêreşî), Spîrêz Pres, Duhok, 2007.

⁵⁷ Ehmedê Xanî, *Hemû Berhem* (Berhevkar: Kawa Nemir, Selîm Temo), Weşanên Lîsê, Stenbol, 2008, 54.

⁵⁸ Bazîdî, *Cami'eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 14-18; Adak, *b.n.b.*, 340-343; Sağniç, *b.n.b.*, 343-345; Pîrbal, *b.n.b.*, 9-30; Öner, *b.n.b.*, 128-134; Ehmedê Xanî, *Hemû Berhem* (Berhevkar: Kawa Nemir, Selîm Temo), Weşanên Lîsê, Stenbol, 2008, 15 hd.

xebatên herî hêja yên bi hev re ya A. Jaba û Mele Mehmûdê Bazîdî ye. Di pîyaseyê de gelek kême û kurdîya wê bi alfabeya Erebî ye.⁵⁹

1.4.6.2. Ferhenga Kurdî ya Dîyalekta Hekarî-Rewendî

Ferhat Pîrbal, di kitêba xwe ya “Yekemîn Çiroknûs û Pexşanûs Mele Mehmûdê Bazîdî” de, li ser vê xebatê wiha dibêje: Wî bi Kurdî di pêşgotina vê kitêbê de gotîye: “*Ev e risaleyek e di behsa hinek ferq û cudayê di nêv lûxatêt ekradan, hindê beyanê be'zê qewaîdê umumî yêd lazim e*”. Li ser rûpela yekê ya fransîzîya wê wiha hatiye nivîsandin: “*Vocabulaire kurde des dialectes de Hekari et Revendi, par A. Jaba, Consul de Russie Erzeroum, Erzeroum le 15 Mars 1858*” Ango “Gotinên kurdî yên bi dîyalektê Hekarî û Rewendî, ji aliyê: A. Jaba konsolosê Rûsî yê Erziromê, Erzirom 15yê Adara 1858’an”.⁶⁰

Ev kitêb, bi destxetê yekê navê wî Şehnezer û di sala 1858an de hatiye nivîsandin. 49 rûpel e, hecma wê 22×34 santêm e û di her rûpelê de 13 rêz hatine nivîsandin. Ji aliyê Mele Mehmûdê Bazîdî ve pêşgotinek jê re hatiye nivîsandin û dibêje: Bi dîyalektê kurmancî, behsa hinek taybetmendiyên zimanê kurdî dike. Vêca kurtîyek rêziman di derbarê du dîyalektan û cihêtiyên wan de tê de hene... Ev destnivîs hatiye bi rêkûpêk kirin û di sala 1984an de ji aliyê Maruf Xezenedar ve hatiye çapkirin.”⁶¹

1.4.6.3. Ferhenga Kurdî-Rûsî-Fransîzî û Rûsî-Fransîzî-Kurdî

Mele Mehmûdê Bazîdî, di amadekirina vê ferhenga ji 15 hezar bêjeyan pêk hatiye, alîkarîya A. Jaba kirîye. Ev kitêb heta niha nehatiye çapkirin û ew di Akademîya Zanistî ya Petersburgê de hatiye parastin.⁶²

⁵⁹ Bazîdî, *Cami'eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 14-18; Adak, *b.n.b.*, 340-343; Sağniç, *b.n.b.*, 343-345; Pîrbal, *b.n.b.*, 9-30; Öner, *b.n.b.*, 128-134.

⁶⁰ Pîrbal, *b.n.b.*, 9-30 .

⁶¹ Bazîdî, *Cami'eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 14-18; Adak, *b.n.b.*, 340-343; Sağniç, *b.n.b.*, 343-345; Öner, *b.n.b.*, 128-134.

⁶² Bazîdî, *Cami'eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 14-18; Adak, *b.n.b.*, 340-343; Sağniç, *b.n.b.*, 343-345; Pîrbal, *b.n.b.*, 9-30; Öner, *b.n.b.*, 128-134.

1.4.6.4. Rêzimana Erebî Bi Zimanê Kurdî

Ev kitêb di eslê xwe de ya Elî Teremaxî⁶³ ye. Lê Mele Mehmûdê Bazîdî ew ji nû ve bi rêkûpêk kirîye û nivîsandîye û pêşgotinek ji jê re amade kirîye. Navê kitêbê yê orîjînal ev e: “*Serf û Be’dê Usûl Lazimeyê Te’lîme Bi Zimanê Kurmancî*”.

Dixuyê ku Elî Teremaxî ev kitêb di destpêka sedsala 17an de nivîsandîye. Çunkî Minorsky dibêje: “*Elî Teremaxî di sala 1591an de hatîye dinê*”.

Ferhad Pîrbal di kitêba xwe ya navê wê derbas bûyî de, di vî warî de agahdarî dide û wiha dibêje: “A. Jaba di du nameyên xwe yê tarîxa wan 17.06. 1858 an û 02.04.1859 an de, ku ji rojhilatnasê Elmanî Lerinhardet Dorin re dişîne wiha dibêje: Ev destnivîsa hêja berîya sala 1857an li ba Melekî xelkê Hekarîyê bû, min jê daxwaz kir ku bide min an bifroşe min, lê wî nefiroşt... Navnîşana destnivîsê ya fransizî ev e: “*Gramaire kurde par Ali Teremakhi offert a l’Academie Imperial des Sciences a St-Petersbourg, par A. Jaba.*” Lê pişt re em ji maqalekê ku di berhema Mele Mehmûdê Bazîdî ya bi navê “*Cami’eya Risaleyan û Hikayetan*” ku ji çil çîrok û sê maqaleyên ji alîyê wî bi ve xwe ve hatine nivîsandin pêk tê -yek ji wan maqaleyan a ku em behs dikin- û ji alîyê A. Jaba ve wergera wan a fransizî hatîye kirin û li Petersburgê bi pêşgotinekê re ji alîyê P. Lerch ve kurdî û fransizîya wê hatîye weşandin, hîn dibin; Mele Mehmûdê Bazîdî diçe li ba wî Meleyê xelkê Hekarîyê û ew kitêba Elî Teremaxî jê werdigire. Pişt re jî ew bi xwe vê destnivîsê ji nû ve divejîne û ew bi pêşgotineka di warê jîyana dînî û rewşenbîrî ya di nav mizgeftên wî wextê yê Kurdistanê de, awayê xwendina dersê û bi kurtîyek di warê jîyana Êliyê Teremaxî de teslîmê A. Jaba dike.⁶⁴

Belê, em dibînin ku cara ewil e ku Mele Mehmûdê Bazîdî ev berhema Êlî Teremaxî ya hêja û yekemîn car bi kurdî nivîsandina rêzimanêkê, peyda dike û pişt re jî ew ji nû ve divejîne û dixê li ber destê xwendevanên kurd. Heta niha çend kesan di derbarê vê kitêbê de hinek agahdarî dane. Yek ji wan edebîyatnasê hêja Marûf Xeznedar e.

⁶³ Elî Teremaxî: Yekemîn rêzimana kurdî nivîsîye, ji dayîk bûna xwe ji Miksa (Bahçesaray) girêdayî bajara Wanê ye; Şukriye Mustafa Resul, *Rolî Magred Rudenko Zindikirdina Kelepôrî Kurdî Da*, 115-121.

⁶⁴ Pîrbal, *b.n.b.*, 9-30; Adak, *b.n.b.*, 340-343; Sağniç, *b.n.b.*, 343-345; Pîrbal, *b.n.b.*, 9-30; Öner, *b.n.b.*, 128-134.

1.4.7. Kilam, Bêrîte, Gotinên Pêşîyan

Mele Mehmûd gelek babet û mijaranda nivîsîye ku cureyên zargotinê û çandê zêdetirin. Yek ji wan xebatên hêja ku ji aliyê Mele Mehmûdê Bazîdî ve hatîye kirin, berhevkirina kilam, bêrîte, gotinên pêşîyan û gelek tiştên wekî van ên edebî û folklorî ne.

Wî hem kilamên mêrxwasî û hem jî yên evînîyê ku di nav kurdan de tên gotin berhev kirine û teslîmê A. Jaba kirine û wî jî hemî van berheman ji Akademîya Zanistî ya Petersborgê re şandine.⁶⁵

Li gor Ferhat Pîrbal, Mela Mehmûd gelek berhemên şairên osmanî, ‘ecem (faris) û ‘ereb tercume kirine zimanê kurdî wek destxet. Digel wan berheman “Destana Kela Dimdim” jî di nav berhemên Mele Mahmûd da derbas dibe feqet nivîskarê vê ne dîyare û “Gulistana Sa’dî Şîrazî” jî bi awayekî pexşan wergerandiye zimanê Kurdî. Niha arşîvên Parîsê dane.⁶⁶

⁶⁵ Bazîdî, *Cami’eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 14-18; Adak, *b.n.b.*, 340-343; Sağniç, *b.n.b.*, 343-345; Pîrbal, *b.n.b.*, 9-30; Öner, *b.n.b.*, 128-134.

⁶⁶ Pîrbal, *b.n.b.*, 17-19.

2. PÊNASEYA ÇÎROKÊ Û DÎROKA ÇÎROKA KURDÎ

2.1. Pênaseya Çîrokê

Di ferhengê da “çîrok” peyva “masal” tê bikaranîn. Li gor hin cihan jî “çîrçîrok” û “kurte çîrok” tê gotin. Bi zimanê tirkî “masal, bi ‘erebî “mesel” û “qisse” û farsî “dastan” tê gotin. Li gor wateya wê ya edebî ya termî, ji wan hîkayeyên xeyalî re çîrok tê gotin ku di serdemên gelek berê de ji nav muxeyyileya gel derketine û bi bûyerên awarte hatine xemilandin.⁶⁷

Li gor nêrîneka din jî çîrok, yek ji babetên zargotinê ye. Serpêhatî û bûyerên xeyalî bi awayekî fewqulade û mucîzewî tînen vegotin. Li gorî danasînê çîrok, bûyerên ku ji xeyalên gel derketine û ev bûyer di jiyana rastîn de nayên dîtin an bi tamamî an jî hinekî ji jiyana rastîn dîrin. Gelek caran bi kesayetî û bûyerên nedîtî re neqîşkirî ne.⁶⁸ Çîrok, di nav gel de wek çîrçîrok, çîrçîranok, çîrçîronek, xeberoşk, cîvanok, mesel yan jî wek hîkayeyê tê binav kirin. Kurdên Zaza jî ji bo çîrokê, peyvên sanike, estaneke û fistanike bikartîne.⁶⁹

Dîsa vegotina bûyereka bi devkî an jî bi nivîskî re çîrok tê gotin. Di çîrokê de cîhê ku bûyer di tê de diqewime bi sinor e, nişêtin cîh pir nayên teswîr kirin. Mirov dikare çîrokan têxe du beşan wek çîrok û kurte çîrok û hînkê jî romanên (masal) wek çîrokên dirêjî qebul dikin.⁷⁰ Çîrokê wek hunerekî Ewropayî ku sedsala 15 û 16 û li niva duyê ya sedsala 19 an li nav civakê da cîhê xwe girtiye.⁷¹

Yekem car peyva “çîrokê” di ferhenga Kurdî-Erebî a di sala 1893yan da hatiye bikaranîn. Navê vê ferhengê “el-Hediyye el-Hemîdiyye fi’l-Lugat el-Kurdiyye” ye û ji aliyê Yusuf Ziya Paşa el Xalidî el Meqdîsî ve hatiye amadekirin û li bajara Stenbolê hatiye weşandin.⁷²

⁶⁷ Ayhan Yıldız, *Hunera Vegotina Bedew a Devkî û Nivîskî*, I-II, Weşanên Lorya, Stenbol, 2017, 1, 229; Pîrbal, *b.n.b.*, 9-30.

⁶⁸ Çiya Mazi, *Baxek Ji Foklora Kurdî*, Weşanên Berbang, İstanbul, 2014, 353.

⁶⁹ Muzaffer Ekinci, *M. Emin Bozarşlan’ın “Meselokên Lawiran” Adlı Hayvan Masalları Serisinde Yer Alan Hayvan Motifleri Üzerine Bir İnceleme*, Muş Alparslan Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Teza Mastirê, Muş, 2017, 20-29.

⁷⁰ Zahir Rojbîyanî, *Çîrokî Hunerî kurdî(Şewê, Şewaz û Bunyad)*. Çapî Yekem, Çapxaneyî Rewşenbîrî, 1997, 5; Omer Marûf Berzencî, *Lêkonînewe û Biblografyay Çîrokî Kurdî (1925-1969)*, Korri Zanyarî Kurd. Baxda, 1978.

⁷¹ Enwar Muhammed Tahir, “Rola Kovar Hawar Jibo Pêşhistina Çîroka Kurdî Ya Hunerî”, *Kovara Metîn*, J.75, 1998, 35.

⁷² Haşîm Ahmedzade, *Ulus ve Roman*, (Wer. :Azad Zana Gündoğan), Weşanên Pêrî, Stenbol, 2004, 190; Mehmet Öncü, *Çîrokên Efsaneyî Yên Kurda*, Weşanên Nûbiharê, Stenbol, 2014, 23-74.

Beşên çîrokê bi gelemperî wek çîvanok, ev ji serê çîrokê û destpêka çîrokê pêk tê, beşa hîmî ji gewde û bingeha çîrokê pêk tê û beşa encamê jî dawîye. Li gor çîroknivîs çîrok di bin sê serenavan de tomar dibin.⁷³

2.2. Cureyên Çîroka

Li gor lêkolîner û çîroknivîsan gelek cureyên çîroka hene. Bi awayekî çîrok du curen e ku ya yekem; Çîrokên ji aliyên gelan ve hatine hilberin û ya duyem çîrokên nû yên ku ji hela kesên nivîskar ve hatine hilberîn.⁷⁴ Ango çîrokên devkî û çîrokên çêkerî ne.

Berhemên edebî bê guman bi dorhêla civakî û dînî ya civatê ve girêdayî ne û ji sedsalan vir ve wekî mêjûyê civakî ya gelan hebûna xwe didomînin. Di nava berhemên edebî de gelek cureyên menzûm û mensûr hene. Ji vana jî cîyê çîrokan gelekî girîng e. Wekî yên din çîrok jî ji giyana gel der çûye, di nava xwe de nîrxên gel yên hevpar hewandiye û bi xwedîtîya mîrateyeke çandî ya dewlemend hebûna gel ya neteweyî bi awayekî rast û dirust parastîye. Çîrokên ku Bazîdî ji Farsî wergerandine, her çiqas ji ziman û edebîyata Farsan be jî, mesajê ku dide xwendekaran ji bo çand, jîyan û paradîgmaya hemû netewên rojhilatî derbasdar in.

Derbarê jêderka çîrokên klasîk yên li rojhilat de, gelek zanyar teorî peşkeş kirine; lê belê di vê derbarê de herî zêde wekî jêderka çîrokan qisseyên Quranê tên pêjirandin. Li gorî nêrînên giştî çîrokê, weke cureyeke edebîyata klasîk jêderka xwe, di serî de bi bandora Îslamîyetê ji qisseyên Quranê, menqîbeyên ewlîya û enbîyayan wergirtîye. *“Bingeha çîrokên kurt Qurana pîroz e. Di Quranê de qisse, ku em dikarin qisseyan wekî çîrokên kurt jî binav bikin, cîyekî girîng zêft dikin. Li gorî tesbîta lêkoleran ji çara sê parçeyê Quranê ji van qisseyan pêk tê. Dema ku Xwedê Te’ala bi navgîniya Cenabê Pêxember mirovatîyê vexwendî rêya rastîyê kirîye, ji bo ku heqîqet li ber çavên wan şênbertir bibe, di Quranê de van qisseyana nimûne girtîye. Ev kurteçîrokên Quranê, ku bêhtir ji bo îfadekirineke zelal û bandorkirinê hatine bi kar*

⁷³ Pertev, *Zarok û Çîrok (Destpêka Pedagojiya Kurdî)*, 95.

⁷⁴ Yıldız, *Hunera Vegotina Bedew a Devkî û Nivîskî*, I, 229.

anîn, bi navgînîya taybetmendîyên islûba xwe, bandor li ser hemû mielifên Îslamî û berhemên wan kirîye.”⁷⁵

Çîroka klasîk ji rasyonalityê û bi gotineke din jî ji realîteyê bêpar e. Lê wextê ku em li naveroka çîrokên Bazîdî yê wergerandine dinhêrin bi tu awayî tiştêkî aşopî, derasayî û derî aqil bi ber çavan nakeve. Bûyer, leheng û qewimînên di van çîrokan de, bê awarte, rasteqînî û tiştêkî ku aqil qebûl neke di wan de tune ye.

Lêkolîner, çîrokên klasîk ji aliyê çavkanîyê ve senifandîye û wan wek yê wergerî, yê telîf û yê ku ji çîrokên bîyanî hatine adaptekirin di sê beşan de tesnîf dikin. Li gorî mijarê jî çîrokan wekî qehremanî, macerayî, dînî-tesewifî, exlaqî û letîfeyî dabeş dikin.⁷⁶

Li gorî senifandina lêkolîner û nivîskaran, çîrokên ku Bazîdî wergerandine, ji aliyê çavkanîya xwe ve bêguman çîrokên wergerî ne. Em dikarin çîrokên Bazîdî ji aliyê mijar û naverokê ve jî hem dînî-tesewifî, hem exlaqî û hem letîfeyî qebûl bikin.

Di kevneşopîya çîrokên edebîyatên rojhilatî de berî her tiştî mesaja başîyê, rastîyê û xweşikayîyê heye. Çîrokên Bazîdî dînî-exlaqî ne, mebest jî bi xwe lêgerîna insanê kamîl e, ango pêkanîna merivê qenc e.⁷⁷

Li gorî lêkolîneran teşeya çîrokan ji hev cuda cuda ne. Hinek lêkolîner di bin pir beşan de çîrokan dihonînî, hinek jî hejmara honandina çîrokan (beşan) kêr dikin. Ji bona ku gotinên me zelal were fêmkirin em li gorî çend lêkolîneran cûreyên çîrokê bibînin. Piranîya çîroknivîskar û lêkolînera çîrokan wisa polîn dikin. Bi kurtasi wek Çîrokên Awarte (Neasayî), Cin û Pêriyan, Mirovên Neasayî, Sêhr û Efsûnê, Cinawir, Dêw û Pîrhevokan (Pîrebotk), Padîşah, Siltan, Şehzade, Keybanû û Wezîran, Dewlemendan, Bazirganan, Axa û Began, Kesên Kawik ango Heşşivik-Mirovên saf û Xizan û Çîrokên ku mijara wana Biwêj û Gotinên Pêşîyan e.⁷⁸

Li gorî hinek nêrînan em dikrin cûreyên çîrokan di bin pênc serenavan da dabeş bikin:

- 1- Çîrokên Ajalan (Meselokên Lawiran)
- 2- Çîrokên Rasteqîn

⁷⁵ Bilge, *b.n.b.*, 12; Ekinçi, *b.n.b.*, 20-58; Zeynelabidîn Zinar, *Xwençe I-XII*, Weşanên Çanda Kurdî, Stokholm, 1991.

⁷⁶ Bilge, *b.n.b.*, 14.

⁷⁷ Bilge, *b.n.b.*, 45-65 ; Güzel, *b.n.b.*,45-60; Öztürk, *b.n.b.*, 34-36 .

⁷⁸ Me’ruf Xeznedar, *Mêjûy Edebî Kurdî, I-VII*, Weşanên Aras, Hewlêr,2010,46-52; Mehmet Bozkoyun, “Beşek Ji Folklorê Kurdî: Çîrok,” *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, 2, 2015, 142-157.

- 3- Çîrokên Pêkenokî
- 4- Çîrokên Zîncîreyî (Muteselsîl)
- 5- Çîrokên Ku Nakevin Tu Dabeşkirina Çîrokan⁷⁹

Bi bandora vê nêrîna navdar di edebiyata Kurdî de di derbarê dabeşkirina cûreyên çîrokên Kurdî de nîqaşên edebî hê jî têne kirin. Di derbarê vê mijarê de ji aliyê hin nivîskaran ve hin fikir avêtine holê, xwediyê nêrînek ji van nêrînan Ramazan Pertev e. Pertev di berhema xwe a bi navê “Zarok û Çîrok” de çîrokên Kurdî li gorî bûyer û lehengên çîrokan di bin çar beşên bi navê: Çîrokên Ajalan, Çîrokên Zîncîreyî, Çîrokên Rasteqîn, Çîrokên Neasayî⁸⁰ dide rêz kirin. Lê belê dema ku em çîrokên pêkenokî ê lawiran jî di nav wan cureyan de bihêsibînin hinga cûreyên çîrokan di bin pênc serenavan de bi vî awayî tê kategorize kirin: Çîrokên Ajalan (Meselokên Lawiran), Çîrokên Zîncîreyî (Muteselsîl), Çîrokên Rasteqîn, Çîrokên Neasayî (Fewqulade), Çîrokên Pêkenokî ê Lawiran e. Niha jî emê van cureyan çîrokan bidin nasandin:

2.2.1. Çîrokên Ajalan (Meselokên Lawiran)

Çavkaniya van çîrokan li gorî pîrr kesan rojhilat e. Lehengên van çîrokana ajal in. Peyama ku dixwaze were dayin bi rêya ajalan ve tê ye dayîn. Ajal di van çîrokan de diaxivin. Herçiqaş weke fabl werine binavkirin jî carcaran bi dirêjîiya mijara xwe û di naveroka vana de hebûna serpîhatiyan hene, ji ber van her- du sedemana hinekî ji fablan cuda ne. Çîrokên ajalan hem bi şêweya pexşanê hem jî bi şêweya helbestkî têne nivîsandin. Di van çîrokan de hînkarî û şîretên sincî, cewherên dostaniyê, hogirî, qencî, xweşî, dilsozî li hemberî wana durûtî, neyarî, hevrapandin, dijminî, hesûdî, çevnebarî hene. Di vî warî de li Ewropayê Ezop, La Fontanie, Jacop Grimm û Wilhelm Grimm (Mizikavanên Bremenê), li Hindistanê Mahabharata û rêze çîrokên Pançatantra wek Kelîle û Dîmne, Li Tirkîyeyê Harnâmeya Şeyhî û Mesneviya Mewlana, di nava kurdan de jî M. Emîn Bozarşan, Zeynelabidîn Zinar û hwd. çîrokên ajalan nivîsandine.⁸¹

⁷⁹ Ekinci, *b.n.b.*, 20-58.

⁸⁰ Pertev, *b.n.b.*, 2009: 94-95; Ekinci, *b.n.b.*, 20-58.

⁸¹ Bozkoyun, *b.n.b.*, 142-157; Pîrbal, *b.n.b.*, 9-30 ; Heciyê Cindî, *Hikyatêd Cimeta Kurda VI*, Weşanxana Asoxîk, Yêrevan, 2005, 25-75.

2.2.2. Çîrokên Rasteqîn

Li gorî cûreyên din, di van çîrokan de leheng, bûyer, cih û dem hîn nêzîkî rastiyê ye. Di nava van çîrokan de bi gelemperî dijberî hene. Dewlemend-xizan, rindnerind, bihêz-qels, axa-gel her tim di van çîrokan de tê pêşberî me. Di dawiya van çîrokan de peyam, rastî, durustî, bêqîmetiya mal û milk, hezkirina mirovan, qedirzanîn e.⁸²

2.2.3. Çîrokên Zîncîreyî (Muteselsîl)

Ev cûreyên çîrokan jî; Ji rêze çîrokan pêk tene ku di navbera wan de rist û pevgirêdanek mantiqî heye. Bûyer û rûdanên çîrokê li dû hevdu tene gotin. Lehengên van çîrokan hema bi gelemperî ajal in. Ev cûreyê çîrokan ne pîrr dirêj in. Bi awayekî din ev cûreyê çîrokê wihaye. Di nav van çîrokan de lehengên çîrokê bi taybetî xwediyên serpêhatiyekê ne û di nav vê serpêhatiyê de hin çîrokên cuda jî bi awayekî mantiqî cih digirin û bi vî awayî çîrok pêk tê. Li gorî danasîna Pertev, “*Di wan çîrokan de rist û pevgirêdaneke mantiqî heye. Bûyer û rûdanên çîrokê li dû hev tene gotin. Her yek ji wan, hem berdewama ya din e hem jî bi serê xwe çîrokek e.*”⁸³

2.2.4. Çîrokên Neasayî (Fewqulade)

Di nava cûreyên çîrokan de ya herî zêde tê zanîn ev cûre çîrok in. Naveroka van çîrokan neasayî ne. Bûyera van çîrokan ji serî heta dawî bi bûyerên adetî û fewqulade tê damezirandin. Bûyer carcaran heft tebeqe di binê erdê de, carcaran li ser çiyayekî di nava ewran de, carcaran li welatê pêriyan diqewimin.

Lehengên van çîrokana îfrît, cin, pêrî, dêw, hût, cinawir, pîrebok, pîrhevok, pîreke sêhrbaz li aliyê din lawikê padîşah, keybanûyek, nêçîrvanek, belengazek hwd. in. Hin caran di nav van lehengên fewqulade û lehengên adetî yên mîna şivan, padîşah, şehzade û wezîr de tîkiliyek heye. Lehengên van çîrokana li

⁸² Me’ruf Xeznedar, *Mêjûy Edebî Kurdî, I-VII*, 46-52; Bozkoyun, *b.n.b.*, 142-157; Pîrbal, *b.n.b.*, 9-30.

⁸³ Ramazan Pertev, *Zarok û Çîrok (Destpêka Pedogojîya Kurdî)*, Weşanên Doz, Stenbol, 2012, 95.

hember mehlûqatên ecêb dikevin têkoşînên hebûn û nebûnê. Lê dawiya dawî van çîrokana bi serkeftina lehengan bi dawî dibe. Di van çîrokan de mirov têkoşîn, sebr, lehengî bi awayekî zelal li ber çava têne raxistin.

2.2.5. Çîrokên Pêkenok

Ev çîrokana kurt in. Di naveroka wan de meselokên tûman (komîk) hene. Lehengên van çîrokana kesên ji rêzê ne. Hêmanên pêkenînê di nava van çîrokan de gellek in. Herçiqas bûyer biqewimin û ev bûyerana li dijberî leheng be jî dawiya dawiyê lehengên van çîrokan bi ser dikevin û bextewarî dimînin. Zimanê van çîrokana hêsan in, hemû kes dikare ji mijarê fêhm bike.⁸⁴

2.3. Naveroka Çîrokê

Bi taybet di naveroka çîrokên kurdî de gelek motîfên ji hev cuda ji xwe re cihêkî dibîne. Bingeha naveroka çîroka kurdî civata kurda ye. Di her warî de civata kurd gelekî dewlemend e. Em di wê baweriyê de ne ku çîrokên kurdî jî sûd ji vê dewlemendiyê girtiye.

Çîrok di nava xwe de pîrîr nirxên madî û manewî dixevînin. Naveroka çîrokan bi tenê xîtabî zarokan nake. Berevajî xîtabî hemû civatê dike. Dema ku çîrok bi baldarî were xwendin û nirxandin wê were dîtin ku di çîrokê de (çîrok malê kîjan civatê be) çand, folklor, bewerî û nerxdaraziyên civatê were dîtin. Teşeyên jiyana gelan, baweriyên wan, kevneşopiyên wan hemû di çîrokan de xuya dibin. Çîrok ji civatê ne cuda ne. Reng, deng, bang, hêvî, rindî, nerindî, camêrî, xirabî û xeyalên civatekê di nava çîrokên wê civatê de olan dide.⁸⁵

⁸⁴ Me'ruf Xeznedar, *Mêjûy Edebî Kurdî*, I-VII, 46-52; Bozkoyun, *b.n.b.*, 142-157; Pîrbal, *b.n.b.*, 9-30.

⁸⁵ Me'ruf Xeznedar, *Mêjûy Edebî Kurdî*, I-VII, 46-52; Bozkoyun, *b.n.b.*, 142-157; Mehmet Uzun, *Antolojya Edebîyata Kurdî*, Weşanên Aram, Stenbol, 1995, 25-78.

2.4. Çavkanîyên Çîrokê

Pêşengê teoriya çavkaniya çîrokan lêkolînerê Elman Wîlhem Grîmm e. Wî teoriyên xwe di pêşgotina pirtûka bi navê “Kinder und Hausmarchen” aniye ziman.

Li gorî nêrina vî du çavkanîyên çîrokan hene:

1-Çîrok, mîrateya dîrokî yên ku ji famîlya Hind-Ewrûpayê.

2- Çîrok, hêmanên mîtolojiyên kevnar in.

Piştî W. Grîm, gelek nêrîn hatine gotin û derbarê vê mijarê de gelek gengeşî jî hatine kirin. Di navbeyna lêkolîneran de pirsar “Çavkanîyên Çîrokan” bala gelek lêkolîneran kişandiye ev du sed sal in ku bi zindî tê gengeşî kirin.⁸⁶

Di derbarê çavkanîyên çîrokê de hinek senifandin hene. Ev sinifandina di bin navên ekolan de derdikeve pêşberî me. Li gor lêkolînên zanistî çavkanîyên çîrokan ev in:

Nêrina Mîtolojiyê: Baweriya vê dibistanê di vî warî de ye ku çavkanîyên çîrokan mîtoloji ye û ev mîtolojiya jî mîtolojiya Hind-Ewropayê ye. Bi borîna demê re mîtolojiyên Hind-Ewropayê guherîne û bûne çîrok. Nûnerên vê ramanê Jacob Grîmm, Wîlhelm Grîmm, G.V. Cox û Max Muller in.

Nêrina Hîndolojiyê: Li gorî vê ramanê çavkaniya çîrokê Hindistan e. Di sedsala X'em û vir de çîrok ji Hindistanê belavî dinyayê bûye. Nûnerên vê ramanê Î. Kunoş, Theodar Benfey û Emanûel Cosqûin in.

Nêrina Antropolojiyê: Li gorî vê ramanê çîrok jêmayiyên jîna hov e. Nûnerên vê ramanê Edward Taylor, Andrew Lang, Franz Boaz û Paûl Saîntyne in.

Nêrina Derûniyê: Li gorî vê ramanê çavkanîyên çîrokê xewn in. Nûnerên vê ramanê Von der Leyen e.

Nimûneya herî girîng ya çîrokê Kelîle û Dîmneya Beydeba ye û em dikarin bibêjin di warê çîrokê de berhema yekem ya rojhilat e. Li Ewropayê çîrok b.z. di sedsala VI'em de bi Ezop (Aîsopos) dest pê kiriye. Piştî Ezopî, di sedsala XVIIem de Jean de La Fontanî ye fransî çîrokên ajalan ‘fabl’ amade kirine. Li Asyayê di dewra dewleta Ûygûran de çîroka Kalyanamkara û Papamkara. Ango Şehzadeyê xwedî hizrên baş û Şehzadeyê xwedî hizrê nebaş mînakeke balkêş e. Di nava wejeya tirkan de jî em di *Harname* ya Şeyhî û *Mesnewî* ya Mewlana de rastî çîrokên ajalan tên. Di nava kurdan de jî mînakên çîrokan zêdene. Di kovarên weke

⁸⁶ Ekinci, *b.n.b.*, 20-58.

Hawar, Ronahî de pîrr çîrok hatine nivîsandîn, ji bilî vê kesên wek Feqî Husên Sağniç, M.Emîn Bozarslan, hwd. çîrokên fablê berhev kirine û weşandine.⁸⁷

2.5. Lehengên Çîrokê

Di çîrokan de leheng li gorî cûreyên çîrokan de tene guherîn. Di çîrokên neasayî de ger leheng mirov be, ew kesa kesekî xurt û bi hêz e. Tu caran çavê xwe ji riya xwe bernade. Çi derkeve pêşberî wî/wê dawiya dawî ew bi ser dikeve. Tirs tu caran nabe mêvanê van kesan. Di çîrokên ajalan de leheng ajal in. Lê di çîrokên din de ajal alîgirên lehengane. Bi piranî ev ajalana hesp, tajî, şêr, balinde, teyr, beq û hwd.

Di çîrokan de bi piranî taybetmendiyên lehengan yekaliye. Hetanî dawiya çîrokê, kesên rind rind in, kesên nerind jî nerind in. Lê pîrr kêmbê jî carinan hinek kesên xerab berve dawiya çîrokê qenc dibin û derbasî aliyê rastiyê dibin. Di çîrokan de bi piranî ev leheng derdikevin pêşberî me: Dêw, pîrhevok, pêrî, kur an jî qîzên padîşahan, wezîr, dêmarî, ap û amojin, pîremêr, şivan, gavan, îfrîd, beran, tîremar, pepûk, şêr, tajî, teyr, beq hwd. di çîrokan de rolên lehangan jî ji hev cuda ne. Yê ku rolên wana erênî bi piranî ev in: Padîşah, kur an jî qîzên padîşahan, kesên xizan, şivan, gavan, pêrî, şêr, tajî, teyr, beran, beq; yê ku rolên wana neyênî ev in: Dêw, pîrhevok, efrîd, wezîr, dêmarî, ap û amojin.⁸⁸

2.6. Çîrokê de Cih û Dem

Bi piranî di destpêkê de behsa cihê ku buyer lê qewimîye tê kirin. Ev cihana, derên ku tu caran mirovan bi çavên xwe nedîne. Cihên wek welatê pêriyan, qes- ra padîşahê pêriyan, paş çiyayê qaf û hwd. tê xwuya kirin ku ev hemû der, derên xeyalî ne. Ya rast ev derên xeyalî gelemperî bala mirovan bi taybet jî bala zarokan dikêşîne û hîn zêde guhê xwe didin çîrokbêjan.

Li aliyê din di çîrokan de dem jî nayê zanîn. Di destpêka çîrokê de çîrokbêj

⁸⁷ Feqî Huseyn Sağniç, *Çîrokên Kurdî (Fabl)*, Weşanên Enstîtuya Kurdî, Stenbol 1999 ; Bozkoyun, *b.n.b.*, 142-157; M. Emin Bozarslan, *Gurê Bilûrvan*, Weşanên Deng, Amed 2000; Temo, "Çîrok", *Kovara Rojî Kurd*, 121-122; Me'ruf Xeznedar, *Mêjûy Edebî Kurdî, I-VII*, 46-52.

⁸⁸ Bozkoyun, *b.n.b.*, 142-157; Me'ruf Xeznedar, *Mêjûy Edebî Kurdî, I-VII*, 46-52.

dibêjin: “Hebû tunebû...”, “carekê ji caran”, “di wexteke nediyar de li welatekî”, “di zamanê berê de”, Li vê derê jî diyar e ku dema ku çîrok tê de qewimiye nayê zanîn. Lê belê em dikarin bibêjin demên çîrokê bi “dema boriya dûdar û dema fireh” têne vegotin.⁸⁹

2.7. Çîrokê de Bûyer

Naverokên çîrokê li gorî cûreyên çîrokê tên guherîn. Di çîrokên neasayî de mijar bûyer tiştin nerojane ne, bûyer tiştên neasayî ne. Di çîrokên ajalan de mebest ders dayîne ji ber vê yekê di nava van çîrokan de pirsgirêkek heye û ev pirsgirêka li aliyê kesên qenc, rast tê çareserkirin. Em dikarin bibêjin ku kêma zêde bûyerên di hemû çîrokan de ramanên dijber mina qencî-xerabî, rastî-nerastî hwd. şer dikin û çîrok bi serkeftinên ramanên baş diqedin. Di çîrokên rasteqîn de bûyerên ku rojane têne qewimîn derdikeve pêşberî me.

Di çîrokan de bûyer, bi tevahî li ser zemîneke dererastî û neasayî hatiye damezirandin. Dibe ku di çîrokan de bûyerên dîrokî yên qewimîni jî têne vegotin, lê ev bûyerana di atmosfera çîrokan de nayên naskirin ango edî rengê çîrokê girtine. Di hinek çîrokan de mimkûn e ku em rastî mîtên hinek mîtolojiyan jî werin.⁹⁰

Dîroknasê Kurd Şerefxan, bûyerên dîrokî re dibêje çîrok û wî navê xebata xwe ya di derbarê dîrokê ra wek “Çîroka Hukumdarên Kurdistanê”⁹¹ bi lev dike.

2.8. Li Dinyayê Çîrok

Çîrok, cureyek ji folklorê navnetwî ya devkî ye. Çîrok, dema ku mirov hate afirandin derketiye holê, mêjûyê çîrokê biqasî dîroka mirovahiyê dîrûdirêj e. Herçiqas di vegotinê de hinek cudahî hebin jî çîrok hebûna mirovahî ya hevpar e. Çîrok jî aliyekî de hînkariyê in, jî aliyekî de mirovan difikirîne, jî aliyekî jî şîretkariyê in. Di çîrokan de bi piranî kes/leheng derasayî ne, xwedî hêzên derîaqil in. Carna lehengên wan çîrokan ajal in. Herçiqas mijara çîrokên kurdî xeyalî be jî cardin bingeha xwe ji jiyana civaka kurd girtiye û li ser êş, azar, kul, serpêhatî, xewn û

⁸⁹ Bozkoyun, *b.n.b.*, 142-157; Me’ruf Xeznedar, *Mêjûy Edebî Kurdî*, I-VII, 46-52.

⁹⁰ Bozkoyun, *b.n.b.*, 142-157; Me’ruf Xeznedar, *Mêjûy Edebî Kurdî*, I-VII, 46-52.

⁹¹ Şerefxanê Bedlîsî, *Şerefname* (Wer.: Ziya Avcı), Çapa Sêyem, Weşanên Awesta, Stenbol 2007, 12.

xeyalên civaka kurd hatine ristin.

Çîrok di nav edebiyata cîhanê de cureyekî navneteweyî ye. Di nav edebiyata cîhanê de yên ku mijar, sembol û motîfên herî hevpar çîrok in. Her çi qas welat, erdnîgarî, bîr û bawerî bê guhertin jî di çîrokê de sembol û têgihên hevpar nayên guhertin. Ev hevparî di nav neteweyan de hişmendiyeke navneteweyî û felsefî nîşanî mirovatîyê dide. Ev hevparî ji bo rave kirina hin mijarên olî û felsefî hêsaniyek dike.⁹²

Çîrokên nivîskî bivê nevē bingeha xwe ji çîrokên nehatine nivîsandin digire. Ev tişta li hemû dinyayê bi heman rengî ye. Ji ber ku em dizanin gotin, bingeha nivîsê ye. Dema ku gotin tunebe nivîs kêr dimîne. Nivîskar an jî lêkolîner dema li çavkaniyan digerin bivê nevē riya wan bi nava gel mina gotinên devkî dikeve. Di nava gel de ji xwe re bingehekê amade dikin paşê nivîsê li ser wê bingehe ava dikin. Di vî warî de pir mînak hene.

Li cîhanê pîrr kesan çîrokên nehatine nivîsandin di nava gel de berhev kirine û paşê nivîsandine. Di vî warî de em dikarin çend mînakan bidin. Nivîskarên Îngîlîz Wilhelm Grimm (1786-1859) û Jacob Grimm (1785-1863) (Ku ev her du kes bireyên hev in û bi navê “Birayên Grimm”, tê zanîn. Berê çîrokên gel ên ku nehatibûn nivîsandin berhev kirine paşê jî ev çîrok nivîsandine. Ev xebata herdu birayan di warê çîrokên gelerî de, wekî klasîkên cîhanê têne pejirandin. Di vî warî de xebata Homerosê yewnanî, xebata nivîskarê Scotlandî Walter Scott (1771-1832) û hwd. xebat jî hene.⁹³

Gelek çîrokên navdar yên cîhanê yan bi navê neteweyên xwe mîna Hind, Erebb, Kurd, Grek û hwd. yan jî bi navê afirîner û derhenêrên xwe tînan nasîn wek çîrokên Ezop, Anderson, Birayên Grimm û La Fontaine hene.⁹⁴

Çîrokên navdar ên cîhanê em dikarin bi vî awayî bidin rêz kirin:

2.8.1. Çîrokên Hindan

Li gorî hin lêkolîneran Hindistan çavkaniya çîrokan a yekem tîne hesabandin.

Sedema ku cara yekem pirtûka çîroka “Kelîle û Dîmne” ya Beydaba li vî welatî

⁹² Ekinci, *b.n.b.*, 20-58.

⁹³ Şerefxan Cizîrî, *Edebiyata Devkî û Sosyalîzasyon*, Weşanên Aram, İstanbul, 2011, 17; Zeynelabidîn Zinar, “Hunera Folklorê Kurdî”, *Nûbihar*, J. 99, Stenbol 2006, 18; Bozkoyun., *b.n.b.*, 142-157; Me’ruf Xeznedar, *Mêjûy Edebî Kurdî, I-VII*, 46-52.

⁹⁴ Ekinci, *b.n.b.*, 20-58.

hatiye afirandin. Ev pirtûk di nav lêkolîneran de pêşenga çîrokan tê qebûl kirin. Ji xeynî vê pirtûka navdar bi navê Pançatanra, Hîtopadeça, Çakasaptatî/Sukasaptatî (Tûtîname), Ummana Nehra Çîrokan û çar pirtûkên hêja jî hatine nivîsîn.⁹⁵

2.8.2. Çîrokên ‘Ereban

Di nav edebiyata Ereban de pirtûkên bi navê “Ferec Ba’de’ş-Şidde” û pirtûka “Elf Leyle Ve’l-Leyl” (Çîrokên Hezar û Yek Şevê) gelek navdar in.

Di nav herdu pirtûkan de ya herî navdar pirtûka “Elf Leyle Ve’l-Leyl” ya ku çîrok li ser bêbextiya jinan hatiye afirandin. Ev çîrok ji aliyê edebiyatnasan ve gelek girîng tê dîtin.⁹⁶

2.8.3. Çîrokên Îraniyan

Di nav edebiyata Îraniyan de çîroka bi navê “El Fûn-Nehar Ve’n- Nehar” (Çîrokên Hezar û Yek Rojê) mîna nazîreyeke “Çîroka Hezar û Yek Şevê” ye. Ev pirtûk li ser bêbextiya mêran hatiye afirandin. Wekî din Mantiqul Teyr’a Ferîddun Etar (1136-1221) , Bostan û Gulistan’a Sadî Şîrazî (1193-1292) û Baharistana Molla Camî (1414-1492) jî gelek bi navûdeng in.⁹⁷

2.8.4. Çîrokên Ewrûpiyan

Çîrokên Ewrûpiyan bi du awayan pêk hatine. An bi destê helbestkar û nivîskaran hatine nivîsîn an jî çîrokên ku di nav zargotina gel de hebûn, ji aliyê folklorzanan ve hatin berhev kirin û bi awayekî edebî jî nû ve hatine nivîsîn.

Di edebiyata rojava de ji hêla cûreyên çîrokê ve ya herî kevnar edebiyata Grek/ Yewnan’an de Ezop/Aîsopos (b.z. 620-560) tê hesabandin.

Li Fransayê Jean La Fontaine (1621-1695) û Charles Perrault (1628-1703) e. Berhemên Charles Perrault ên bi navê “La Belle au bois dormant” (Rinda Razayî), “Le Petit Chaperon Rouge” (Keçika Kumsor), “Le Chat botté” (Pisîka Biqîzma), “Cendrillon” (Pisîka Xwelî) gelek navdar in.

⁹⁵ Ekinci, *b.n.b.*, 20-58.

⁹⁶ Ekinci, *b.n.b.*, 20-58.

⁹⁷ Ekinci, *b.n.b.*, 20-58.

Li Elmanyayê berhema bi navê “Kînder-Und Hausmarchen I-II” ji aliyê Birayên Grîmm (Jakob Ludwîng Karl Grîmm (1785-1863) û Wîlhem Grîmm (1786-1859) ve hate weşandin ku ev berhem ji çîrokên gelêrî yê Elmanan hatine berhev kirin.

Nivîskar û rewşenbîrê Danîmarkî Hans Chrîstîon Anderson di warê çîrokan de gelek navdar e. Wî çîrok berhev kirine û va çîrokan bi terzekî nû afirandine.⁹⁸

2.8.5. Çîrokên Kurdan

Di demen borî da li dinyayê û hemû welatê me çîrok bûne mijara gelek lêkolînan. Gelek caran çîrok, bi bêjeyên “hebû tunebû li welatekî”, “hebû tunebû carekê ji caran” dest pê dike û guhdaran dixê nava xeyalên neasayî û fantastîk, carcaran guhdaran dibe ser çiyayên di nava ‘ewran de, car caran jî guhdaran dibe heft tebeqe di binê ‘erdê de. Di şevên zivistanê yê dirêj de civata kurdan bi çîrokan re hevaltî dikirin ango çîrok parçeyek ji jiyana kurdan bû. Di nava kurdan de navê çîrokê hinekî bi nîqaş e. Ji ber ku li şûna peyva çîrokê carcaran serpêhatî, serhatî, kurteçîrok, çîrçîrok, çîrvanok, xevrişok, mesele, qewimîn, metelok, xeberoşk û hwd. têne bikaranîn, ev jî di navlêkirina çîrokê de aloziyê derdixê holê.⁹⁹

Di nav Kurdan da çîrokên hînkê û şîretkar bi giştî di dema zivistanê de ji aliyê jinan ve dihate gotin. Di nav rêzikên ve cureyê de gelek pêdiviyên jiyana tîn vegotin. Guhdar û xwendevanê vê cureyê bi saya peyamê çîrokê di derûniya wan de hest û ramanên erênî pêk tîne.¹⁰⁰

Gelo di nava kurdan de çîrokên gelêrî cara ewil kê nivîsandine? Belê çîrokên gelêrî yê ku hatine nivîsîn di nava kurdan de jî hene. Hinek çîrok hebûn, neteweyî bûn ango li hemû welêt dihate zanîn wek “Şengê û Pengê”, “Mîrze Miheme” hinek jî herêmî bûn, an jî hew li gundekî tenê dihatine zanîn. Em ji arşîva Aleksandr Jaba dizanin ku Mele Mûsayê Hekarî hîn di sedsala XVII de zêdetirî 50 çîrokên kurdî yê gelêrî berhev kirine û ew bi navê “*Duru’l*

⁹⁸ Ekinci, *b.n.b.*, 20-58.

⁹⁹ Bozkoyun, *b.n.b.*, 142-157; İrfan Babaoğlu, “Kurteçîrok Hestên Kurdan in”, *Kovara W*, J. 47, Stenbol, 2013, 52; Pertev, *Zarok û Çîrok (Destpêka Pedogojîya Kurdî)*, 89-93; Fîrat Cewerî, *Antolojiya Çîrokên Kurdî (1856-2003)*, I-II, Çapa Yekem, Weşanên Nûdem, Stenbol, 2003, 45-102.

¹⁰⁰ Ekinci, *b.n.b.*, 20-58.

Mecalîs” wekî pexşankî nivîsîne.¹⁰¹ Arşîva Aleksandr Jaba kopiyeyê arşîvê ya dîjital di sala 2013yan de ji aliyê “Beşa Ziman û Çanda Kurdî ya Zanîngeha Mardîn Artukluyê “ve li Petersburgê hat zêdekirin û niha li Mêrdînê ye.¹⁰²

Ji aliyê berhevkarî û tomarkirinê xebata herî berfireh di salên 1850î de ji aliyê Mele Mehmûdê Bazîdî (1797-1867) hatiye kirin. Wî di gelek beşên folklorê kurdî de berhem dane. Du pirtûkên wî yên bi navên ‘*Adat û Rusûmatnameê Ekradiyye û Cami’eya Rîsaleyan û Hikayetan bi Zimanê Kurmancî*’ ji bo folklorê kurdî berhemên giranbiha ne. ‘*Adat û Rusûmatnameyê Ekradiyye*, xebateke civaknasî, etnografî û folklorî ye. Ji rabûnê rûniştinê heta awayên zewacê, ji baweriyên gelêrî heta navên jin û mêrên kurdan, ji taybetmendiyên cilûbergên kurdewarî heta xwarin û vexwarinan, der barê çand û civaka kurdan de agahî hatine dayîn. *Cami’eya Rîsale û Hikayetan* li ser edebiyata kurdî ya gelêrî ye. Tê de sê maqale û çil çîrokên gelêrî hene. Ji bilî vê; wî çîroka “Mem û Zîn” wekî pexşankî nivîsiye. Fûad Temo jî di rojnameya Rojî Kurd de çîrokek bi navê Şewêş nivîsandiyê.¹⁰³ Li gor hinek lêkolîner û nivîskarên jî Mele Mehmûdê Bazîdî wek çîroknûsê pêşiyê nayê pejirandin.¹⁰⁴

Di despêka sedsala XX’em de di warê çîroka kurdî de hin kesin din jî derdikeve pêşberî me. Yek ji wan Qedrîcan e, yê din jî Nûreddîn Zaza ye. Ev nivîskarana ne bi tenê çîrok nivîsîne helbest, gotarên siyasî û hwd. jî nivîsandine. Rewşa ku ev nivîskarana tê de bûn rewşeke awarte bû. Li her alî şer û pevçûn hebûn. Lê di vê rewşa xirab de jî ji nîşên ayende re pirr çîrok, helbest, lêkolîn hîştin. Ji bilî van kesana em dikarin bibêjin ku di warê çîrokê de, di piştî nivê sedsala XX’em de wek kesên mîna Mehmed Emin Bozarslan, Zeynelabidin Zinar, Çiya Mazî, Hasan Kaya, Rojbîn Ozkan hwd. hene.¹⁰⁵

Di çîroka kurdî de bi sedan motîf tene bikaranîn, hinek ji wana nûnertiya tenêtiyê, bêkesiyê, belengaziyê; hinek jî nûnertiya xayinî, tarîti, neqencî û hwd. dikin. Ronî War di kovara W’ye da çend mînakên wisa rêz dîke: “*Porkur, Beranê*

¹⁰¹ Ramazan Pertev, *Edebiyata Kurdî ya Gelêrî*, Weş. Avesta, Stenbol, 2015, 249.

¹⁰² Alexandre Jaba, *Çîrokên Kurmancî*, Weşana Çanda Nûjen, Stocholm, 2000, 4-15.

¹⁰³ Pertev, *Edebiyata Kurdî ya Gelêrî*, 250; Fûad Temo, “Çîrok”, *Kovara Rojî Kurd*, Çapa Yekem, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol 2013, 121-122. Bnr. :Kadri Yıldırım- Ramazan Pertev- Mustafa Aslan, *Ji Destpêka Heta Niha Folklorê Kurdî*, Weş. Mardîn Artuklu Üniversitesi, Mardîn 2013, 62.

¹⁰⁴ Serwet Denîz, “Destpêka Çîrokê” *Kovara W*, J. 48, Weşana Enstîtuya Kurdî ya Amedê, Diyarbakır 2013, 64.

¹⁰⁵ Bozkoyun, *b.n.b.*, 142-157.

Reş û Spî, Tîremar, Yek, Sê (Sisê), Heft, Morîka Xewê, Pîra Mirovxwer Hirç, Kund, Şêr, Gur, Hesp û Teyrê Baz.”¹⁰⁶ Di çîrokên kurdî de ji bilî van motîfan bi dehan motîfên din jî wek motîfa evînê, motîfa îmtihanê, motîfa jehrê, motîfa nişana hevaskirinê, motîfa astengê, motîfa pîra qasid û hwd hene.

2.8.5.1. Taybetiyên Çîrokên Kurdî Yên Gelêrî

Diyare ku çîrokên Mele Mehmûd piraniyan wan xasma yê berhema ku mijara me ye raste rast nav civakê da hatine belavkirin û babetên wan rasteqîn û çanda gel in. Ango çîrokên gelêrî ji bo pend û şîretan xwe ra kiriye mijar. Piştî wan agahiyan bi kurtasî hinek taybetiyên çîrokên Kurdî yê gelêrî mirov dikare wisa rezbike:

1. Çîrokên gelêrî dûvedirêj in. Di nav vî cureyî de çîrokên muteselsîl wek dastanan hinekî dirêj in.
2. Çîrokên gelêrî her çi qas pexşan be jî hin beşên wan helbestî ne.
3. Çîrokên gelêrî jî destpêk, bûyer û encamê pêk tên.
4. Çîrokên gelêrî, ji gelek formelan pêk tên û di nav xwe de gelek motîf û sembolan dihewîne.
5. Zimanê çîrokên gelêrî zelal û herikbar e.
6. Çîrokbêj kîjan çîrokê vebêje ev çîrok taybetiyên herêmî û devkî distîne.
7. Her çîrok di nav rêzikên xwe de dîtî û nerînên çîrokbêjên xwe vedişêre.
8. Lehengên çîrokan bi sêhr û du'ayan dibedilîn
9. Çîrokên gelêrî di nav rêzikên xwe de gelek taybetiyên folklara gel dihewîne.
10. Lehengên çîrokên gelêrî bi piranî ji padîşah, mîr, wezîr, mîrzade û keça wezîr pêk hatine.
11. Lehengên çîrokên gelêrî her çi qas mirov bin jî, carinan jî lehengên çîrokan wek perî, pîrebok, ifrît û cin in.

¹⁰⁶ Ronî War, “Şaristani” *Kovara W*, h. 25, Stenbol 2009, 38-42; Bozkoyun, *b.n.b.*, 142-157.

12. Di çîrokan de her dem sê keçik yan jî sê kurên padîşah hene û her dem biçûkên keç û kuran digihîjin miradê xwe û dibin padîşah û şahbanû.¹⁰⁷

13. Di çîrokên gelêrî de lehengên çîrokê keç û xort bi hevdiatina cara ewil dilketî dibin, hin çîrok jî bi nifir û bihîstina navê leheng dildar dibin.¹⁰⁸

14. Lehengên çîrokan ji bo xwe îspat bike ji aliyê padîşah ve tê azmûn kirin, bi gelemperî lehengên çîrokê di azmûnê de serkeftî dibin. Dawiya azmûnê leheng ya tê xelat kirin yan jî bi keça padîşah ango bi keça wezîr re dizewice.

15. Çîrokên gelêrî fewqulade ne û lehengên çîrokê xwedî-taybetiyên awarte ne, di van çîrokên awarte de lehengên çîrokan ejderhayekî dikujin, li ser piştê Teyrê Enqa diçe pişt çiyayê Qafê û hwd.¹⁰⁹

16. Di çîrokên gelêrî yê fewqulade de lehengên çîrokan, bi alîkariya pîrekê yan jî rihspiyekî digihîjin armanca xwe.

17. Di çîrokên gelêrî de cihên ku bûyer lê diqewimin ne diyar in, lê belê di hin çîrokan de cihên ku bûyer lê diqewimin diyar in. Ev cihên diyar jî wek Çîn-Maçîn yan jî Amed, Cizîr, û hwd. in.

18. Hin çîrok ravekirina gotinên pêşiyên in.¹¹⁰

19. Hemî cûreyên çîrokan bi piranî ji aliyê dayik û dapîran ve ji zarokan re tên vegotin.

20. Dawiya çîrokan her dem bi şahiyên xelas dibe, xerabên ceza kirin, qenc jî tên xelat kirin.¹¹¹

2.8.5.2. Derbarê Çîrokên Mele Mehmûd Da Hinek Agahî

Mele Mehmûdê Bazîdî yê zana û xwedî kesayetîyeke pîralî, di gelek şaxên zimanê Kurdî da xebatên hêja kirine û piranîya van xebatên xwe jî piştî ku Aleksandre Jaba (1801-1894) dinase derxistine holê. Ji ber vê yekê, lêkolerên ku li ser Mele Mehmûdê Bazîdî dixebitin, nabe ku derheqê Aleksandre Jaba yê diplomatê Rûs de jî tiştinan nebêjin. Lewra A. Jaba, hema bêje di hemû xebatên Mele

¹⁰⁷ Ekinci, *b.n.b.*, 20-58.

¹⁰⁸ Bozarlan, *b.n.r.*, 51-116.

¹⁰⁹ Bozarlan, *b.n.r.*, 5-207

¹¹⁰ Bozarlan, *b.n.r.*, 5-50.

¹¹¹ Îzeddîn Mustefa Resûl, *Mêjûy Edebî Kurdî*, Weşanên Honrewy, Silêmanî, 2012; Ekinci, *b.n.b.*, 20-29.

Mehmûdê Bazîdî de rê li ber wî vekiriye. Li gel vê yekê, di gelek xebatên bi vî awayî yên A. Jaba de jî yekser û neyekser tevkarîya Bazîdî heye. Îro çêtir dîyar dibe ku bi hevkarîya van her du kesan, ji bo çand, edebîyat, dîrok û hwd. a Kurdan berhemên giranbuha û ronîker derketine holê.

Çîrokên Mele Mehmûd Bazîdî du beşan pêk tên. Beşek ji çîrokên di berhema wî ya bi navê “*Cami’eya Risaleyan û Hikayetan*” de derbas dibinin û li ser edebiyata kurdî ya gelêrî ye. Di vê berhemê da sê maqale û çil çîrokên gelêrî hene. Ev çîrokên di vê berhemê da qedera 40 çîrokanin û Mele Mehmûd raste rast di nav miletê xwe da yên qewimîne tomar kirine.

Beşa din jî, “*Koleksiyona Aleksandre Jaba Ya Destnivîsên Kurdî*” de du nusxe hene. Nusxeyên bi hejmara Kurd 42 û Kurd 43 wergera 84 çîrokên Farsî bo Kurmancî dane ku di her du nusxeyan de jî ji bo berhemê tu nav nehatîye destnîşankirin

Berhema hêja ya “*Cami’eya Risaleyan û Hikayetan*” ji çil çîrokên Mele Mehmûdê Bazîdî yên ku xwe nivîsandine pêk tê. Ev çîrokan yek ji wan bi dehan berhemên wî ye. Em dixwazin di vê kurte agahdariyê de gelek bi kurtî di derbarê wan û naveroka wan çil hikayetan de hinek agahdariyê bidin xwandevan û lêkoleran.

Ev çil hikayetên han ên ji aliyê Mele Mehmûdê Bazîdî ve hatine nivîsandin, çend libên destpêkî yên di derbarê tamahî û çikosiya Mele û kesên xwenda de hatine nivîsandin ne tê de, piraniya wan behsa bûyerên ku di dîroka me de qewimî ne dikin. Ji ber ku lêkoler û xwendevan jî di dema xwendinê de bibînin, tarîxa wan serpihatiyan, navê ew cihên ku ew bûyer qewimîne -bajar, gund û navçe- û navê wan kesên ku di piraniya van hikayetan de derbas dibin hemî yên rasteqînî ne.

Dema ku ev berhem bi awayekî aqademîk bê wergerandin û xwendin, yê bê dîtîna ku hemî ev hikayet bûyerên dîrokî û civakî yên neteweyê Kurd in. Her yek bi serê xwe ji bo civaknas û dîroknasan xwediyê qîmetekî mezin in û dikarin hinek valahiyên di van waran de tijî bikin.

Ev hikayetên Bazîdî ji ber nusxeya Rodenko li ser kar kiriye transkripte yê alfabeya latînî bûye. Her çend sedûpênceh sal beriya niha jî hatibe nivîsandin, lê cardin îro jî bêyî mirov dest lê bide, ji aliyê nivîsa niha ve jî bi awakî êsan tê fehimkirin.

Dîsan, berhemeke Bazîdî ya din jî heye, ku ew jî di qada gelêrî de ye. “*Koleksiyona Aleksandre Jaba Ya Destnivîsên Kurdî*” ye. Gelek berheme wî yêncur bicur hene.

Yek ji van berhemên jî di qada wergernasîya Kurdî de ye. Di “*Koleksiyona Aleksandre Jaba Ya Destnivîsên Kurdî*” de du nusxeyên heman berheme hene. Nusxeyên bi hejmara Kurd 42 û Kurd 43 wergera 84 çîrokên Farsî bo Kurmancî dihewîne, ku di her du nusxeyan de jî ji bo berheme tu nav nehatîye destnîşankirin.

Çîrokên ku di vê berheme de cî digirin, ji aliyê naverokê ve çîrokên pendgirtinê ne; lewra ne dirêj in, kurt in û tecrîbe û hîkmeta gel ya hevpar tînin cih. Her wiha ev çîrokana ji aliyê avanîya xwe ve jî kurteçîrokên klasîk in û wekî çîrokên *Mesnewî* ya Mewlana û *Mentiqu't-Teyr* a Ferîduddîn 'Ettar li gorî rêçikên edebîyata klasîk hatine nivîsandin.

Li gorî agahî û çavkanîyên dîyar û berdest, di edebîyata Kurdî de, çî telif û çî werger, berî vê berheme tu daneyeke çîrokên klasîk ên pexşan (mensûr) ne hatine amedê kirin. Ev berheme ji vî aliyê ve wekî berhema yekemîn tê xuyanê. Her çiqas çîrokên “*Mele Mûsayê Hekarî*” yênc sed sala hivedhem hebin jî, ev çîrokana li ser qada gelêrî tînc hesabandin. “*Lê belê em ji arşîva Aleksandr Jaba dizanin ku Mele Mûsayê Hekarî hînc di sed sala XVII. de zêdetirî 50 çîrokên kurdî yênc gelêrî berhev kirine û ew bi navê “*Durru'l-Mecalis*” wekî pexşankî nivîsîne.*”¹¹²

Mele Mehmûdê Bazîdî wekî zanyarekî Kurd, xwedîyê ked û berhemen girîng in di gelek qadên ji hev cuda de. Bazîdî di berhevkarîya folklorê, istînsaxa destxetên Kurdî, nivîskarîya berhemen cûrbicûr, rêzîmannasî, civaknasî û hwd de gelek xebat pêk anîne. Qadeke din ya ku Bazîdî bi wê re mijûldar bûye jî wergernasî ye.

Di Koleksiyona Aleksandre Jaba de destnivîsa bi hejmara Kurd 43'yê ji 84 çîrokên Farsî û wergerên wan ênc Kurmancî û Fransî pêk tê. Wergerên Kurmancî ji aliyê Mele Mehmûdê Bazîdî ve û yênc Fransî jî ji aliyê A. Jaba ve hatine kirin. Ev çîrokên ku dikarin li ser qada edebiyata klasîk bînc hesabandin, li gorî agahîyên berdest, nimûneyên ewil ênc çîroka pexşan a Kurdî ya klasîk in.

Em ji vir fehm dikin ku Bazîdî hevçerxê Mîr Bedirxan e û him li Kurdistanê him jî li ber çavê dewleta Osmanî alimekî gelek biqîmet û qedirbilind bûye.¹¹³

¹¹² Bilge, *b.n.b.*, 45-65 ; Güzel, *b.n.b.*, 45-60; Öztürk, *b.n.b.*, 34-36 .

¹¹³ Güzel, *b.n.b.*, 45-60; Öztürk, *b.n.b.*, 34-36 ;Bilge, *b.n.b.*, 45-65 .

Beşa duyê “Çîrokên Werger Yên Mele Mehmûdê Bazîdî” da qedera 84 çîrok bi zimanê Farsî wergerandine zimanê Kurdî. Lê belê pêwîste em despekê da hinek agahî derbarê wan çîrokan û “*Destnivîsa Kurd 43’yê*” bidin ku mijar ware zela kirin.

Destnivîsa Kurd 43 bi tevahî 102 wereq e. Wiha xuya ye ku destnivîs di hundurê zerkê de hatine parastin û li ser ruyê zerkê jî bi destxeta A. Jaba bi Fransî du hevok hatine nivîsandin: “*84 Contes persans tradues en Kurde par Mella Mahmoud Bazidi. Traductions française avec les textes persans et Turc en regard par Auguste Jaba*”¹¹⁴

Di hevoka duyem de behsa metneke Tirkî jî hatîye kirin lê tu metneke Tirkî di naveroka vê destnivîsê de tune ye. Her wiha agahîyên nêzîkî vana di pêşiyê de di wereqeya 1a’yê de jî hene. Tenê cudahîyek heye ku A. Jaba li vir unwan, cî û dîroka destnivîsê jî nîşan daye: “*Consul de Russie en retraite. Smyrne 1868,3*”

Ji bo vê berhemê li tu cîyê nusxeyê nav an sernav nehatîye destnîşankirin. Gelo Bazîdî van çîrokana jî berhemeke Farsî wergirtîye yan jî ji xwe re ji edebîyata Farsî berhovoka çîrokan dirust kiriye, ev yek ne kifş e. Digel vê yekê, her çiqas navek jî bo berhemê nehatibe destnîşankirin jî, çîrokên berhemê ji 1’ê heta 84’ê hatîye hejmarkirin.

Berhem ji 84 çîrokên Farsî pêk tê. Ev çîrokana berê bi halê orîjînal yanî bi Farsî hatine nivîsandin. Bazîdî wergera van çîrokan a Kurmancî nivîsandîye û pişt re A. Jaba jî li kêleka wergera Kurmancî tîpguhêzîya wan a Latînî nivîsandîye.

Her wiha A. Jaba wergera Fransî jî li kêleka metnê Farsî nivîsandîye. Li gorî vî halî, her rûpel wekî du sitûnan hatîye bikaranîn. Di rûpelên rastê de (wereqên b’yê) wergera Bazîdî ya Kurmancî û tîpguhêzîya A. Jaba li nik hev cî digirin. Di rûpelên çepê (wereqên a’yê) de jî metnê Farsî û wergera A. Jaba ya Fransî li nikhev in.¹¹⁵

Ji xeynî agahîyên navborî, derbarê destnivîsê de hin taybetîyên nusxeyê wekî din jî hene. Destnivîs bê berg e, wekî berê jî hate gotin, wereqên destnivîsê di hundurê zerkê de hatine parastin. Di nusxeyê de kaxezên zer û asayî hatîne bikaranîn. Li jora wereqan bi Erebi, li jêra wereqan bi latînî hejmarên rûpelan hene. Her rûpel bi 13 xêzan hatine xêzkin. Ebada nusxeyê 23x33 cm. ye. Metna orîjînal û wergera Bazîdî yanî beşên ku bi herfên Erebi hatine istînsexkirin bi xeta ruq’eyê ne.

¹¹⁴ Bilge, *b.n.b.*, 45-65 ; Güzel, *b.n.b.*,45-60; Öztürk, *b.n.b.*, 34-36 .

¹¹⁵ Bilge, *b.n.b.*, 47-65.

Ji şibihandina wan tê famkirin ku ji bilî wergera Kurmancî metnê Farsî jî bi destxeta Bazîdî ye.¹¹⁶



¹¹⁶ Bazîdî, *Cami'eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 59-133.

3. DI 40 ÇÎROKÊN MELE MEHMÛDÊ BAZÎDÎ DA KESAYETÊN DÎROKÎ

Leheng û kesayetên dîrokî yê di 40 hîkayetên Mele Mehmûdê Bazîdî da curbicurin. Çîrokên Mele Mehmûd da zêdetir numuneyên rasteqîn derbasdibin. Lewra dema ku amedakirina vê xebate da hat dîtin ku Mele Mehmûd di bajar û herêmên Kurd lê dijîn da kesayetên curbicur wek qehremanê çîrokên xwe wergirtine. Piraniya wan lehengên ku bi layê nivîskar hatine hilbijartin jî pîrengî, pîralî û berfireh bûna coxrafya ya ku Kurdan lê dijîn jî dide nîşandan. Dîsan Mele Mehmûd digel kesayetên dîrokî beşeka zêde jî erdnîgariya Kurdan jî dide nasîn.

Dema ku ev berhem bi awayekî akademîk bê wergerandin û xwendin, yê bê dîtin ku hemî ev çîrok bûyerên dîrokî û civakî yên neteweyê Kurd in. Her yek bi serê xwe ji bo civaknas û dîroknasan xwediyê qîmetekî mezin in û dikarin hinek valahiyên di van waran de tijî bikin.

Mirow dikare wan qehremanên dîrokî yên ku di çîrokên Mele Mehmûd da hatine wergirtin leqebên û mexlesên wan bi wî awayî bihonîne.

* Mîr, Beg, Begzadê, Axa, Paşa, Sultan, Walî, Wezîr, Şêx, Şexûlîslam, Mele, Îmam, Muezzin, û hwd.

* Xulam, Hemal, Şivan, Gavan, Qehweçî, Xizmetkar, Çotyar û hwd.

* Jin, Pîrejin, Keç, Xanim, Afret, Xatun û hwd.

* Misliman, Feqî, Derweş, Êzîdî, Mexînî (Nastûrî), Êrîs (geyrî Mislîm), Ermen, Rûs, Ebasî, Filê û hwd.¹¹⁷

* Rojhilatnas, Gerîde û hwd.

* Diz, Kehya, Kerwancî, Aşewan, Talancî, Cerdê, Rêgir, Yenîçerî, Londbaşi, û hwd.

¹¹⁷ Mele Mehmûdê Bazîdî di derheqê fileyan wiha dibêje: “*Li Kurdistanê degera 70 hezar malên re’ayên ermen, 15 hezar malên nestûriyan (asûriyan) û 200 malên cihûyan (yahûdî) hene. Reiye û ermen li Kurdistanê di her tiştî de mîna kurdan e, tu ferq di neqeba wan de nîn e. Piraniya wan bi kurdî dipeyîvin. Jin û zarok tenê bi kurdî dipeyîvin û tu zimanekî din nizanin. Adet û sincên wan mîna yên kurdan e. Berevajî welatên musulmanan yên mayî, jin ji civatên mêran narevin. Di cejn û dawetan de jinên re’yî yên musulmanan bi hev re destên mêran digrin û tev de govendê digerin. Kurd û ermen dibin kirivên hev. Ew bi hev re baş dijîn û zorê li hev nakin, mîna li hin êrdimên din diqewime. Hêjayî gotinê ye, ku re’ayên Kurdistanê jî vexwarina araqê, qumarê û qehbetiyê nizanin. Re’aye çekdar in û gava diqewime bi musulmanan re şer dikin. Wan bi mêrxwasiya xwe gelekî deng dane. Nestorî bi mêrxwasiya xwe li pêş kurdan e jî. Zimanê pê dipeyîvin, zimanekî cuda ye, serbixwe ye. Belê bi erebî dixwînin û dinivîsinin û alîfbeya erebî bikar tînin. (Bnr.: Neqîla ji pêşgotina pirtûka Y. Y. Vasilîva ya “*Kitêba Wenda Ya Dîroka Kurdistanê*”, Ziya Avci, “*Mele Mehmûdê Bazîdî (1799-1867)*”, *Kovara Bîr*, Hejmar: 10 <http://www.kovarabicom/> 14 Mijdar 2018; Bazîdî, *Cami’eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 59-133*

* ‘Eşîr, Tawaîf, Êl, Kom û hwd.

*’Erebîstan, Ermenîstan, Rusistan, Şam, Kurdîstan, Stenbol, Îran, Tebrîz û Merax hwd.

Ev çil çîrokên ji aliyê Mele Mehmûdê Bazîdî ve hatine nivîsandin, çend libên destpêkê di derbarê tamahî û çikosiya Mele û kesên xwenda de hatine nivîsandin ne tê de, piraniya wan çîrokan behsa bûyerên ku di dîroka Kurdan da qewimî ne dikin. Ji ber ku lêkoler û xwendevan jî di dema xwendinê de bibînin, tarîxa wan serpihatiyan, navê ew cihên ku ew bûyer tê da qewimîne mîna bajar, gund û navçe û navê wan kesên ku di piraniya wan çîrokan da derbas dibin hemû yê rasteqînin.

Dema ku em van çîrokan bi awakî berfireh tesnîf bikin, ev tabloya derdikeve pêşberî me: Çîrokên 1-4an, di derbarê tamahiya malê dinê û çikosiya Mele û xwendevanan yê di nav xelkê de tèn gotin de ne. Çîrokên 5, 6, 9, 10, 14, 15, 16, 20, 21, 27, 32, 34, 38 û 39an, raste rast bûyerên dîrokî yê li welat qewimî ne.

Dîsan wekî nimûne çend ji wan çîrokan di derbarê bûyerên dîrokî yê di nav kurdan da qewimîne, wiha ne: Çîroka 9an, mesela bûyera di navbera Şêxî Begê mirê Miksê yê mamê Xan Mehmûd û Xan Evdal û birêvebira Kela Şaxê Adîle Xanimê de qewimî ye da ye. Çîroka 12an, di derbarê serpehatiyeke evîniyê ku li Kurdistanê gelek belav e de ye, yanî li ser evîniya Hesên Axa û Lalîxana Goveyî de ye. Ya 13an, bi varyant û naveke cihê, di derbarê serpehatiya bûyera evîniyê ya Siyabend û Xecê¹¹⁸ de ye. Çîroka 15an, di derbarê bûyera di navbera mala Elaeddîn Begê hakimê Rojkan Şêx Ehmedê Çiplaq û Îsmail Begê hakimê Elcewazê¹¹⁹ de ye. Çîroka 16an, cardin di derbarê bûyera di navbera Şêx Ehmed Paşa û Selîm Paşayê Rojkî de ne. Çîroka 21an, di derbarê kuştina Şekir Axayê mezinê Eşîreta Giraviyan a girêdayî federasyona Hertuşîyan de ye. Ev Şekir Axa di nav xelkê de bi navê Şekir Axayê Mezin jî tê naskirin. Wisan dixuyê ew yan bapîrê Ebubekir Axayê Giravî yan jî bapîrê bavê Ebubekir Axa be. Çîroka 34an, di derbarê bûyera tiltezin û xwînavî ya destana Kela Dimdimê¹²⁰ de ye. Çîroka 38an jî, di derbarê serpehatiya gerokekî fransîz ê navê wî Pierre-Amedee Jaubert a di sala 1804an de li Bazîdê qewimiye de ye. Belê, li vir lib lib li ser sekinandina hemî hikayetan ne mimkun e.¹²¹

¹¹⁸ Ordîxan û Celîlê Celîl, *Zargotina Kurda*, I-II, Weşanên Aram, Amed, I, 2013, 104-134.

¹¹⁹ Elcewaz (Adilcevaz): Navçeyeka gîredayî bajara Bidlîse ye.

¹²⁰ Kela Dimdimê îro di nava sînorê Turkîya - Îranê de li herêma Mergeverê ye. (Jan Dost, *Kela Dimdimê*, Stenbol, Weşanxana Avesta, 2011, 6.)

¹²¹ Bilge, *b.n.b.*, 45-65 ; Güzel, *b.n.b.*, 45-60; Öztürk, *b.n.b.*, 34-36 .

Çîrokên din jî, di derbarê bûyerên civakî yên di nav gel de yên wekî diziya dêran, şelandin, kuştinên li ser meseleya namûsê û yên wekî wan de ne, ku dixuyê piraniya wan rast bin, di nav xelkê de hatibin qîsekirin û Mele Mehmûd jî ew berhev kiribin û nivîsandibin.

3.1. Şiroveya Çîroka Yekê

Di vê çîroka yekemîn, wek çîrokên despêkê 1-4 rê da kesayetê Mele¹²² û du kesên cahil tê bahskirin û bi layê nivîskar ve keseyatiya “Mele” û kesên nexwande hatine hilbijartin. Di nav civakê da rêz û qedrê Mela tê girtin wek zana, rewşenbîr û rênîşanderê civakê.

Şîret û penda çîroka yekê, di derbarê tamahiya kesên xwandê û Meleyan a ji bo malê dinê û menfe’etperestî û ezûezîtî ya wan daye pêş bala mirovan. Mele Mehmûd jî vê rastiyê çîrokê da wisa amaje dike: “*Qisim xwendî û Mele di nêv ekradan, bi tame’e e xesetî meşhur in. Sê pîst girtîye hêj razî nîne, teme’a pîstê dinê jî diket.*” Ev hevok “*Meleyî sê pîst girtine dîsanê bi wan qenaet nake, gazî hewalan dike ku welleh behra min di wî pîstî da jî heye.*”¹²³ Nivîskar amaje dike ku Mele para xwe ne razîye. Mabesta vê hikayetê da tame’ û xesûdîya û mêtewandariya Mele û kesên xwande amaje dibe.¹²⁴

Di nav vê çîrokê da kesayetiyên dîrokî:

- 1- Melayên çavbirsî û tema’kar.
- 2- Du kesên cahil, nexwandê û nefahm.

3.2. Şiroveya Çîroka Duyê

Di vê çîrokê da kesayetên wek Ekrad,¹²⁵ Pêxember, Cebrail, Firîşte derbas dibin. Di vê hikayetê da buyer û ‘ecayîbên dema miraca pexember (s.x.l) û pirsiyarkirina Cebrail tê bahskirin. Mebesta vê hikayetê di vê hevokê da “*Xwandê û*

¹²² Mele: Di medreseyan Kurdan da asteka xwandinêye ku kesên zana ra tê gotin.

¹²³ Bazîdî, *Cami’eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 52.

¹²⁴ Bazîdî, *Cami’eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 59-133.

¹²⁵ Ekrad: Di zimanê ‘Erebî da bi wateya peyva Kurdan ci tîne.

Meleyên hemû miletan ekserî kêm ihsan û kêm ikram dibin, lewra ew dixwezin xelq ikram û ihsan li wan bikin, lakin bi xwe tiştêkê nadine jaran”¹²⁶ tê amaje kirin.¹²⁷

Ev hîkayeta dudan, heqîqeta Miraca Pêxember û hevdiîna Cebrail e. Nivîskar şîreta wan pirsîyaran wisa şîrove dike: *Pêxember eleyhisselam, melekêkê mezin dît ku dehulkê zêde cisim di estû da ye û çomaxekê mezin di destî da ye, weha muntezer westa ye. Pêxember eleyhisselam, pirsiyar kirin ku evîne çi ne û tu memurê çi şulê yî? Ewî melekî cewab dayê ku ya resulûllah ez mamur im ku eger mirofek ji tayfa xwendeyan ihsan û sedeqeyekê bikin, weyaxo te'am û zadekê bidene feqîrekê, ez dê çomaxekê li vê dehulê bidem ku ev ihsan û sedeqeya wî xwendeyeyî me'lumê Meleyeket semawatan bibeyin. Îcarê pêxember eleyhisselam, ji wî melekî sewal kirin ku hindê ku tu hatî mamur kirin te qet çend caran li vê dehulê daye? Melekê cewab daye ku hete niha ez muntezer im, lakin min qet li duhulê nedaye, paşê niha jî êdî Xwedê bizanê.*”¹²⁸

Di nav vê çîrokê da kesayetiyên dîrokî:

- 1- Pêxember, Cebrail, Firîşte çîrokê da dema mîraca pêxember da rol girtine.
- 2- Mela û kesên çavbirsî û tema'kar.

3.3. Şiroveya Çîroka Sêyê

Di vê çîrokê da kesayetên wek Mele, Mele Bazîd, Meleyekê Kurdistanê¹²⁹ û Jina Mele Bazîdî bi layê nivîskar va wek qehreman û serol hatine hilbijartin. Mebesta vê hîkayetê di vê hevokê da “*Şîret li xelqê kirine li nefsa xwe nekirine*” tê amaje kirin. Ev hîkayeta sêyê ya ku behsa sadeqeyan ji bo belengazan, şîretên ji bo civakê ne nefsa xwe dike. Nivîskar nesîheta xwe di ve hevokê da wisa amaje dike: “*Meleyî weko ev xebera ji jinê seh kirî, xwe sil kir û got ku keçê min şîret li xelqê dikirin li nefsa xwe nedikirin. Min wesanê we'ez kirin ku xelq cilêd xwe yê zêde û nanê bidene min, ne webû ku tu rabî cilêd berşûya min û nanê zarokan bideyî xelqê. Mirada min dayîna nasan bû, te înaye ev şîreta ji boyê xelqê derheqê min îcra kiriye.*”¹³⁰

¹²⁶ Bazîdî, *Cami'eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 52.

¹²⁷ Bazîdî, *Cami'eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 59-133.

¹²⁸ Bazîdî, *Cami'eya Rîsaleyan û Hikayetan*, 59.

¹²⁹ Welatê ku miletê Kurd lê dijîn ra tê gotin.

¹³⁰ Bazîdî, *Cami'eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 60-61.

Di nav vê çîrokê da kesayetiyên dîrokî:

- 1- Mela Bazîdî yê ku şîret millet dikirin lê nefsa xwe nedikir.
- 2- Jina Mela Bazîdî ya xweşbawer, heqîqet parêz û dîndar.

3.4. Şiroveya Çîroka Çarê

Nivîskar di vê çîrokê da kesayetên wek Mîrzo yê Reş, Memedê Selmasî¹³¹ û tayfeyên Êzîdiyên Wanê hilbijartine. Mebesta vê hikayetê “*Memed dibêje, eman Mîrzo, min kiriye tu meke*”¹³² li vê hevokê tê amaje kirin ku dizî û îxanet encamekê nebaş va dawî dibe. Ango çîroka çaran di derbarê rêbirîya di Kurdistanê de û encamên wê yên di civatê de ne û Mîrzo yê Reş di hikayetê da encama xapandinê, îxanet kirinê, çetegerî û karên kirêt wisa distîne, dibêje: “*Îcarê min şevêkê çil siwarêd reş pev xistî, ez bûme beled û min înyayê kenarê Salmasê. Nivê şevê dor avahî, em ji hespan peya bûyin û deh mirof li nik hespan mayî, min sî mirof înyayê dora mala Memedî. Ez bi mala wî beled bûm. Ji kulekê peya bûm û min derî vekirî, em çûyine nêva malê û min Memed û jin û zarok girtin. Memed dibêje, eman Mîrzo, min kiriye tu meke, eman herçî ku mal heye bibe, min nekuje. Min guhdarî nekirî, serê Memedî jêkirî û herçî mal û eşya hebûn talan kirî, înyayî bi şûve hatin. Min ji boyê heyfa Memedî ew mala û talan li wan siwaran parîvekirin, da heyfa min ji boyê Memedî nemîne.*”¹³³

Di nav vê çîrokê da kesayetiyên dîrokî:

- 1- Mîrzo yê Reş ê qewî diz û heramzade.
- 2- Memedê Selmasî yê digel Mîrzo diz û çeteger.
- 3- Êzîdiyên Wanê¹³⁴

¹³¹ Selmas bajareka gewreye ku dikevê rojhilatê welat.

¹³² Bazîdî, *Cami'eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 52.

¹³³ Bazîdî, *Cami'eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 63.

¹³⁴ Êzîdî: “*Di nav Kurdan de kurdên êzîdî jî hene. Şeytên diparêzin, ew rojiyê zanin, ne nimêjê, vexwarina areqiyê cem wan ne heram e, loma çî gava lê tê vedixwin. Lê sunet kirin cem wan heye, bi mîrxasiya xwe li pêş kurdên mayî ne. Zimanê wan kurdî ye, tu ferqa wî tune ye. Êzîdî tenê bi ola xwe ferq dikin. Cem êzîdîyan qewal û pîr û şêx hene, lê kesê jî wan nizane bixwîne, ne binivîsîne. Ne cara pirtûkên wan hebûne û ne jî nivîsandina wan hebûye, wesîteya wan a dan û sitanadinê tenê zimanê devkî ye. Dibêjin êzîdî jî reha Yezîd Îbn Merwan in, ewê ku nifira malbata Muhemmed -aştiya Xwedê lê be- jî ber kuştina Huseyin, lê ketiye. Kuştina mirovê êzîdî cem kurdan ne guneh e û her carê gava rê dikevê kurdên misilman, êzîdîyan dikujin û jinên wan jî xwe re dikin carî. Ew jî dikanên qesabî yên êzîdîyan goşt nakirin, çimkî êzîdîyan murted dihesibînin. Di nava êzîdî û Meleyên misilmanan de şerekî oldarî digere û her yek jî wan li fersendekê digere yê din bikuje.*” Bnr: Mele Mehmûdê Bazîdî di berhemên xwe de êzîdîyan wiha dide naskirin.

4- Mirowê di nav bera Mîrzo û Memed da qasid.

3.5. Şiroveya Çîroka Pênçê

Di vê çîrokê da kesayetên wek walîyê Erziromê Kor Yusif Paşa,¹³⁵ mîrê Xunusê yê qedîm Mihemed Beg,¹³⁶ Welî Paşa firarîyê ji tayfa Lezkiyan ji Daxistanê,¹³⁷ Behramê tayfa Lezkiyan mirovekî xweyê cur'et û jin û xweşka Mihemed Beg bi layê nivîskar va hatine hilbijartin. Mebesta vê hîkayetê “*xîyanet, kursî û desthilatdarî li ser mîrektîyên Kurda*” li vê hevok tê amaje kirin ku dawîya xîyanetê bi jîyana xwe destdayînê ve dawî dibe.

Mihemed Begê ku mîrê Xunisê, ji hêla waliyê Erziromê Kor Yusuf Paşa ve ji welatê xwe bi malbatî tê derxistin. Kor Yusuf Paşa şûna Mihemed Begê Welî Paşa dike mîr. Lê her dem Welî Paşa bi şik û gûmane ku waliyê Erziromê wî ezl bike û dîsa Mihemed Begê bîne dewsa wî. Êdî ev tirs û şika Welî Paşa mijara sereke ya vê çîrokê ye. Welî Paşa ji bo ji vê tirsê xelas bibe zilamekî xwe yê bi navê Behram bi pere û hespekî temîn dike û peywir didê ku Mihemed Begê bikuje.

Behram berî suîqastê tê li xanekê dimîne. Çend rojan mala Mihemed Begê derdor reçav dike, dibe êvar Behram çek û silehên xwe girê dide. Nîve şevê dikeve mala Mihemed Begê. Lê xweha Mihemed Begê xebera hatina Behram dibihîze, diçe Mihemed Begê hişyar dike. Bi hişyarbûnê re jî ji mirinê xelas dibe. Bi xencerê arbede di nava wan de çêdibe û Mihemed beg bi ser dikeve. Behram birîndar dike bi vî awayî ji mirinê difilite.¹³⁸

Di nav vê çîrokê da kesayetiyên dîrokî:

- 1- Mihemed Begê ku mîrê Xunisê
- 2- Kor Yusif Paşayê Walîya Erziromê
- 3- Welî Paşayê ji tayfa Lezkiyan ji Daxistanê
- 4- Behramê tayfa Lezkiyan mirovekî xweyê cur'et û dest û qamet.
- 5- Xweşka Mihemed Bege ya hişyar û zîrek.

¹³⁵ Kor Yusuf Paşa: Di serdema Osmanîyan da waliyê bajara Erziromê bû.

¹³⁶ Mihemed Beg: Di serdema mîrektîyên Kurda da mîrê Xunisê ku îro navçeya bajara Erziromê bû.

¹³⁷ Welî Paşayê ji tayfa Lezkiyan ji Daxistanê ye ku îro welatekî Qefqasîyaye ye. Bingehîya wê welatî digehêje Medan. Lezkî jî li gor hinek nêrîna milte Lazî ku eslê wan Medî.

¹³⁸ Bilge, *b.n.b.*, 53; Bazîdî, *Cami'eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 59-133.

3.6. Şiroveya Çîroka Şeşê

Di vê çîrokê da kesayetên wek Îbrahîm Paşayê mîrê hukumeta Bazîdê¹³⁹ û Delî Îsmâîl Axayê pîr û heftê salîyê dewlet duşkunî û jin û kurê Îsmâîl axa wek qehreman tên bahskirin. Mebesta vê hîkayetê di vê hevokê da “*Tayîfeyêd ekrad wehe bê aqil in, dumahiya şûlê mulahaze nakin, herçi bête eqlê wan illa dikin. Mêr bin û jin û zarok û xema wan da nînin.*”¹⁴⁰ tê amaje kirin ku dawîya xîyanetê bi jîyan û perîşanîya xwe destdayîne ku lewra herçi bête eqlê wan di nav mizgeftê da jî be vi karî dikin.¹⁴¹

Çîroka şeşan jî wek ya pêncê, rola pere, bertîl û tamatîyê ya di mejî û hindurê însanê de nîşan didin ku aqibeta Îbrahîm Paşa û malbata wî wisa dibe. Di çîrokê da wisa tê amajekirin: “*Leşê wî sotin û Îbrahîm Paşa jî birîndar bûyî. Miqdarê du mehan mu’alîce kirin sax bûyî. Ew jin û kurê wî jî ji bajêrê surgun kirin û du-sê pismamêd wî hebûn, bi xeyr heq girtin û kuştin û mal û xaniyêd wan xerab kirîn.*”¹⁴²

Di nav vê çîrokê da kesayetiyên dîrokî:

- 1- Îbrahîm Paşa mîrê hukumeta Bazîdê yê çak û qeç
- 2- Delî Îsmâîl Axayê ku çavbirçî û bertîlhaz
- 3- Jin û kurê Îsmâîl axa yên me’sum

3.7. Şiroveya Çîroka Heftê

Di vê çîrokê da kesayetên wek tayfeyên êzidiyên Kurdistanê û qisim mele û feqehan, pîra êzîdîyan, Mele Mihemedê Qulpî û mirovekî li tayfeya Heyderî¹⁴³ bi navê Mihemed tên bahskirin. Mebesta vê hîkayetê têkoşîn û nîkaşên olî yên navbera Kurdên, Ezîdî û mislimanan hatine çêkirin. Ewan jî dibine sedema bêîtîfaqî û belav buna Kurdan. Tayîfeyên Kurdan wiha bê aqilin, dumahiya şûlê mulahaze nakin, herçi bête eqlê wan îla dikin. Bi sedemên qelp yên neyaran hevdû dukujîn.¹⁴⁴

¹³⁹ Bazîd (Serhed): Ev cî bajara mezin ya mîrekiya Serhedê ye. Îbrahîm Paşa jî mîrê vê hukumeta Bazîdê ye.

¹⁴⁰ Bazîdî, ‘*Adat û Rusûmetnameê Ekradiye*, 36.

¹⁴¹ Bazîdî, *Cami’eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 59-133.

¹⁴² Bazîdî, *Cami’eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 65-66.

¹⁴³ Tayfeya Heyderî ‘eşîreka Kurdane û Mele Mihemedê jî Qulpî ye. Qulp jî navê du bajarane.

¹⁴⁴ Bazîdî, *Cami’eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 59-133.

Bi awayekî din di vê çîrokê da Mele Mehmûd behsa Kurdên ezîdî û misliman dike. Kurd her ser çî baweriyê bin jî dibine şûr û mertalên wê. Lêbelê nebera Kurdan pêwîste pêşberî neyarên wan baş be ku dijmin nikaribe cudahîye û birakûjîye çebike. Digel vê miletê Kurd di layê dîn û bawerîye da dabeşbikin û wanan bipelçiqînin.

Di nav vê çîrokê da kesayetiyên dîrokî:

- 4- Tayfeyên Êzîdîyan û hinek mele û feqîyên Kurdan
- 5- Mele Mihemedê Qulpî
- 6- Mirovekî li tayfeya Heyderî bi navê Mihemed
- 7- Pîra êzîdîyan

3.8. Şiroveya Çîroka Heştê

Di vê çîrokê da kesayetên wek, Poloyê Rûs, qîzeka qewî zêde rind bi navê Barnika Mexîniya¹⁴⁵ du gundên nêzikî Kela Xoşabê,¹⁴⁶ kurekî xweyî mal hal bi navê Şemas yê gundê Qesrê û bavê Barnikê bi layê Mele Mehmûd va hatine hîlbijartinê..

Ango çîroka heştan li ser evîna Polo û Barnika Mexînî (Nastûrî) ye. Ji ber feqîriya Polo û xesîsiya bavê Barnikê her du evîndar nagihêjin hevdu. Bazîdî di vê çîrokê de adetên Nastûriyan û bandora adetên neyînî ya li ser jiyanan bi awayekî trajîk vegotîye.¹⁴⁷ Ev hevoka “*yan ez dê li rûyê dinê xweş bibim, ya dê tu xweş bimîn?*” amaje dike ku ji bo evîniya navbera aşiqan da mal û milkê dinyayê nabe çare. Ciwan ji bo evîniya xwe bê aqil in, dawîya ‘eqîbetê nafikirin, her çî bête eqîlê wan illa dikin. Bi sedemên ciwanî û bêheşî hevdû dukûjin

Bi wateyeka din evîndarî tiştêkî bi deste mirov da nîne. Evîna keç û kuran di nav Kurdan da mêjda bûye pirsgirek ku bavan keç wek zordestî dane kesên cuda cuda. Ev yek jî vê hikayetê da tê amajekirin ku encam bira xwekujî nebe ku dilê keçê xweş bibe. Bila keç erênî bigehêje mirazê xwe.

Di nav vê çîrokê da kesayetiyên dîrokî:

- 1- Poloyê Rûs

¹⁴⁵ Barnika Mexîniya: Mexînî filê anga hristîyanin. Barnik jî navê keçeka fileye.

¹⁴⁶ Kela Xoşabê: Roja me da nêzikî bajara Wanê giredayî navçeya Payîzavaye ku qelaka kevnare cihê mîrektîya Mehmûdîyane.

¹⁴⁷ Bazîdî, *Cami'eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 59-133.

- 2- Qîzeke qewî zêde rind bi navê Barnika Mexînî
- 3- Kurekî xweyî mal hal bi navê Şemas
- 4- Pîra êzîdiyan

3.9. Şiroveya Çîroka Nehê

Di vê çîrokê da kesayetên wek, Begzadeyên Hekaryan Şêxî Beg,¹⁴⁸ Mamê Xan Mehmûd mîrê qeza Miksê,¹⁴⁹ Mîrê Hekariyan Îbrahîm Xan Beg, kurên mamê wî Xan Mehmûd, Xan Ebdal û Xan Ehmed, Xuha Îbrahîm Xan Begê mîrê Hekariyan jina Mîr Şerefê mîrê qeza Şaxê Adile Xanim û kurê Şêxî Beg Mu'tellah Beg bi layê nivîskar hatine hilbijartin. Çîroka nehan, li ser meseleya Şêxî Begê mîrê Miksê û jina Mîr Şeref, Adîle Xanima seroka Kela Şaxê de ye. Mebesta ve hikayetê ev ku daxwaza kursî, berjewêndîyên dinyaye mala mirov xirab dike ku telebazî û fenda jinê bûye sedema kuştina Şêxî Begê mamê Xan Mehmûd mîrê qeza Miksê.

Diyare ku entrikayên (deq û dolap) li dora bidestxistina Kela Şaxê¹⁵⁰ dizivirin, fende jinê û serhişkiya beg û axayan mijara çîroka nehemîn e. Îbrahîm Xan Begê mîrê Hekariyan, ji dexesiya xwe dixwaze Şêxî Begê ku mamê Xan Mahmûd û mîrê Miksê ye bikûje. Lê ew bi xwe cesareta kuştina Şêxî Begê nake. Jibo bi xweha xwe Adîle Xanimê¹⁵¹ ya ku hevsera Mîr Şerefê hakimê qezaya Şaxê bû, alîkarî bixwaze, bi dizî yekî dişîne cem. Ji xweha xwe dixwaze ku, Şêxî Begê vexwîne kelê û li wir bikûje.

Adîle Xanim jî xulamekî herema xwe dişîne cem Şêxî Beg, daxwaza hevdu dîtîne dike û vê mesajê dişîne: *“Ji ber ku zarokên min jî tune ye, ez dixwazim ku Şêxî Beg mar bikim. Ev kela û mal û emlak û mucewher bila bigihêjin wî.”* Şêxî Beg hem ji ber hewesên ciwanî, hem jî ji teme'ya mal û milkan pêşniyara Adîle Xanimê dipêjirîne û digel sed dused mirovan tê kelê.¹⁵²

¹⁴⁸ Şêxî Beg: Mîrek ji Begzadeyên Mîrektîya Hekaryana ne.

¹⁴⁹ Xan Mehmûd: Di serdema mîrektîyên Kurdan da mîrê qeza Miksa (Bahçesaray) îro navçeya bajara Wanê bu.

¹⁵⁰ Îro navçeyeka nezi 50 km dûri bajara Wanêye.

¹⁵¹ Adîle Xanim: Hevsera Mîr Şerefê hakimê qezaya Şaxê (Çatak) îro navçeya bajara Wanê ye.

¹⁵² Evîn, *b.n.b.*, 54; Bazîdî, *Cami'eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 59-133.

Adîle Xanim Şêxî Begê û deh zilamên wî li keleyê dike mêvan, zilamên mayî jî li jêrî kelê dike mêvanê xelkê. Berî wê jî deh zilamên xurt û bi tiving û xençer jî bo kuştina Şêxî Begê tîne kelehê û dike xulamê xwe.

Şêxî Beg digel zilamên xwe tê dibe mêvanê kelê, hêla mêran li dîwanxaneyê rûdine. Kehyayê. heremê şerbet, qawe, buxor û gulav îkram dike û gotinê xanimê digihîne û dibêje: *“Xanim aniha dua dike, ji we re silav dike, û dibêje hun bi ser ser û çavan hatine. Hinekî hêsayî bibin ez ê bi şev Şêxî Begê bixwazim heremê, em ê bi hev re bipeyivin.”*

Ji şev du sê seet dibihure, xanim xeberê dişîne ku were heremxaneyê. Şêxî Beg, zilamên xwe li dîwanxaneyê dihêle û bi tenê tê heremê, li wir deh xulamên bi xencer hildikşin ser Şêxî Begê û wî dikujin. Li cem Şêxî Begê jî xencerek hebû, çend heban birîndar dike, lê li hember deh kesan şansê wî zêde tune ye û dimire. Piştî mirina Şêxî Beg, zilamên wî yên li dîwanxaneyê mabû, digrin û hepis dikin dû re dişînin cem Îbrahîm Xan Beg. Zilamên mêvanê xelkê bûn jî digrin, tazî dikin û berdidin.

Piştî Şêxî Begê li Miksê şîna wî digere. Lawekî wî bi navê Mu'tellah Begê wê demê duwanzde-sêzde salî hebû. Dema ew digihê, diçe heyfa bavê xwe, kelê zevt dike, wan deh zilaman dikûje. Dest bi Adîle Xanimê nade, tenê ji kelehê derdixe, çî mal û eşyayê wê hebin dest datîne ser û wê dişîne ba birayê wê Îbrahîm Xan Begê.¹⁵³

Di nav vê çîrokê da kesayetiyên dîrokî:

- 1- Begzadeyên Hekaryan Şêxî Beg
- 2- Mamê Xan Mehmûd mîrê qeza Miksê
- 3- Mîrê Hekariyan Îbrahîm Xan Beg
- 4- Kurên mamê wî Xan Mehmûd, Xan Ebdal û Xan Ehmed
- 5- Jina Mîr Şerefê mîrê qeza Şaxê Adile Xanim
- 6- Kurê Şêxî Beg Mu'tellah Beg

3.10. Şiroveya Çîroka Dehê

Di vê çîrokê da kesayetên wek, Bazîdê axayekî qewî xweyî i'tibar hebûye bi navê Hesên Begê Mankî, Mehmûd Paşayê Kal yê Bazîdê,¹⁵⁴ mîrê Eleşkîrê Xelîl

¹⁵³ Bilge, *b.n.b.*, 53-54.

¹⁵⁴ Mehmûd Paşayê Kal: Mîrê mîrektiya Bazîdê yê Mehmûdê duyemîne.

Begê¹⁵⁵ kurê Leşko û Leşkoyê Ermen bi layê nivîskar va hatine hilbijartin. Mebesta ve hikayetê eve ku “*Xelîl Beg dibêje ku Hesên Beg eqteda naket ez kurê Leşko me di rojekê da sê caran eteka min ramûsan ji boyê te şerm e*” di vê cumleyê da diyare ku daxwaza kursî, berjewendiyên dinyaye mala mirov xirab dike ku Hesên Begê Mankî xeybên Xelîl Begê kurê Leşkoyê file dike paşan jî, ji bo berjewendî û malê dinyayê diçe deste filekî. Maqam û kursiyên dinyayê bi ‘esl û neseb ve nê dest xistin.

Di vê çîroka de Xelîl Beg ji ber ku pişt re bûye misliman bi helwesteke neyînî ya biçûkdîtîne rû bi rû dimîne. Lehengê çîrokê Leşkoyê Ermenî ye. Ev Leşko diçe Stenbolê û li wir dibe misliman û navê Xelîl Begê distîne. Ji ber zîrekiya xwe dikeve çavê hukumeta navendî ya wê demê, mîrekiya Eleşgîrê digre û tê welatê xwe. Xelîl Begê ji ber ku paşê bûye misilman di nav axa û derdorên de biçûk tê dîtîn. Hesên Begê Mankî, Xelîl Begê wekî hakimê Eleşkîrê naxwaze qebûl bike û vê fikra xwe li cînan bilêv dike. Dema ev gotin tê guhê Xelîl Begê ji bo dersekî bidiyê, di nava rojekê de sê caran destê xwe dide ramûsandin.¹⁵⁶

Di nav vê çîrokê da kesayetiyên dîrokî:

- 1- Hesên Begê Mankî
- 2- Mehmûd Paşayê Kal yê Bazîdê
- 3- Mîrê Eleşkîrê Xelîl Begê
- 4- Leşkoyê Ermenî bavê Xelîl beg

3.11. Şiroveya Çîroka Yanzdeyê

Di vê çîrokê da kesayetên wek, paşayên Bazîdê yên bêmal û perîşan û jinên wan û jinên axa û dewlemendan wek qehreman bi layê Mele Mehmûd hatine bijartin. Mebesta vê hikayetê eve ku “*Paşa dibêje xanimê, ku meznayî ji boyê te bes e, xeml ji boyê wan, meznayî ji boyê te.*” Ev şîret diyar dike ku daxwaza kursî, berjewendiyên dinyaye, cil û bergên xemlandîne û bedew bûn ji bo ‘esl û neseb û camêriye xwe serî xwe têra mirov nakin. Dirust bûn û ewlehî ji bo şexsiyete zêdetir girînge. Makam û kursiyên dinyayê ‘esl, neseb û malê dinyayê nê dest xistin.

¹⁵⁵ Mîrê Eleşkîrê Xelîl Beg: Eleşgir kezayeka gîredayî mîrekiya Bazîdê bû ku Xelîl Beg jî bine filehe li wê de rê bûye mîr. Îro Eleşgir (Zêtkan) binavê navçeyekê gîredayî bajara Agiriyê ye.

¹⁵⁶ Bazîdî, *Cami'eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 45-120 ; Bilge, *b.n.b.*, 58.

Bi wateyeka din pend û şîreta çîroka yanzdehan di birêvebirina dewlet û bajan da, girîngiya memnûnbûna xelkê bi hêmanên çîroka gelerî, hatiye vegotin. Jina paşayî jî her wekî jinên axa û xulaman dixwaze cil û xişrên xweşik ên ne kêmi jinên xelkê li xwe bike. Di çîroka de girîngiya leşker, axa û xulaman a di îdareya dewletê de hatibû vegotin.¹⁵⁷

Di nav vê çîrokê da kesayetiyên dîrokî:

- 1- Paşayên Bazîdê yên bêmal û perîşan
- 2- Jinên paşayên Bazîdê
- 3- Jinên axa û dewlemendan

3.12. Şiroveya Çîroka Duwanzdeyê

Di vê çîrokê da kesayetên wek, axayên herêma Bohtan Hesên Axayê Hesamiyan,¹⁵⁸ Çeleng Axa û keça axayê tayfa Mîran bi navê Lalîxan¹⁵⁹ wek qehremanên çîrokê bi layê nivîskar ve hatine hilbijartin. Şîret û penda vê hikayetê eve ku *“Li ser Hesên Axa û Lalîxanê zaf stiran girêdayine. Meger dilê Lalîxanê jî di Hesên Axayê da hebûye. Lalîxan jî tê mal jehrê dixwe û dimre. Hesên Axa jî kete xurbetê kes nezanî ku kuve çûye û telef bûye”* ev hevok dide nişandan evîna dil bêderman û bêçareye. Lêbelê îxanet û telebazî tu çar serfirazî û serkeftinê nayîne.

Bi awayekê din çîroka duwanzdehan di derbarê bûyera Hesên (Hesem) Axa û Lalîxana Goveyî de ne. Em dizanin ev serpehatîya evîna van herdu kesên navên wan derbas dibin, li seranserê Kurdistanê belav e û tê zanîn. Bi taybetî li herêmên Serhedê ew wekî payîzok tê gotin. Malîkek ji wê bi van rêzan dest pê dike:

*“Deştika Hopê xunav e wa xunav e
Jê diderkevin cotek qazên sitûzirav e
Yekê wî Hesem Axayê min e
Ya dinê Lalîxana bejinzirav e.”*¹⁶⁰

Di nav vê çîrokê da kesayetiyên dîrokî:

- 1- Axayên herêma Bohtan Hesên Axayê Hesamiyan

¹⁵⁷ Bilge, *b.n.b.*, 58; Bazîdî, *Cami'eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 59-133.

¹⁵⁸ Hesên Axayê Hesamiyan: Hesên Axa mîreke mîrektiya herêma Bohtane (Cizîr) ji'êşîra Hemasiyane.

¹⁵⁹ Lalîxan: Keça axayê Bohtan yên ji tayfayên Mîrane.

¹⁶⁰ Bazîdî, *Cami'eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 45-120 ; Bilge, *b.n.b.*, 58.

- 2- Çeleng Axa
- 3- Keça axayê tayfa Mîran bi navê Lalîxan

3.13. Şiroveya Çîroka Sêzdeyê

Di vê çîrokê da kesayetên wek, Tîmûr Paşayê Milî,¹⁶¹ ji tayîfa Silîwanên Diyarbekirê lawekî qewî jêhatî û bi husn û camêr, lakin bê hal û mal, navê Siyahmed,¹⁶² ew law têtin û dibite xulamê Tîmur Paşayê Milî û mudayek di xizmeta Tîmur Paşa da dimîne. Keça qewî zêde xweyê husn û rind û sipehîya Tîmur Paşa bi navê Şems wek qehremanên çîrokê hatine bijartin. Çîrok wiha didome: *“Tîmur Paşa baxteyarî keça xwe nadete Siyahmed, lewranê ew kurmanc e û xulamê wî ye, ew bi xwe îskanbaşî û paşa ye”* ev cumle dide nişandan ku evîna dil bêdermane û agirê evînê jî defî’î nabê. Ji bo zewacê jî meqam û kuresî cihê pewîst nîne.

Bi şêvekî din şîret û penda ve çîrokê bi cureya keçrevandinê e wekî mijar di çîroka sêzdehan, a *“Siyahmed û Şemsê”* de hatiye hûnan. Bazîdî nêrîna civaka xwe ya li ser revîna qîz û xortan bi vê çîrokê daye. Her çiqas mirov nikare bêje ev şeklekî zewacê ye, lê wekî çareya herî dawî ye ji bo xoşewîstan. Ji bo zewaceke bi vê riyê re dibêje: *“Wexta keç û kur ji hev hezbikin û tu çareye bigihêjin hev tune be dibe.”* Dîsa di berhemekê xwe de wiha dibêje: *“Keç revandin di ekrajan de eyb nîne lakin bi riza, bê riza nabe. Weku keç û kurê hevdu hebandine bab û da keçê nadîne wî kurî îcarî ewî keçê direvîne dibite mala axayekî weyanî şêxekî xweyêd keçê bi pê dikevin. Eger li rê rast hatin keçê û kurê herduyan jî dikujin. Eger rast nehatin û selamet çûn êdî xweyê keçe qadirî tişteki nabin.”*¹⁶³ Di nav civakê da îro cihê xwe kuştina Siyahmed û Şemsê wek ziyaret bi layê ciwanan tê gerandin û di nav Kurdan da ev çîrok wek heyranok û sitran tê gotin.

Di nav vê çîrokê da kesayetiyên dîrokî:

- 1- Tîmûr Paşayê Milî
- 2- Ji tayîfa Silîwanên Diyarbekirê lawekî bi navê Siyahmed
- 3- Keça Tîmur Paşa bi navê Şems

¹⁶¹ Tîmûr Paşa: Ji ‘eşira Milîyane.

¹⁶² Siyahmed: Ji tayîfa Silîwanên Diyarbekirê lawekî qewî jêhatî û bi husn û camêr, lakin bê hal û malê dilê wî ketiye keça mîr Şemsê (Xecê).

¹⁶³ Bazîdî, *‘Adat û Rusûmetnameê Ekradiye*, 28; Bazîdî, *Cami’eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmançî*, 69-72.

4- Kesekî Îxtiyar

3.14. Şiroveya Çîroka Çardeyê

Di vê çîrokê da kesayetên wek, di weqtê hikumeta ‘Ebdurrezaq Begê mîrê Xoşabê,¹⁶⁴ di nava nav kelê, ji axa û e’yanên wan kurekî çelebî axa peyda bûye bi navê Îbrahîm Axa û kurê birayê ‘Ebdurrezaq Begê, bi navê Mensur Beg bi layê nivîskar hatine hilbijartin. Îbrahîm, li wan kenaran û li Mehemandan zêde şohret dît û roj bi rojê tereqî kir û xwedan xulam û etba’î û nan û kerem û mal bûye. Nivîskar bi vê hevokê va pend û şîreta xwe wiha tîne ziman: “*Di Kurdistanê da mirovek navê dide û meşhur dibitin, êdî teweciha xelqê li wî mirovî zêde dibin û her kesek xwe didete terefê wî. Êdî hâkim jî bi wan çare nakin, roj bi rojê ew mirovê navê dayî qiwet û şûhret zêde dibitin, ekserê fesadê ekcradan ji mirovên wiha peyda dibin.*”¹⁶⁵

Ev hişyarî dide nişandan ku bêbextî, fêlkirin, bi mêwandariyê xapandin, hesûdî, xîyanet û kuştin di nav civakê da tu car kê nabin. Lewra berjewêndî û kursî her tim ji ber çavnebariye gelek ‘ecean tîne serê mirovan ku hişyarbûn û agahdarî ji bo kesayetên serketî pêwîste.

Di nav vê çîrokê da kesayetiyên dîrokî:

- 1- ‘Ebdurrezaq Begê mîrê Xoşabê
- 2- Îbrahîm Axa
- 3- Kurê birayê ‘Ebdurrezaq Begê, bi navê Mensur Beg

3.15. Şiroveya Çîroka Panzdeyê

Di vê çîrokê da kesayetên wek, ji etba’ û xulamên mala ‘Eladdîn Begê hakimê Rojkan,¹⁶⁶ Şêx Ehmedê Çiplaq, mîrê qedîmê qeza Elcewazê Îsmâil Beg,¹⁶⁷ kurekî Îsmâil Begê biçûk navê Sadiq Beg û Kurekî Ehmedê Çiplak navê Mihemed Beg ji bo qehremanên çîrokê hatine hilbijartin. Di çîrokê da “*Şêx înaye, bi hîle*

¹⁶⁴ ‘Ebdurrezaq Beg û Kela Xoşabê: Roja me da nêzikî bajara Wanê giredayî navçeya Payîzavaye ku qelaka kevnare cihê mîrektîya Mehmûdiyane. ‘Ebdurrezaq Beg jî mîrê Xoşabê ye.

¹⁶⁵ Bazîdî, *Cami’eya Rîsaleyane û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 59-133.

¹⁶⁶ Rojkan: ‘Eşîreka Kurdan a dewrûdora bajara Bilîsê dijîn ne ku Eladdîn Begê jî hakimê ‘eşîra Rojkan e.

¹⁶⁷ Îsmâil Beg: Mîrê qedîmê qeza Elcewaza ku îro navçeya bajara Bedlîsê ye ku cihe mîrên Kurdane.

dostiyek di nêva xwe û Îsmail Begê dayîne, ku belê bi şev min di xewna xwe da dîtiye ku ez û tu bûne birayê axretê. Bi vê terzê Îsmail Beg dide baweriyê û dîkuje” ev hevok dide nişandan ku hoşbawerî, telebazîya şêxên qelp, bêbextî, hesûdî û xîyanet karê wane û di nav fêlbazîya wan da kuştin tu carî kê mabin. Lêbelê dawîya wan jî bêbedel nabe ancax întîqam tete sitandin.

Vê çîroka panzdehê da mirov dikare vê pend û ‘îbretê derbixe: Di mucadeleya bidestxistina desthilatdariya bajaran de rola durûtî û siyasetê ye. Şex Ehmedê Çiplaqê hakimê Rojkan, yekî qetilkarê bê dîn, xwunxwar û zalim bû. Wî li Xelatê hukum dikir. Bi siyaset mîrîtiya Xelatê zebt kiriye. Hespên qenc û xulamên dilêr¹⁶⁸ peyda kiriye, ji aliyakî ve mirovan dîkuje û cerîme digire û ji aliyekî ve jî dide xelkê û kerem dike. Ji ber wê jî kurd ewî wekî xwedî kerem dizanin. Bi vê terzê dused sêsed xulam û siwaran peyda dike û navçeyê zebt dike. Dîsa bi heman pilanê dixwaze kela Elcewazê jî bi dest bixe.

Di nav vê çîrokê da kesayetiyên dîrokî:

- 1- ‘Eladdîn Begê hakimê Rojkan
- 2- Mîrê qedîmê qeza Elcewazê Îsmail Beg
- 3- Şêx Ehmedê Çiplaq
- 4- Kurekî Îsmail Begê biçûk navê Sadiq Beg
- 5- Kurekî Ehmedê Çiplak navê Mihemed Beg

3.16. Şiroveya Çîroka Şanzdeyê

Di vê çîrokê da kesayetên wek, Şêx Ehmedê Çiplaq, Selîm Paşayê Rojkî, Hacî Salih Paşa, Xuhkê¹⁶⁹ Selîm Paşa bi navê Sultan Xanim, li kela Sasonê file yê bi navê Mixo, Kurên Şeyh Ehmed yên bi navê Şêx Mihemed Beg û Şêx Mistafa Beg wek qehremanên çîrokê hatine hilbijartine.

Diyare ku di çîroka şanzdehê de jî leheng serekê, Şêx Ehmedê Çiplaq e. Di vir de mijar dijminahiya wî û Selîm Paşa ye. Şêx Ehmed (Seyîd Ehmed) her wekî di çîroka panzdehan de jî hatibû gotin, hakimê Rojkan e. Bi zilm û dizî gelek dewlemend dibe. Mele Mahmûd jî ev Şêx Ehmed wisa dide naskirin: “*Şêx Ehmedê*

¹⁶⁸ Dilêr, cesur, cure’t, secîh. (Umîd Demîrhan, *Ferhenga Destî Kurdî Bi Kurdî*, Weşanên Sewad, Agrî, 2007)

¹⁶⁹ Di hikayetan da wek Xuhk, Xweh, Xweşk, Xah û Xoş tèn bikaranîn.

Çiplaq ku belaya xwe dît paşê, îcarê ewî Şêx Ehmedê zaf diraf bi zilm û dizî bi hev xistî digel Selîm Paşayê Rojkî bûye dijmin û neyarî kirî.” Ev hevok dide nişandan ku axirê di weqtê Hacî Salih Paşa da dîyar bû ku tu carî zordarî, zilim, te’dayî, xiyamet, berjewendî û fêlkirin tu encamê na de.

Seyît Ehmed bi leşkerê Erziromê re dibe yek, Bazîd û Wanê distîne û tê êrişî Selîm Paşa dike. Selîm Paşa li Bedlîsê li ber xwe dide, lê têk diçe û direve Sasonê. Şêx Ehmed jî Bîtîlîsê talan dike û tê li Mûşê li serayê rûdine. Xweha Selîm Paşa jî li Mûşê bû. Ji bo belaya Şêx Ehmed xelas bibe ji xweha xwe Sultan Xanimê alîkariyê dixwaze. Sultan Xanimê jî xulamekî xwe yî file yê bi navê Mixo peywirdar dike ku warîleke barûd têxe bin odeya wî û bi hewa xîne. Mixo peywira xwe bi cî de tîne Şêx Ehmed û zilamên wî bi wê teqîna barûdê bi hewa dixwe û dukuje. Pê Şêx Ehmed du kurên wî yên ji wî xerabtir tên şûna bavê xwe û heta Rom li wî welatî dibe desthilatdar ew hikum dikan. Dawiya çîrokê de nivîskar derheqê aqubeta Şêx û kurê wî de hêst û ramanên xwe, wiha dibêje: *“Mizgînî ji boyê Selîm Paşa çûyî, hat û dîsa cebrî bûye hakimê Rojkan. Ev fileyê ku eve şûla kiribû zaf malê daye, çirax kir û Şêx Paşa jî belaya xwe dît û xelq ji şerêd wî xelas bûn lakin ewî jî kurêd ji babê bedtir hebûn, navê yekî Şêx Mihemed Beg û navê yekî Şêx Mistafa Beg. Îcarê ewan xelat zebt kirî, dest bi fitne fesad û mirov kuştinê kirin û gelek bêedebî kirin. Ewî Şêx Mihemed Begî zaf jinêd file û misilmanan rakeşan û bi zorê înan li xwe mar dikirin. Ewî jî dibêjin ku bi xwe bi deste xwe çil nefer mirovên file û misilman qetil kire. Şêx Mihemed tebdîl el libas bûyî, revî û çûye Bexdayê wenda bûyî. Birayê wî Şêx Mistefa girtin, di gel Xan Mehmûd, birine Urisçuxê nefî. Pêşîra ‘ebadullahê ji wan xelas bûyî û xelq rehet bûyî.”*¹⁷⁰

Di nav vê çîrokê da kesayetiyên dîrokî:

- 1- ‘Hacî Salih Paşa
- 2- Selîm Paşayê Rojkî
- 3- Şêx Ehmedê Çiplaq
- 4- Xuhkê Selîm Paşa bi navê Sultan Xanim
- 5- Li kela Sasonê file yê bi navê Mixo
- 6- Kurên Şeyh Ehmed, Şêx Mihemed Beg û Şêx Mistafa Beg

¹⁷⁰ Bilge, *b.n.b.*, 56; Bazîdî, *Cami’eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 59-133.

3.17. Şiroveya Çîroka Hefdeyê

Di vê çîrokê da kesayetên wek, Elî Nasiranê risipiyê gundê Herîrê,¹⁷¹ mirove biyanî bênav û nişan yê mêwan bi navê Heyder, bûkeke Elî Nasiran a bedesil û bêsewî bi navê Werdê wek qehreman bilaya Mele Mahmûd va hatine hilbijartin. Werdê yarê xwe ra dibejê: *“Tu here qederekî merkemoş (jahr) ji boyê min bîne, ez dê têkel zadê bikem û bideme van, da pê helak bibin. Êdî mal û hal dimîne ji boyê min û te û ez jî te mar dikem, ji vê çêtir nabê”* ev hevok dide nişandan axirê da ku tu carî, deq û dolap û xiyamet û fêlkirin tu encamê nade û pewiste felbazî û xîyaneta jinan bê zanîn. Her mêwan durust nîne û tu qibla jinan jî tune.

Di çîroka Werdê de ev cumle pend û temayê tîne ber çavan : *“Meger bûkeke Elî Nasiran bedesil û bêsewî hebûye, navê wê Werdê. Ew bûk û Heyder bi xef hevûdu dihebînin û bi dîzî di gel yekûdu didin û distînin.”*¹⁷²

Li çîroka hefdehan serpehatiya Werdêya bûka Elî Nasiran hatiye nivîsîn. Werdê hevserê xwe, bi Heyderê ku li cem wan bi nan û zikê dixebite dixapîne. Mele Mehmûdê Bazîdî bûyereke bi vî terzî ji jinên kurd hêvî nake, ev helwesta Werdê bi bedesilbûn û sêwîbûna wê girê dide.¹⁷³ Heyder ji Werdê re pêşniyara revê dike, lê Werdê qebûl nake. Dizane ku jineke bi mêr, bide pêy yekî biçê her tişt yê bê pêşiyê. Werdê, planeke hovane çêdike û Heyder jî bi xwe re dike şîrîk. Heyder ji Urmiyê merkemojan tîne. Werdê jî van merkemojan, tevî xwarinê dike. Malbat gişt bi xwarinê jarî dibin. Di malbatê de ku hefdeh nufûs bûn, hew şeş kes dimînin. Ji jehrî nebûyîna Werdê û ji malê revîna Heyderî gel pê derdixînin ku ev plan ji bin serê Werdê derketiye. Werdê ji keziyên wê darde dikin û dikujin. Li pêy Heyderî dikevin lê wî zevt nakin¹⁷⁴ û nikarin bigrin.

Di nav vê çîrokê da kesayetiyên dîrokî:

- 1- Elî Nasiranê risipiyê gundê Herîrê
- 2- Mirove biyanî bênav û nişan, mêwan bi navê Heyder
- 3- Bûka Elî Nasiran a bedesil û bêsewî bi navê Werdê

¹⁷¹ Elî Nasiran: Risipiyêke gundê Herîra ku îro giredayî Hewlêreya ku wek bajarok.

¹⁷² Bazîdî, *Cami'eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 59-133.

¹⁷³ Findî, *b.n.b.*, 170.

¹⁷⁴ Bilge, *b.n.b.*, 46; Bazîdî, *Cami'eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 59-133.

3.18. Şîrovaya Çîroka Hejdeyê

Di vê hikayetê da Mele Osman hebû ji tayîfa Xaniyan¹⁷⁵ rêwîyê (misafir) ku di camiyê da şev borandîye, Îmamê mizgeftê, mirî û gundîyên nîştecih mina qehremanên sereke bi layê nivîskar hatine hilbijartin. Rêwîye ku rê da maye wisa dibêj: *“Di nêva mizgeftê pê min hingifte tiştêkî, tarî ye, min bi destê xwe seh kirî ku mirofêk e, raza ye. Îcarê min xwe bi xwe got ku, qey eve jî weko min mewan e, qenc e, ji boyê oldaş e min jî piştta xwe daye wî mirofî û pêve zeliqandî razam”* ... *“Nêzokê fecrê min dît ku derê mizgeftê vebûyî, meger îmam hate mizgeftê, çirax hilkirî, weko ewî çirax ronahî kirî, Mele Osman ji tenişt cenazeyê radibe û rûtinê. Weko îmam çav bi Mele Osmanê dikeve ji tenişt cenazeyê serê xwe hildigirtin û radibitin, îmam we zen diketin ku ew mirî rabû, ditirse, wey dibêje îmam, dikevitin û ji xwe ve diçitin. Îcarê gundî tên û avê bi îmamê vedireşînin, dereng êdî îmam bi xwe ve têtin, ji wî dipirsin ku çî bi te hatî ku eqlê te çûyî, ji xweve çûyî? Îmam dibêje ku weko min çirax ronahî kirî, evî mirofê serê xwe ji nik mewtayê hilanî, min zen bir ku ew mewtaye rabû. Êdî ji tirsan bêxîtiyar ez ji xweve çûme. Paş wê îmam nexweş ketî, qederê du mehan békêf razayî, paş şifa dît.”*¹⁷⁶ Raman û şîreta vê çîrokê ev cumle dide nişandan ku mizgeft mala hemû kesên misafirîn. Dîsan çîrokê da bêteqliya îmam û gundiyan amaje dike ku kesê mirî şeve tenê naye hîştin. Lewra dibe ku bibe sedema gelek tiştên wek berzebûn û tirse.

Di nav vê çîrokê da kesayetiyên dîrokî:

- 1- Ji tayîfa Xaniyan Mele Osman
- 2- Îmamê mizgeftê
- 3- Mirovê mirî û gundîyên nîştecih

3.19. Şiroveya Çîroka Nozdeyê

Di vê çîrokê da kesayetên wek, di nav bajêrê Bitlîsê mirovek hebûye navê Cergo, jina Cergo Guzel Xatun, xulamê Cergo yê ciwan û heramzade ji tayfa Reşkotan bi navê Kirêt bi layê nivîskar va hatine hilbijartin.

¹⁷⁵ Mele Osman: Ji tayîfa Xaniyanê ku digihêjin Ehmedê Xanî.

¹⁷⁶ Bazîdî, *Cami'eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 59-133.

Kirêt, xulamê Cergo û Guzel Xatûnê ye. Yekî bêîrade û pir di bin bandora hêstên xwe yên zayendî de ye. Şehweta zayendî li serê wî dibe bela. Cergo, Kirêt şandiye ku Guzelê ji mala bavê wê bîne. Lê, Kirêt ne yekî dirust e û di rê de, xanima axayê xwe aciz dike û Kirêt, bişev di wê xana xewle de nêta xwe yî rastîn dibêje. Guzel ji ber binamûsbûn û cesareta xwe, bi paqijî ji belaya Kirêtî difilite. Çîrokê da cihê ku munasebeta zayendî tê tesbitkirin ev cumleye: *“Lakin bi rê ve dilê xwe bi Guzel Xatûnê xirab diketin, fesadî di dilê xwe da peyda diketin. Her çend êre ve pê da bi qinayet xeber didetin. Guzel Xatûn fêm diketin fesad(a) dilê wî, cewabê nadetin îcarê Kirêt heramzade xwe vir da wê da gêro diketin ku şev bi ser wan dibêtin, êdî cebrê xeraza xwe îcra biketin. Kirêt car peya dibe û car ez sanco bûme, nexweşim dibêje, hêdî hêdî hespê dajotin. Her çend Guzel Xatûn hêvî û rica diketin ku Kirêt dereng e em êdî nagihine bajarê, lezê bike. Kirêt guhdarî Guzel Xatûnê naketin. Xulase kelam, ew heramzade Kirêt, Guzel Xatûnê gêro û mijûl diketin. Rojavayê bi zorê digihine deşta Rehwayê Xana Başxanê ku hêjam sê seet bajarê Bitlîsê dikişe, êvar jî dibe. Îcarê Kirêt dibêje Guzel Xatûnê ku em dê îşevê li vê Xanê sakin bibin û sibeyê biçin. Guzel Xatûnê êdî neçarî li xanê dawerin û hesped xwe girê didin, demekê disekin. Îcarê Kirêt dibêje Guzel Xatûnê êdî çext feyde naketin û şerm nabê elbet tu dê şûla xerab di gel min bikî ji wê jî min heta şevê tu gêro kirî, eger ne elbet ez dê te bikujim. Her çend Guzel Xatûnê eman dad feryad dibêje û lawahiyan diketin, çare nabî.”*¹⁷⁷

Diyare ku jin û mêrên bisedaqat ji aliyê civakê, her dem tê pesinandin. Çîroka Guzel Xatûnê li ser vê mijarê hatiye hûnan. Di çîroka Guzel Xatûnê de Bazîdî pesnê mêrbûna Guzelê ya li hember Kirêt bi van peyvên dide: *“Wan etrafan aferîn û tehsînê ji boyî pakî û paqijî û cûrat û cesareta Guzelê dikin. Aferîn sed aferîn ji boyê jinêd wehe nêreşêr in, lewranê fî elwaqî’i, ew xanîne zêde muhîb û bitirs in, yanî bi rojê mirov bi tenê li wan xanan ditirsin, barekallah ji boyê Guzelê wê cesaretê û paqijiyê.”*¹⁷⁸

Karektera Guzel Xatûnê motîfa, exlaqê xweş, pakî û cesaretê ye. Her weha di dawiya çîroka Guzel Xatûnê de, Guzel Xatûn ligel hevserê xwe tê meclîsê û xwe venagire, çi bûyer qewimiye tevî vedibêje. Reşîd Findî, ji vê ferasetê re dibêje: “

¹⁷⁷ Bazîdî, *Cami’eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 59-133

¹⁷⁸ Bazîdî, *Cami’eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 59-133

*Pêşketina civaka kurdî ya wê serdemê niha jî berdewam e. Di wê demê de civakên din yê nî milletên hinek ciyan ne wisa bûn.*¹⁷⁹

Di nav vê çîrokê da kesayetiyên dîrokî:

- 1- Cergoyê Bitlîsê
- 2- Jina Cergo Guzel Xatun
- 3- Ji tayfa Reşkotan Xulamê Cergo bi navê Kirêt

3.20. Şiroveya Çîroka Bîstê

Di vê çîrokê da kesayetên wek, ‘Ebdulqedir Axayê Bexdayî, fileyekê Bazîdê, Eşîra Sipkan û Heyderan û mirofê yêrlo wek qehreman hatine bişartin. Hikayetê da ev cumle armanc û şîretê dide dîyarkirin: “*Eşîrekê Sipkan û Heyderan herdukan di gel yekûdu, mikdarê pansed serî karwanê qafîlebaşî ‘Ebdulqedir Axayê Bexdayî lêdan û talan kirin.*”¹⁸⁰ Di dawîya rê girtin û talane pûçe, cehaletî, nezanî û xapandin karê mirovên kirêtin.

Ango di çîroka bîstê de encama talanekê û tê vegotin. Eşîrên Heyderan û Sîpkan diçin talana qefîlebaşî Ebdulqadir Axayê Bexdayî dikin. Malên talanê jî li xelkê belav dikin. Kî dizane belkî jî destana Koroxlî¹⁸¹ bi vî awayî hatiye vegotin û belav bûye.

Barên wê qafîleyê yê nî hemû çox û qumaş û atlas û canefîs û qirmizan li feqîran li deşta Fazîkulê belav dikin. Wexta Ermeniyek xwecihê wê derê tê nêzîkî wan û dixwaze ku hinekî çox û kumaş bikire. Kurdên eşîrên Heyderan û Sîpkan tevî ku qederekê çox û qumaş bê pere didine, pênc bar qirmiz para Kurdekî ketiye ji ber ku nizane ew çi ye û bi kêrî çi tê, tevî qirmizî jî dide wî Ermeniyî û dibêje: “*Belê eve gaza Koroxlî ye, li çiyayê hêlaye ji boyê jaran ku eger mirovek çend gez ji vê bigre mala xwe ava diketin.*” Yê bar standî bi dilşadî çûye vegeyriyaye mala xwe. Ew barên bi xwe re anîbû firotiye, gelek dirav ji wê kar kiriye û bûye bazîrganekî bi nav û deng.¹⁸²

¹⁷⁹ Reşîd Findî, *Pirtûka ‘Adad û Rûmetnameya Ekradiye Ya Mele Mehmûdê Bazîdî*, Spîrêz, Çapa I, Hewlêr, 2006, 3; Bilge, *b.n.b.*, 44; Bazîdî, *Cami’eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 59-133.

¹⁸⁰ Bazîdî, *Cami’eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 59-133.

¹⁸¹ Destana Koroxlî: Wek destaneka gelêrî ya ya rojhilata navîne.

¹⁸² Bilge, *b.n.b.*, 66; Bazîdî, *Cami’eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 59-133.

Di nav vê çîrokê da kesayetiyên dîrokî:

- 1- ‘Ebdulqedir Axayê Bexdayî
- 2- Fileyekê Bazîdê
- 3- Eşîra Sipkan û Heyderan
- 4- Mirofê xwecîh (yêrlo)

3.21. Şiroveya Çîroka Bistûyekê

Di vê çîrokê da kesayetên wek, di weqtê Ebasiyan¹⁸³ da Îbrahîm Xan Begê ku mîrê ‘umûmê Hekariyan, tayfa Hertuşîyan ji mala axayên Girawyan mirovekî qewî zêde reşîd û camêr peyda bûyî bi navê Şekir Axayê Şeng, paşayên Wanê, çetecî ‘Ebdullah Paşa ser’eskerê Erziromê û kurê Şekir Axayê yê mezin Mîr Mehmûd wek qehremanên çîrokê hatine hilibijartin. Hîkayet bi vê şiklî didome: “*Bûne mewan paşan bi hîle Şekir Axayê Kela Şaxê mala wî da kuştine*”, xulam û ‘etbaên wî tirsîyan û sist bûyî, herkesek belav bûyî, çûyne malên xwe. “*Meşhur e dibêjin, ji boyê miryan paşê kes namirîtin*” ev hevok tema ya çîrokê dide nişandan. Ji ber dexesi, çavnabari, xîyanet kirin û dest girtina kursî ji bo Kurdan herdem bi deste neyarên wan va, wan ra tele, deq û dolap, fen û fûtan hatine çekirin.

Ev çîroka bîst û yekemin bi kurtasî di kela Şaxê derbas dibe û dîsa şerê mîran ê têkoşîna desthilatdarî ye mijare. Lehengên wê Îbrahîm Xan Begê mîrê Hekariyan û Şakir Axayê Şengê ku axayê Hertuşîyan e.¹⁸⁴ Şakir Axa di nava kurdan de yekî zêde zêde biqedir e. Paşayê Wanê û Mîrê Hekariyan leşkeran dişînin ser wî lê bi ser nakevin. Mîr û paşayên li wê derdorê tev qesda wî dikin, dîsa jî ew nakeve zevtê. Êdî Çetecî Evdillan Paşa ji Paşayê Wanê re fermana wî birêdike. Paşayê Wanê jî vê fermanê dişîne ba Îbrahîm Xan Begê. Lê nêta Îbrahîm Xan Begê ne bi zorê bidestxistina Şakir Axa ye. Ji ber ku çend carên dine ceribandibû lê bi ser neketibû. Îbrahîm Xan Beg, bi fen û fûtan çareya bidestxistina wî difikire. Berê, qasidan dişîne bi dek û dolaban dostaniya wî dike. Dû re wî vedixwîne ku bike mêvanê xwe. Lê Şakir Axa bawerî pê nîne, qebûl nake. Piştî wê Îbrahîm Xan Begê dibêje wê çaxê ez werim mêvandariya te. Şakir Axa vê yekê diperjirîne. Îbrahîm Xan Begê û zilamên

¹⁸³ ‘Ebasî: Devletî Ebasiyan (750-1250) li Baxdayê hatiye damezrandin.

¹⁸⁴ Şakir Axayê Şengê: Şakir axayekê ‘eşîra Hertuşîyan e. Îro dewrûdora bajara Hekaryan dijîn.

wî tîn dibin mêvanê Şakir Axa û li wir piştî çend rojan firsetê dibinin û wî dikujin. Îbrahîm Xan Begê, Şakir Axayî li mala wî û di nav êla wî de dike.

Ji ber ku kurd dest li hember mîr û axa hilnadin, kes heyfa wî hilnînin. Mele Mehmûdê Bazîdî di berhema xwe ya “ *‘Adat û Rûsumetnameyê Ekradiye*” de, sedema wê bi awayekî berfirehî dibêje: “ *Ekrad ji emrêd mezinên xwe bidernakevin û ehlê ekrad eger xwecihî û eger rewend qewî zêde hakimperest û axaperest in. Zêde îtîata mîr û axayan dikin. Bilanê hakimê wan fileyek jî bitin êdî zêde îtîatê dikin lakîn ji hemcinsêd xwe dexesî dikin bi înad û bi kîn û qudret eger cinsêd wan yekî jê ra bibine hâkim û axayêd wan îcarê ewî qebûl nakin û îtîata wî nakin.*”¹⁸⁵

Di çîrokê de jî zilamên Îbrahîm Xan Begê derî li ser xwe kilît kirine û ditirsin zilamên Şakir Axayî êgir bi wan xînin û bisojin lê tiştêkî wiha nabe bi gotina Mele Mehmûdê Bazîdî : “*Lakin newêran. Lewranê Ekradêd re’ya li ber mîran û begzadan dest hilnagirin û jî paşê mulaheze dikin.*”¹⁸⁶

Îbrahîm Xan Begê serê Şakir Axa jêdike û ji Paşayê Wanê re dişîne. Mirov û eşîra wî bêdeng laşê wî vedişêrin. Nivîskar bi vê gotina mezinan va hikayete dawî dike: “*Piştî miriyan kes namirin*” Şakir Axa jî weha diçe.¹⁸⁷

Di nav vê çîrokê da kesayetiyên dîrokî:

- 1- Îbrahîm Xan Begê ku mîrê ‘umûmê Hekariyan
- 2- Tayfa Hertuşîyan Şakir Axayê Şeng
- 3- Paşayên Wanê
- 4- Çetecî ‘Ebdullah Paşa ser’eskerê Erziromê
- 5- Kurê Şakir Axayê yê mezin Mîr Mehmûd

3.22. Şiroveya Çîroka Bistûduyê

Di vê çîrokê da kesayetên wek, Hacî Şaqo yê di nêva Miksê da, Mele û feqehayên Kurdistanê, kurekî feqe bi navê Şomo û cemi’eta dêra Yêdîkilîsa Wanê¹⁸⁸ wek lehengê çîrokê bi layê nivîskar hatine hilbijartin.

¹⁸⁵ Bazîdî, *‘Adat û Rûsumetnameyê Ekradiye*, 84.

¹⁸⁶ Bazîdî, *Cami’eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 59-133.

¹⁸⁷ Bilge, *b.n.b.*, 57; Bazîdî, *Cami’eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 59-133.

¹⁸⁸ Yêdîkilîsa Wanê: Gundekî qedîme ku girêdayê bajara Wanê ye.

Di vê çîroka bîstûduduyan, di derbarê zilm û zordestîya kurdan a li ser file û êzîdîyan e. Dizî kirina mal û amurên dêran, zirar dayîna cihe îbadetxaneyên, ji bo zarokên Mele û feqeyan karekî kirête hatiye amaje kirin.

Di çîroka bîst û duyê de mijara dizîya dêra Yedi Kilîseye¹⁸⁹ Ermeniyan tê vegotin. Şomo û çend hevalên xwe yê heramzade diçin dizîya dêrê, lê ji hêla xwediyê dêrê ve hindik maye bîn zevtkirin û bi zorê xelas dibin. Tiştên wekî xac û şemdanên didizin dibin Diyarbekirê difroşin. Li hember fileyan feraseta kurdan di vir gelekî xweş hatiye ristin û Mele Mehmûd pend û şîreta xwe wisa amaje dike: “*Berê niha Mele û feqayêd Kurdistanê gelek dizî ji dêrêd filan dikirin. Lewranê li nik wan malêd dêran beyûlmal e. Her çi kesê bibitin dirûst û guneh nînin. Di nêva Miksê da Hacî Şako hebû, kurekî feqe hebû navê Şomo bûyî. Bi rastî Şomo qewî nehs û şerîr û xweyê cesaret bû. Esla ji kuştin û girtinê xof nedikir çend feqehne dinê jî weko xwe heramza li xwe girêdabû, ekserêd şûlêd wan ew bûn ku diçûn û bi rojê dicisisandin û bişev dêrên filan neqeb dikirin û xac û şemdanêd zîvîn û pevalûn didizîn û dibirin û diçîne welatekî dinê, ew mal telef dikirin.*”¹⁹⁰

Di nav vê çîrokê da kesayetiyên dîrokî:

- 1- Hacî Şaqo yê Miksê
- 2- Mele û feqehayên Kurdistanê
- 3- Kurekî feqe bi navê Şomo
- 4- Cemi’eta dêra Yêdîkilîsa Wanê

3.23. Şiroveya Çîroka Bistûsiyê

Di vê çîrokê da kesayetên wek, Çeteçî Ebdullah Paşa waliyê Erziromê, Mirovê ku mala wî hatiye tazîkirin û çar dizen ku bi şev ketine malekê wek lehengên sereke bi layê nivîskar va hatine hîlbijartin. Di vê hikayetê da ji bo şîret girtinê, cahil bûn, nezanîna gel û zîrekî û fêlbazîya paşa tê bahskirin.

Ango çîroka bîst û sêyê de mijar hatiye ser jîrî û qurnaziyê. Lehengê serekeyê vê çîrokê Çetecî Evdillan Paşayê Waliyê Erziromê¹⁹¹ ye. Rêveberiya herêma xwe tenê bi hêzên leşkeran nameşîne, bi aqilê xwe jî birêvedibe. Çetecî

¹⁸⁹ Dêra Yedi Kilîseyê: Ev dêra bajara Wanê pêşerî çîya yê Erk li gundê heman navî daye.

¹⁹⁰ Bazîdî, *Cami’eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 59-133.

¹⁹¹ Çetecî Evdillan: Di serdema Osmanîyan da paşayê Waliyê bajara Erziromê ye.

Evdillah Paşa bûyera diziyekê bi vî awayî derdixe meydanê û sûcdaran ceza dike. Rojekê bişev diz dikeve mala yekî û tiştên wî tèn dizîn. Mirovê ku mala wî hatiye tazîkirin, diçe giliyê xwe ji walî re dike. Waliyê Erziromê Çeteçî Evdillah Paşa bi qurnazî planekê çedike. Dike ku ev dizên malê derkeve holê û ceza bike. Plana walî pir hêsan e, lê belê bi derûniya sucdariyê dike ku diz xwe bidin dest. Walî dizan ji tevger û hereketên wan derdixe. Nivîskar rola sereke ya walî di hevoka dawiyê çîrokê “*Ev qeziye ji ‘eqil û derîta Çeteçî Ebdullah Paşa yadgar maye û tête neqil’*” bi gotina walî va diqedine.¹⁹²

Di nav vê çîrokê da kesayetiyên dîrokî:

- 1- Çeteçî Ebdullah Paşa waliyê Erziromê
- 2- Mirovê ku mala wî hatiye tazîkirin
- 3- Çar diz

3.24. Şiroveya Çîroka Bistûçarê

Di vê çîrokê da nivîskar kesayetên wek, ekradên Bohtan ji tayfa Dudêran, mirovekî halxweş û xweyî rizq û mal û dewlet bi navê Mam Bapîr,¹⁹³ xweyê malê û xetîb û muezin qehreman hilbijartine. Di çîrokê da bêaqil, cahil buna cema’eta mizgeftê û Mam Bapîr digel fêlbazî û qurnaziya îmam amaje dike.

Di çîrokê da Mam Bapîr wiha tê taswîr kirin: “*Mam Bapîr meger qet tu caran mizgeft û xutbe nedêtiye. Mam Bapîr dibêjte xweyê malê ku eve îmamê we çi tov mirovekî bêhurmet e, di xutbe da navên cîranên min xwend û gazî wan hemûyan kir, ji boyê çi qet navê min jî nexwend û gazî min jî nekirî. Ez xwe bi dewlet û malê ji wan cîranan hemû zêdetir im. Îcarê xweyê malê dizane ev Mam Bapîra cahil û ehmeqe*”¹⁹⁴ ji ber vê cahil bûn û ehmaqî ya Mam Bapir xweyê malê wî dixapîne û li ser serê wî deq û dolaban çê dike. Cehalet nahêle mal û milk mirov pêş va bibe.

Roja eynê xweyê malê dibêjîte Mam Bapîr ku tu jî were em biçne xutbeyê, îro eyn e. Îcarê Mam Bapîr jî di gel xweyê malê diçite mizgeftê û rûtinin û guhdarî xutbeyê dikin. Lakin ewî Mam Bapîrê, meger qet tu caran mizgeft û xutbe nedêtiye. Îcarê Mam Bapîr dibêne ku îmam li ser minberê di xutbey da navêd çaryaran û navê Hz. ‘Ebas, Hz. Hemze, Hz. Hesen û Huseyn dixwonitin. Evne jî nimêjê di gel îmam dikin û biderdikevin û têne malêd xwe. Îcarê Mam Bapîr dibêjîte xweyê malê ku eve

¹⁹² Bilge, *b.n.b.*, 58; Bazîdî, *Cami’eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 59-133.

¹⁹³ Mam Bapîr: Kurdên Bohtan ji tayfa Dudêrane ku kesekî dewlemend û pir cahile.

¹⁹⁴ Bazîdî, *Cami’eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 59-133.

îmamê we çî tov mirofekî bêhurmet e, di xutbe da navên cîranên min xwend û gazî wan hemûyan kir, ji boyê çî qet navê min jî nexwend û gazî min jî nekirî. Ez xwe bi dewlet û malê ji wan cîranan hemû zêdetir im.

Îcarê xweyê malê dizane ev Mam Bapîra cahil û ehmeq e. Êdî dibêjîte Mam Bapîrê ku ewan cîranêd te îkrama îmamê kirîne, pez û tişt dayîne xutbeyê, lewranê ew jî navêd wan di xutbeyêd zikir diketin.

Weqtê selayê Mam Bapîr di gel xweyê malê, ew jî têne xutbeyê. Îmam diçite ser minberê. Îcarê Mam Bapîr jî ji pêşve rûniştiye û muntezir e ku îmam navê wî bixwonitin. Îcarê îmam dibêje ku “*eyyûhal Mam Bapîr enteka el-kelb el-kebîr*”, muezin difikire ku îmam berê xutbeyê ev kelama got, we zen dibetin ku belko îmam xeletiyê, îşaret diketin. Îcarê îmam dibêjîtin ku lê “*min el-exnam ‘eşerûne, welek ‘eşre.*” Îcarê êdî muezin deng naketin û xetîb xutbeyê dixwonitin û nimêjê tamam diketin, weki biderdikevin, êdî xetîb ehwalê ji boyê muezin beyan diketin û deh pezan didete muezinê û bîst pezan jî bi xwe dixwetin.¹⁹⁵

Mam Bapîr jî şabûyî diçite nêva ekradan ku îrokeyê min sî pez dayî îmamê, navê xwe li xutbeyê daye xwendin, êdî ez jî weko xwendkarê ekradan im.

Di nav vê çîrokê da kesayetiyên dîrokî:

- 1- Ekradên Bohtan ji tayfa Dudêran.
- 2- Mirovekî bi navê Mam Bapîr
- 3- Xweyê malê
- 4- Xetîb û muezin

3.25. Şiroveya Çîroka Bistûpençê

Di vê çîrokê da kesayetên wek, tayfa Birûkan mirovekê bi navê Sîso, di Stenbolê Serayê Humayûn da Sultan Murad¹⁹⁶ û laleyên wî bi layê nivîskar va ji bo lehengên sereke hatine hîlbijartin. Mebest û şîret di hikayetê da safî bûn, xweşbawerî û comertiya Kurdan (Sîsoyê Birûkî) digel Sultan Muradê Osmanî ku mêwandarî û xweşbînî hatiye amajekirin

¹⁹⁵ Bazîdî, *Cami'eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 59-133.

¹⁹⁶ Sultan Murad: Di serdema Osmaniyan da li Stenbolê Serayê Humayûnê da padişahê dewre ye. Sîso jî keseki xwedî kerî dewlemend e ji ‘eşîra Birukan.

Hikayet wisa dest pê dike. “Carekê ji tayfa Birûkan, mirofek navê Sîso, pez dibete Istanbulê ji boyê firotinê. Kulavê şivanan li ser milê Sîso, li dora Istanbulê keriyê xwe diçêrîne. Rojekê Sultan Murad, di gel laleyê xwe, herdu tebdîl libas, li sûreta derwêşan digerin û li etrafêd Istanbulê seyr û geşt dikin û tên rastê Sîso tên ku pezê xwe diçêrîne. Sultan Murad jî di ‘emrê xwe da ekrad û şivan bi vê qiyafetê esla nedîtiye.”¹⁹⁷

Ev hevok dide nişandan ku “Sultan Murad dibêjîtin ku ne em têr in, hewceyê xwernê nin e. Şivan israr û ilhahê diketin ku nabê, elbete dê hûn tişteki li nik min bixwen, bê xwerîn nabitin.” Diyarê ku hikayetê da jî tê amajekirin mirovên Ekra dan û anatolîyê yên camêr pir comerd, xwedî mêwan, îkram û dil safin.

Di dawîyê da “Sultan Murad ikram û ‘ezazê ji bo Sîso diketin û pezêd wî difroşin û zaf ihsan diketin û gundekî ji gundêd Bazîdê baberat ihsanê Sîsoyê diketin.” Di çîrokê da amaje zîrekî û dil safî buna Sîso û agahdarbûn û rêwebiriya Sultan Murad tê kirin ku Sultan berpîrsiyarîya xwe dizane û her tim gel xwe temaşe dike. Qesr û saray û hediye yên mezin karê derwêşan nîne.

Di nav vê çîrokê da kesayetiyên dîrokî:

- 1- Tayfa Birûkan mirovekê bi navê Sîso
- 2- Di Istanbulê Serayê Humayûnê da Sultan Murad
- 3- Laleyên Sultan Murad

3.26. Şiroveya Çîroka Bistûşeşê

Di vê çîrokê da kesayetên wek, mirofekî reşîd û camêr, dîsanê bi esil ekra dan, lakin sakinên Wanê, navê Çinar Axa, jinekê xwe yê sipehî hebûye, navê Leylê û gundê Şehbaxê ji xanedanên Waniyan Ibrahîm Axa lawekî ciwan, mirovek ji Wanê diçe Bexdayê li layê nivîskar ve hatine hibijartin. Mebest ji vê hikayetê ehlê namus û îfet bûna Kurdan û kesên wek nav kurdan da dijîn mîna gelê gundê Şehbaxê, bê bawerî û xîyaneta jinan, tebdîlê libas ketin û rastîya xeberê te’kit kirin.

” mirovên Enatolê û Kurdan pir namûsin û safin mirow dikare bibêje.

Mijara xapandinê, di çîroka bîst û şeşê de jî hatiye bikaranîn. Leylê jineke bedew e. Hevserê Leylê Çinar Axa, li Bexdayê demekê dixebite. Di wê navberê de

¹⁹⁷ Bazîdî, *Cami’eya Rîsaleyên û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 59-133.

di navbera Leylê û Îbrahîm Axa de, têkîlî çêdibe. Piştî demekê cîran û derdor bi wan dihesin û vê halê digihînin guhê Çinar Axa. Hevserê Leylê ji bo bi çavê xwe bibe şahid, berê du sê rojan xwe li wan dipê. Dema her du li mala wî ne, her duyan jî dikuje û serê wan jêdike, datîne devê derî. Xwediyê Îbrahîm Axa jî birayên Leylê jî dawa xwînê nakin û Paşayê Wanê jî “Çinar Axayê gazî huzura xwe diketin ku aferîn, sed aferîn û xelatekê jî didete” Çinar Axa xwe re dike delîbaşê xwe.¹⁹⁸

Di berhemeka xwe da nivîskar Mele Mehmûd mijara feraseta kuştina jinê di nava civakê de wiha vedibêje: “*Lakîn ji boy şola xerab elbette mirovan dikujin. Hetta jinêd xwe û keç û da û xwehêd xwe jî elbette qetil dikin û jin jî ji boyî şola xerab meselen da keça xwe xwesû bûka xwe û xeh xweha xwe bişev dixeniqînin weya jahrê didinê û qetil dikin; ji axa û rîspiyêd wan kesek pirsiyarê nakin ku te ji boy çi eve kuşt.*”¹⁹⁹

Di çîroka bîst û şeşê de tekîliya Leylê û Îbrahîm Axa weha tê neqilkin: “*Leylê jineke bedew e. Hevserê Leylê Çinar Axa li Bexdayê demeke dixebite. Di wê navberê de di navbera Leylê û Îbrahîm Axa tekiliyak çêdibe.*”

Di nav vê çîrokê da kesayetiyên dîrokî:

- 1- Sakinên Wanê Çinar Axa
- 2- Jine Çinar Axa bi navê Leylê
- 3- Ji xanedanên Waniyan Ibrahîm Axa
- 4- Paşayê Wanê

3.27. Şiroveya Çîroka Bistûheftê

Di vê çîrokê da kesayetên wek, Ibrahîm Xan Mîrê Hekariyan, axayê tayfa Şikeftiyan Îsmâil Axayê Mezin, dizekî qewî zêde meşhur li nik hebûye bi navê Domo û Terlan Axayê Herkî di hikayetê da wek leheng hatine hilbijartin.

Mele Mehmûdê Bazîdî çîroka bîst û heftê havîtiye ser mijara dijminiyê. Li gorî çîrokê wexta Îbrahîm Xan Mîrê Hekariyan bû, di navbera Îsmâil Axayê Şikeftî û Terlan Axayê Herkî de dijminantî hebû. Çîrok li ser mêranî û lehengiya Îsmâil Axayê Şikeftî hatiye hûnan. Terlan Axa wekî adetê nayê bi Îsmâil Axa re şer nake bi dizî xulamê xwe dişîne û bi dizî dixwaze wî bide kuştin. Xulamê wî yê bi navê

¹⁹⁸ Reşîd Fındî, *b.n.b.*, 20 ; Bilge, *b.n.b.*, 46-47.

¹⁹⁹ Bazîdî, *‘Adet û Rusumatnameê Ekradiye*, 47-48.

Domo dizekî şareza ye. Diqedîne tê heya ber konê Îsmâil Axa. Dema agir bi şexaneyê dixîne arê wê nagihe barûdê. Ji şewqa pirîska êgir Îsmâil Axa jê hîşyar dibe û xwe diparêze. Domo zeft dike û bi wî mikur tîne. Piştî ku bi rastiyê dihese Domo azad dike û pê re peyamekî dişîne: “ *Here ji axayê xwe yê Terlan Axa re bibêje, Îsmâil Axayê digot ku dijmin ewe ku ji dijminê bi destê xwe eşkere li meydanê heyfê bistînin. Wesanê bi xef û dizî mirov dane kuştin, ew ne karê mirovan e. Bilanê di wextê xwe da hazir bibe. Ew xulamekê bi dizî vire dikete kuştina min. Lakîn ez dê bi xwe di gel koma biran û pismaman bême derê malê ji boyî kuştina wî êdî kanê Xwedê didete kî. Gelo kî dimiritin û kî dimînitin.*”²⁰⁰

Bi hefsed siwarên Şikeftiyên diçin êrişî Terlan Axayî û wî dikujin lê dest bi êlê nadin û vedigerin. Îcar Herkiyan sê hezar siwar pev dikevin û didin pê Îsmâil Axa û di şerê wan de dîsa Îsmâil Axa bi ser dikeve. Leşkerên Herkiyan dişkên û direvin.

Ji wê demê pêv de xwînî di navbera Şikevtî û Herkiyan de peyda dibe. Kî li ku derê rast werin ji hev dikujin.²⁰¹ Axayên Kurdan heyfa xwe, xwe bi distînin, qasidan nakujin û azad dikin. Tola xwîna û dijminayî di navbera ‘eşîrên Kurdan da her tim berdavam bûye.

Di nav vê çîrokê da kesayetiyên dîrokî:

- 1- Ibrahîm Xan Mîrê Hekariyan.
- 2- Axayê tayfa Şikevtiyên Îsmâil Axayê Mezin.
- 3- Dizekî qewî zêde meşhur bi navê Domo
- 4- Terlan Axayê Herkî

3.28. Şiroveya Çîroka Bistûheştê

Di vê çîrokê da kesayetên wek, Mele Mihemedê Êrisiyan, di dema xilafeta Sultan Ehmed bajara Xoşnavê Mele Mihemed, Şeyxûlîslamê bi layê nivîskar ve hatine hîlbijartin

Di çîroka bîst û heştê de ya îroniya feraseta îdare û perwerdehiya çaxa Osmanî tê vegotin. Helwesta Şêxulîslam û muderrîsên Osmanî ya li hember kesên misilman û nû dibin misilman bi zimanekî mîzahî vegotiye. Dema Mele Mihemed wekî alimekî olî tê Stenbolê cem muderrîs û Şêxulîslamê Osmanî, daxwaza

²⁰⁰ Bilge, *b.n.b.*, 75.

²⁰¹ Bazîdî, *Cami'eya Rîsaleyên û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 59-133.

muderrisiyê dike, kesek wî wekî tişteki naheşibîne û kes guh nadin wî. Lê wexta wekî cilên Êrisan (Rûman) li xwe dike û diçe cem Şêxulîslam û dibêje ez dixwazim bibim misilman, wê çaxê qedrê wî digrin ji elîfbayê destpê dikin medreseyê pê didin qedandin û piştî wê daxwaza wî didinê. Bi mal û dirav û xelatan wî dişînin welatê wî.²⁰²

Hikayetê da heqîqetek û pendek bi van cumle tê amajekirin: “*Wî serdemê da çûna Istanbulê, dibe sedema mezin bunê û gundan istandinê û dewlemed bûnê.*” Dîsan Mele Mihemmed dibêje “*heta ez nebûme êris û ji nû ve misilman nebûm, evne ji boyê min ra miyesez nebûn.*” Di vê hevokê da amajeye ku çil û berg girînge lewra zîrektîya Mele diyar dike feqet Şêxulîslam û muderrîs girîngiyê didin nû va misilman bûyîne.

Di nav vê çîrokê da kesayetiyên dîrokî:

- 1- Xoşnavê Mele Mihemedê Êrisiyan
- 2- Şeyxulîslam û muderrîs
- 3- Axayê tayfa Şikevtiyan Îsmail Axayê Mezin.

3.29. Şiroveya Çîroka Bistûnehê

Di vê çîrokê da kesayetên wek li deşta Bişêriyê, ji eşayîrên Berriyê ji tayfa Berazan kurmanckî zede jîr hebû bi navê Sîso, du kur Sîsoyê peyda bûyîn, navê Kerhê û Ehmê û herdu jî zêde reşîd û dilêr û rimbaz û camêr, yanî bêmisal bûn, Eyûb Axayê Milî, Namiq Paşayê û ‘eşîrên Milan, Berazan û Mirdîsan, Waliyê Celê (Helebê) Namiq Paşa bi layê nivîskar qehreman hatine qebul kirin.

Mijara şer û pevçûnê di çîroka bîst û nehê de hatiye hûnandin. Vê mijara şerkirina kurdan, Mele Mehmûdê Bazîdî di berhema xwe ya “*Adat û Rusûmetnameê Ekradan*” de jî vedibêje Ehmê û Kerhê du birayên mêr, dilêr, reşîd û leheng in. Kerhê ciwanekî bîst, Ehmê nozde salî ye. Diçin aliyê ‘ereban hêştirên wan didin pêşiya xwe û tînin û çî siwar werin pêşya wan, wan perîşan dikin. Ev qas rimbaz û siwarên zîrek in ku nivîskar dibêje: “*Te digot ewana herdu jî ‘eyne ecinî ne, wisanê fars û rimbaz û çapik siwarin*” ku sed siwarên millî perîşan dikin ev her du bira ewqas jîr û jêhatîne ku hem kurd hem jî ‘ereb ji wan dihesidîn û bela ku newêrin

²⁰² Bilge, *b.n.b.*, 67; Bazîdî, *Cami’eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 59-133.

raste rast dijminahiyê bi wan re bikin wan gilî dikin. Eyub Axa û Namik Paşa digel top û leşkerên nîzamî tîn bi van birayan re şer bikin. Ehmê û Kerhê ji bo zerer neye gelên wan bi pêncî siwaran derdikevin çiyayên asê û bi wan re şer dikin. Kerhê bi guleya ku ji eyna xwe dixwe ji hespê dikeve. Dema gule li eniya Kerhê dikeve û Kerhê ji hespê dikeve, Ehmê êdî nikare şer bike û ji hespê peya dibe û têk diçe. Ehmê jî xwe ji hespê çeng dike xwe davê ser Kerhê û bi vî awayî dikevin dest.²⁰³

Di vê hikayetê da cesaret, qehremanî, rimbazî, siwarçakî û çavnetirsî derketîye pêş. Xiyaneta axayên kurd û ‘ereb û leşkerên romîyan digel ‘eşîran ev hedû birayên dilêr bi hezeka mezin ve hatin kuştine. Êdî navê wan qehremanan di nav gelê herêmên wek Bêşirî û Ruhayê nav sitran û dastanên wan da tê gotinê.

Di nav vê çîrokê da kesayetiyên dîrokî:

- 1- Tayfa Berazan Sîso
- 2- Du kurên Sîso bi navê Kerhê û Ehmê
- 3- Eyûb Axayê Milî
- 4- Waliyê Celê (Helebê) Namiq Paşa
- 5- ‘Eşîrên Milan, Berazan û Mirdîsan

3.30. Şiroveya Çîroka Siyê

Di vê çîrokê dakesayetên wek Huseyîn Axayê Zilî axayê tayîfeya Zilan, çar jinên Huseyîn Axayê du jê navserî û du jî ciwan, kurê Ehmedê Feqî Bêlo û fileyê Mêtir Mado bi layê Mele Mehmûd ve hatine hilbijartin.

Di çîroka sihî de Huseyîn Axayê Zilî ji ber fesadî, derew û buhtanên bira û torinên xwe biryara kuştina dostekî xwe yê bi navê Feqî Ehmed dide. Berî Feqî Ehmed bimire di zindanê de digel lawê xwe yî Bêlo demên xwe yî dawiyê dijî. Di wê demê de êşa ku Bêlo ji bo bavê xwe dikişîne perçeyek ji çîrokê ye.

Ev hikeyeta amaje dike ku nebî û torinên Huseyîn Axa çavreşî û derew û iftîran ketine qesda kuştina Ehmedê Feqî, “*Ehmed ber bi qible rûnişt, gote Madoyê were min bixeniqîne. Mado dest diricîfî û digiriya. Ehmed bi xwe bend avête ûstûyê xwe û serên bendê daye destên Madoyê, go kuro, zû bikêşe û bi xwe jî digot ku*

²⁰³ Bilge, *b.n.b.*, 75

“*laîlâhe îllellah Mihemmed resûlûllah,*” bi vê terzê can dayê. Qet mirin li nik wî xem nebûyî.

Di vê hîkayetê da çavnetirsîya mirinê di şexsê Ehmed Feqîda ji bo mirine, fesadî, derew û buhtanên derdora axayan û bi cî anîna emre axayan ji bo xulaman hatiye amajekirin. Ev heqîqeta di pêgotina “*berxê nêr ji bo kêrê ye*” xwe dide nîşandan.

Di nav vê çîrokê da kesayetiyên dîrokî:

- 1- Huseyîn Axayê Zîlî axayê tayîfeya Zîlan
- 2- Çar jinên Huseyîn Axa û birayên wî
- 3- Ehmed Feqî
- 4- Kurê Ehmedê Feqî Bêlo
- 5- Fileyê Mêtir Mado

3.31. Şiroveya Çîroka Sîûyekê

Di vê çîrokê da kesayetên wek Mîr Izedîn Şêrê Hekariyan²⁰⁴ û di weqtê Mîr Îzedîn Şêrê da fileyekî wî di heramê da bi navê Kelo û çil salan xulamî û nawmalîtî jêra kiriye bi layê nivîskar hatiye hîlbijartin.

Dîsan di çîroka sî û yekê de mijara sedema xerabûna baweriya misilmanan a li hember gayrîmuslîman tê vegotin. Berê emîr û begên kurdan gelekî bawerî bi sedeqata tayîfa file û re'yan xulamên û ermeniyan dianîn û her çi ku emrên malên wan û dayîn û standinên mala wan nawmalîtî hebû hemû di destên filan dibûn.

Di wextê Mîr Izedîn Şêrê Hekarî de, fileyekî wî yê bi navê Kelo di nav mala wî de hebûye. Çil salan xulamî û navmaltî ji Mîr Izedîn re kiriye. Piştî ku xiyaneta wî fileyî ya di navmalê de eşkere dibe, cezayê kuştinê lê tê birîn. Mîr Izedîn jî emir dike ku Keloyî bibin û bikûjin. Xulam jî Kelo digrin û destan girê didin ku bibin bikujin. Kelo li huzûra Mîr Izedîn jê re dibêje ku; “*Çil salan e ku min xizmet dikir ku ava xusul û destmêja te min dianî, her çi qederê min înaye, berê min mîztiye nêva vê avê, ji boyî te paşî înaye. Eve ez dibêjime te her çi xusul û destmêj û nimêjên ku te heta niha kirine, ev hemû jî dayîn û dîne te da betal in, tu evan nimêjên çil salan qeza bike û qenc bizane ku ez dijminê dîne te bûm, li ku mayî ku dijminê canê te?*”

²⁰⁴ Mîr Izedîn Şêr: Mîrê Hekariyanê ku mîrektiyeke mezin li herêmê ya Kurdane.

Min xem kuştinê jî nîne, me'lûmê te jî bibitin ku min ev îhaneta çil salan di gel te kiriye, min tu ji heddê mîran rûreş kiriye, ez jî tême qetil kirin xem nîne."²⁰⁵

Ev dem Mîr Izedîn pir zêde aciz dibe û lê tê xezebê û bi xwe radibe Kelo dide ber xençeran û dikuje.

Heta ev bûyer neqewimî bû, emîr û axayên Kurdan xwecihên Hekariyan zêde zêde itibar û bawerî bi gelên filan hebûn. Ew tayîfe ji boyê xwe emîn hesêb dikirin. Lakin piştî vê bûyerê êdî ew çend bawerî bi fileyan nayînin.²⁰⁶ Umra û beglerên Kurdistanê zêde itibar û bawerî bi sedeqata tayîfa file û re'yan hebûye lêbelê bawerî her tim necih dane, gereke mirov hişyar bibe.

Di nav vê çîrokê da kesayetiyên dîrokî:

- 1- Mîr Izedîn Şêrê Hekariyan
- 2- Fileyekî bi navê Kelo
- 3- Mele û Feqî

3.32. Şiroveya Çîroka Sîûduyê

Di vê çîrokê da kesayetên wek paşayên Bazîdê Ishaq Paşa,²⁰⁷ Huseyîn Qulîxan û nêzikî gundê Zengezorê²⁰⁸ li bin bajêrê Bazîda kevin Mîr 'Elî hekîm wek qehreman hatine hilbijartin.

Di çîroka sî û duyê de dostaniya Paşayê Bazîdê Ishaq Paşa û xanê xwecih Huseyîn Qulîxan hatiye vegotin. Ev ji aliyê ku tekîliya kurdan û rêvebirên Osmaniyan dide ber çavan, balkêş e. Çîrok bi çûna Elî Tebîb a Bazîdê dest pê dike. Huseyîn Qulîxan hekîmê xwe Elî Tebîb dişîne cem Ishaq Paşayî ku di bin emrê wî de bixebite. Elî Tebîb, qederê pênc mehan li Bazîdê li hinda Ishak Paşayî dimîne, lê kes ji bo êşekê, nexweşiyakê, yan jî derdekê nayên cem. Bûye havîn, jî hîn yek kes ji bo nexweşiyekê wî nedîtine. Tebîb aciz dibe û li wê derê, xwe wekî bêkar dibîne. Carekê Paşa û siwarên xwe diçin sedyê, tebîb jî bi wan re ye. Dibe wexta navrojê xwarin ji gundê Zengezorê tê nav rezekî. Wekî adet e, berê paşa, siwar û tebîb ji xwarina nav sênîyên sifir dixwin. Elî Tebîb ji bo jahrî nebe ji xwarinê naxwe. Ên

²⁰⁵ Bazîdî, *Cami'eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 59-133.

²⁰⁶ Bilge, *b.n.b.*, 68; Bazîdî, *Cami'eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 59-133.

²⁰⁷ Ishaq Paşa: Bazîdê paşayekê kurê Hesên paşayê Kurde sereya bi navî hatiye çêkirin.

²⁰⁸ Zengezor: îro nêzikî qeleya îshaq Paşa gundekê Bazîdê yê kevnare ye.

dinê dixwin, radibin. Piştî nîv seetî xwarina li ber tavê mayî, xulam û gundî tèn dixwin. Elî Tebîb xwe bi xwe dibêje êdî tune be jî çendên ji van, ji vê xwarinê jahrfî bibin, ez ê jî wan derman bikim.

Dibe êvar dermanê xwe hazir dike guhê wî li gaziye ye. Lê deng ji kesî naye, dibe sibe dibîne ku herkes spîsaxlem e. Rojekê, du rojan, sê rojan sebir dike, le tişt bi kesî nehatiye. Biryarê dide ku vegere welatê xwe. Elî Tebîb piştî ku vedigere welatê xwe, sedema bi şûn de vegera xwe, weha ji mîrê xwe re vedibêje: “*Xan te ez virê kirime nêva tayfayekê ku wucûda wan bi xwe derd û bela ne, mirin û kuştin ji wan peyda dibitin, ew xelkê û ibadullahê dikujin û rencîde dikin, bedena wan bi xwe jehrî ye, nexweşî û jehr dê bi jeherê çî biketin, hal û hikeyeta Ishaq Paşayê û ehalêd Kurdîstanê eve ye û ez pênc mehan di nêva wan de sakin bûm, esla yek ji wan muhtacê ilacê nebûn û axirê jî min dît ku ewan ew zadêd weko jehrê xwarin, dîsanê li wucûda wan tesîr nekirin, êdî min zanî ku betal e, ez hatim.*”²⁰⁹

Di vê hîkayetê amaje eve ku gelê Kurd ji layê tendustirîya xwe ve saxlame. Ev hevok vê heqîqetê diyar dike “*destûra hekîmê didetin û qederekê ikram û ihsan diketin, virêdikete Îranê.*”

Di nav vê çîrokê da kesayetiyên dîrokî:

- 1- Paşayên Bazîdê Ishaq Paşa
- 2- Huseyîn Qulîxan
- 3- Mîr ‘Elî hekîm

3.33. Şiroveya Çîroka Sîûsisê

Di vê çîrokê da kesayetên wek axayê ‘Elîkan Şeref Axa, axayê tayfa Gergeran ji ‘erebên Xezeyê Şêx Tarim²¹⁰ û teyrê bi navê jî Şebîb bi layê nivîskar wek lêhengên hîkayetê hatine hilbijartin.

Mijara vê çîroka sî û sisê ji hev cudabûna çanda kurd û ‘ereban hatiye hûnandin. Lehengê çîrokê Şerîf Axa ku axayê eşîra ‘Elîkan e. Her wekî eşîrên dinê, ên Botan zivistanan dadikevin beriyê navbera Cizîr û Musûlê.²¹¹ Li wir dibe cîranê yekî ‘ereb ê bi navê Şêx Tarim. Ji ber cîrantiyê diçin û tèn cem hev. Di vê navberê de

²⁰⁹ Bilge, *b.n.b.*, 61-62; Bazîdî, *Cami’eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 59-133.

²¹⁰ Şêx Tarim: Axayê tayfa Gergeran ji erebên Xezeyê ku giredayî Mêrdînê ye.

²¹¹ Cizîr û Musûl: Bajarên kevnare yê welate Kurdan in.

dostaniyak di navbera wan de çedibe. Lê dostaniya wan ji ber teyrekî şahîn xera dibe. Kêfa Şerîf Axa, ji Şebîb re tê, Şêx Tarim jî Şebîbî, wekî diyarî dide Şerîf Axa. Her carê, rojekê erê-rojekê na, Şêx Tarim digel bîst siwar dost û cîranên xwe tên û dibin mêvanê Şerîf Axa. Şerîf Axa jî her carê wekî adetên kurdan mazûbaniyê ji wan re dike, pezan ji wan re serjê dike.²¹²

Pend û şîreta vê hîkayetê dostaniya bisînor. Rojekî “*Şerîf Axa laşê Şebîbê davête nik Şêx Tarim û dibêjtin ku haza Şebîbek, ne tu biyî ne jî Şebîbê te bibitin, eve çî ye, me rûyê xwe reşkirî, teyrek ji hewe istandî, êdî eve mudeyeke te em li ber piyê hespan aciz kirin*” Ev hevok dide nişandan dostî û cîrantî ji bo aciz bûnê nîne. Dîsan ev hevokajî “*elbete lazim e êdî mudyekê jî em bêne serxweşî û mudyekê bêne xêratê.*” bêrûtiya wan ‘ereban dide nişandan.

Di nav vê çîrokê da kesayetiyên dîrokî:

- 1- Axayê Elikan Şeref Axa
- 2- Axayê tayfa Gergeran ji erebên Xezeyê Şêx Tarim
- 3- Teyrê bi navê jî Şebîb

3.34. Şiroveya Çîroka Sîûçaran

Di vê çîrokê da kesayetên wek weqtê Şah Îsmâîl²¹³ ku şahê Îranê ye ku Merexayê xanekî ‘ecemên rafizî hebû bi navê ‘Eskerxan, herêma Hekariyan jî kela Dimdimê Mîrekî bi navê Xan Ebdal²¹⁴ lakin qewî zêde lawekî ciwan û sipehî bûye, zêdenav Mîrê Çepilzêrîn jê ra digotin û Gewher Xanima qehreman û Esmâ Xanim jina Xan Ebdal mîna lehengên bi layê nivîskar hatine hîlbijartin.

Pend û şîreta vê çîrokê tekoşîna kurdên sunnî û xwendkarên Safewî bi layê Mele Mehmûdê Bazîdî va di çîroka sî û çaran de hatiye nivîsandin. Mijara Kela Dimdimê di nav wêjeya kurdî ya devkî de gelekî namdar e. Niha jî gelek nivîskar vê mijara lehengiyê di berhemên xwe yê nivîskî de vedibêjin.²¹⁵

²¹² Bilge, *b.n.b.*, 72; Bazîdî, *Cami'eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 59-133.

²¹³ Şah Îsmâîl: Kesê ku dewleta Safewîyan damezrandiye ku dibejin ‘eslê wî Kurde.

²¹⁴ Xan Ebdal: Xan Ebdal jî mîrê Hekariyane. Di navbera Hekariyan û Îranê da kela Dimdimê heye. Kela Dimdimê di nav wêjeya kurdî ya devkî de gelekî namdar e. Mele Mehmûd Bazîdî jî di berhema xwe de dibêje Kela Dimdimê aniha di nava sînore Îranê de li herêma Mergeverê ye. Dastana Dimdimê di serê sedsala XVIIan de (1608–1610) li perçeyê Kurdistana Îranê qewimî ye

²¹⁵ Bilge, *b.n.b.*, 60-61; Bazîdî, *Cami'eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 59-133.

Ji ber zilma xanê rafizî ‘Eskerxanê û alîkarî nedana paşayê Wanê ehle Dimdimê wek bi vê çîrokê da jî diyare hemû şehîd bûn. Di hevokê da “*Her çi ku ji keç û bûkan hebûn zafan jehrê vexwarî û Asme Xanim jî agirê didete cebxaneyê û yalekî kelê berhewa dibitin, ji Îranê û ji ‘eyal û etfalên ehlê Dimdimê hemû şehîd dibin. Agir dayne kelê jî, kele û avahî hemû sotin*” amaje dibe. Diyare ku qehremaniya Gewher xanimê û ifet û namusa jinên kurd wek Asme Xanim yê din amaje dibe. Ji bo kurdan azadî, xwe parastin girînge û bindestî, zilim kirin û talan nêpêjirandin. Vê destana qehremaniyê Melayê Batê jî têr û teselî behs dike.

Di nav vê çîrokê da kesayetiyên dîrokî:

- 1- Xanekî ‘ecem yê rafizî bi navê ‘Eskerxan
- 2- Mîrekî kela Dimdimê bi navê Xan Ebdal (Mîrê Çepilzêrîn)
- 3- Gewher Xanim
- 4- Jina Xan Ebdal Asme Xanim

3.35. Şiroveya Çîroka Sîûpencê

Di vê çîrokê da kesayetên wek qezayên Bohtan di qeza Berwaran da gundek heye navê Xesxêr ji wan dera jî tayîfa Adiyar Mîre Beg, ew Mîre Beg jina wî berê dimire, kurek ji wê jinê dimîne bi navê Dijwar, jinbav û yarê jinbavê û gundî bi layê nivîskar ve hatine hîlbijartin.

Lehengê çîroka sî û pêncê zarokê bi navê Dijwar e. Dijwar hîn heft salî ye diya wî dimire û bavê wî Mîre Beg ku ji Xesxêrê ye, ji xwe re ji xelkê Botan jinekê tîne. Piştî sê çar salan navbera Mîre Beg û Mîrê Botan xera dibe, mecbûr dimîne, direve Stenbolê. Dêmarî û Dijwar li Xesxêrê dimînin, bi milk û rezan debara xwe dikin. Meger dilê jinbava Dijwar, hîn di dema keçaniyê de, di yekî de bûye û ji çirka bavê wî çûbû Stenbolê ew kes dihat û diçû mala wî. Dijwar, ji vê rewşê dikeve şikê û ji jinbava xwe dipirse, lê jinbava wî bi derewan dibêje, ew kes birayê min e. Dijwar ji ber malbata dêmariya xwe nasnake bawer dike.²¹⁶

Di vê hîkayetê da xîyanet û bênamûsîya jinbavê, xîreta Dijwarê qebûl nake, Jinbav Dijwar wiha dixapîne: “*Jinbava Dijwarê dibêjitin kuro here rezê ji boyê xalê xwe tirî werîne.*” Lavekî gundî vê fikre dide Dijwarê ehmak “*îşeve tu li wan*

²¹⁶ Bilge, *b.n.b.*, 47; Bazîdî, *Cami’eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 59-133.

herdukan bipê qewî zêde ‘ar têtin’. Paşê Dijwar ji dêmariya xwe dikeve şik û gûmanê û wê dişopîne: *“Dijwar dibînitin ku belê cihek bi tenê li koşeyekê malê danîn û çirex vemirandin, herdu, jinbab û ew yarê wê ketine nêva cihan, paşila yekûdu razan.”*²¹⁷ Piştî ew di xew ve diçin, Dijwar ewan bi wê xençerê dikuje. Gazî cîranan dike. Bûyerê ji wan re dibêje. Ji ber ku tevî ku temenê xwe yê biçûk, li gorî normên civakê tevgeriyaye ji her kesî eferînê distîne. Bûyer li der dorê belav dibe heta diçe guhê mîrê Botan. Mîr jî ji bo vê cesareta Dijwar bavê Dijwarî, Mîre Beg, efû dike û destûra hatina wî dide û dike pîşekarê xwe.²¹⁸ Di çîroka Dijwar de munasebeta zayendî ne bi qasî Kirêt û Guzel Xatûnê zelal e.

Di nav vê çîrokê da kesayetiyên dîrokî:

- 1- Tayîfa Adiyân Mîre Beg
- 2- Dijwar kurê Mîre Beg
- 3- Jinbav û yarê jinbavê û gundî

3.36. Şiroveya Çîroka Sîûşêşê

Di vê çîrokê da jî kesayetên wek Hezretê Xizir,²¹⁹ siwar ji hespê, welîyekî Xwedê bi layê nivîskar hatine hilbijartin.

Mebest û şîreta ve çîroka sî û şeşê eve ku alîkarîya qencên Xwedê û kesên wek Hz. Xizir hesibandin tê amaje dike. Feqet qewî bawerbûna kurdan carnan jiber cahil bûn û bêsewad bûn baweriyên xelet dipesînin. Di çîrokê da şaşbawerî û bi rêya dîn va xapandin û şêlandin jî tê amaje kirin. Ev pend û nesîhet di çîrokê da wisa berdeamin: *“Rewendekî rût û jar û qewî perîşan, ji mala xwe biderdikevitin ku ji boyê xwe çare û ‘elacekê biketin. Ew mirof di geliyê Kotulê danê têtin û berekî mezin û bilind li kenarê rê heye, digehte wî berî û reht dibitin. Li binê wî berî rûdinitin ku demê ji boyê hêsayî bibitin û paşê bi şûla xwe danê biçitin. Difikire ku ji dûr ve siwarekî pêkhatî bi libas û çek têtin. Weko ew rewend ewî siwarî ji dûr ve dibînitin, dikevte temeha şelandina wî siwarî. Lakin rewend rût û bê çek û peya ye. Îcarê hema filhal ewan paçêd di ber xwe danê bidertêne, tazî ‘ûryan, pêxas û serkol biderdikevite serê wî berî, ber bi qible li ser piyan disekinitin. Herdu destêd xwe bi*

²¹⁷ Güzel, *b.n.b.*, 47-48; Bazîdî, *Cami’eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 59-133.

²¹⁸ Bilge, *b.n.b.*, 47; Bazîdî, *Cami’eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 59-133.

²¹⁹ Hezretê Xizir: Di bawerîya misilmanan da kesayetekî wek piştewane.

jor ve hildigiritin, guya eve mirofa ji Xwedê ta'ala du'ayê rica û hêvî diketin. Weha bi vê terzê li serê wî berî disekinitin. Ew siwarê rêwî jî digehte binê wî berî, li jor ve li serê wî berî dinêre ku mirofekî rûs û ser pêxwas, li serê berê ber bi qible westaye û herdu destêd xwe bi 'esmanan danê hilgirtiyê û du'ayê diketin. Ew siwarê rêwî 'ecêb diminîtin ku eve çi hikmet e û eve çi kesek e, insan e, welî ye, cini ye?'²²⁰

Ew siwar didete di zengî û li binê berê disekine, li wî rewendî ku li serê berê westaye difikiritin, xwe bi xwe dibêjtin ku eve şûla elbete ji sirekê xalî nînin, ez dê ji vî mirofî pirs û pirsiyarekê bikim, paşê ji êre diçim. Dikete gazî ku ey mirof, tu çi kes î û eve çi hal e, ji boyê min bibêje. Ew rewend berê qet cewab nadetin, guya bi du'ayê meşxul e. Ji vê cewab nedana rewendê tem'a siwarê êdî zêde dibitin ku heye belko eve Hezretê Xizir e, weyaxo welîyekî Xwedê te'ala ye. Elbete dê ez vî mirofî ziyaret bikim û ji vê ehwalê xeberdar bibim, paşê biçme şûla xwe.

Ew siwar ji hespê danê peya dibitin û muntezerî rewendê disekinitin. Paşê demekê guya rewend du'a xwe tamam diketin û destê xwe li rûyê xwe disotin û tête xwarê ser paçêd xwe. Îcarê ew siwar ji rewendê pirsiyar diketin ku tu bi Xwedêkî tu çi kes î û eve çi hal e? Ji boyê min rast bibêje. Îcarê rewend dibêjtin ku ez ji Erek im û eva bere ziyaretgâh e û berê mirazan dibêjine vî berî, her çi kesê mirazek hebitin bête êre û testmêjê bigiritin û paşê rûs û tazî serkul û pêxwas bibitin û biçite ser vî berî û ber bi qibleyê bisekinitin û ji Xwedê te'ala miraza xwe bixwezîtin, elbete du'awê (du'ayê) mirof diqebile. Min jî mirazek hebû, lew hate êre (lewma hatime êre) û min ji Xwedê te'ala mirazê dixwest. Ev e ehwalê min û berê û du'ayê.

Îcarê weko ew siware evê xeberê ji wî rewendî seh diketin, ew mirof jî şewqeq lê peyda dibitin ku ez jî mirazekê ji Xwedê te'ala li serê vî berê ziyarete bixwezim, belko diqebile. Îcarê ew siwar dibêjite wî rewendî ku tu jî hespê min bigire da ez jî bişelim û biçime serê berê mirazekê Xwedê te'alayê ji boyê xwe bixwezim. Berê rewend dibêje ku ne şûla min heye, ez bi lez im, dê biçim. Îcarê ew siware zêde lawa û heyana li rewendê diketin, rica û hêvî ji boyê kenarê Xwedê hespê min bigire, ez dê zû bême xwarê. Îcarê rewend dibêjtin ku bilanê wesana bitin, lakin zû were ku şûla min heye.

Îcarê ew siwar dişelitin û libas û çekêd xwe bil tamam dispêre rewendê û bi xwe jî rûs û tazî serkul û pêxwas diçite serê berê û dest bi du'ayê diketin. Weko

²²⁰ Bazîdî, *Cami'eya Rîsaleyana û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 59-133

rewend mayî bi tenê, cilêd wî siwarî hemû berhev kirî û çekêd wî girêdayî, li hespê siwar dibitin û libasêd wî jî dadînite ber xwe li wî navî. Ew mirof li ser berê difikire ku rewendê qesda çûnê ye, dikete gazî lo mirof, tu çi dikî? Rewend gazî diketin, tu du'a xwe terk meke, Xwedê mirazê min dayî, eve ez çûme halê xwe danê, tu jî du'ayê bike da Xwedê mîrê mirazan e, da miraza te jî bidetin. Rewend evê xeberê dibêjtin û rikêban li hespê didetin, ya Allah diçite şûla xwe.

Xweyê hespê, wesanê rûs û tazî dimînitin û bi jarî têtê mala xwe. Rewendê ew hesp û çek wesanê birî û çûye şûla xwe. Êdî ji wî weqtî û zemanê, navê wî berî maye berê mirazan. Eve qîseya jî di nêva alemê danê bûye dastan û derbbûmesel. Weko yek hêleyê li yekî biketin, dibêjin ku eve jî ehwalê berê mirazan e.²²¹

Di nav vê çîrokê da kesayetiyan dîrokî:

- 1- Hezretê Xizir
- 2- Siwarê hespê
- 3- Welîyekî Xwedê

3.37. Şiroveya Çîroka Sîûheftê

Di vê çîrokê da kesayetên wek, Şatir û qezayên Wanê di qesaba Bêgiriye²²² fileyek hebûye bi navê Sare Salteyî bi layê nivîskar ve hatine hilbijartin.

Ango mijara vê çîroka sî û heftê li ser defîneyê ye. Çîrok di navbera du lehengên xeyrêmuslîm de derbas dibe, yek Şatirê Ermenî ye ê dinê derwêşê bi navê Sare Salte ye. Derwêş leşkerekî pîr ê artêşa xaçiyân e. Ji Frenkîstanê vegeziyaye jibo kela xerabe ya li gundê Bêgiriye û Korzotê. Ev Keleyek ji kufaran mayî ye. Derwêş ji Frenkîstanê ji bo kevokeke zêrîn bibe hatiye. Şatir, wî Sare Salteyî dike mêvanê xwe. Qederê du mehan li Sare Salteyê nexweş miqate dibe û mazûbaniyê dike.²²³

Ev mijar di çîrok da wisa hatiye behs kirin: Weqtekî derwêşek berê biharê têtê wê qesebeya Bêgiriye û li mala wî Şatirê file dibite mêwan, ew derwêş navê jî Sarê Salte bûye. Di vê hikayetê da “*di nêva gundê Korzotê û Bêgiriye kelekê xerabe heye, têda defîne heyn. Ez dê bixwînim û sehra defîneyê betal bikim û em biçne nêva*

²²¹ Bazîdî, *Cami'eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 59-133.

²²² Şatir: Qezaya Wanê a bi navê Bêgiriye (Muradiye) fileyek e.

²²³ Bazîdî, *Cami'eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 59-133.

defîneyê, rastî deriyek zahir dibitin, ew herdu diçine nêva wê xezîneyê Şatir ji zêran tijî çewalê diketin û ji defîneyê biderdikevin”

Di çîrokê da çavbiçîtî û malê dinyayê amaje dibe ku Mele Mehmûd wisa dibêje: *Vê heqîqetê Xweda dizane lê ev qiseyên xezîne û defîneyan di Kurdistanê da zaf hene û ekrad zêde bawerî bi bûyina defîneyên xezîneyan dikin. Gelek jî rast hatine, êdî heqîqetê Xwedê dizane.*

Di nav vê çîrokê da kesayetiyên dîrokî:

- 1- Fileyek bi navê Şatir
- 2- Sare Salteyî
- 3- Paşayê Wanê

3.38. Şiroveya Çîroka Sîûheştê

Di vê çîrokê da kesayetên wek, di wextê xilafeta Sultan ‘Ebdulhemîd Xan²²⁴ da (1804 zayînî), dema ji hakimên xwecihê Mehmûd Paşa yê Bazîdê, Frenkistanê mirofekî seyah ji boyê seyr û temaşeya Hind û Îranê Bazîdê bûyê bi nave A. Jaubert û Qasim Axayê dîzdar û jina wî Rehîme Xatun bi layê nivîskar ve hatine hîlbijartin.

Çîroka sîûheştan, di derbarê esîrgirtina gerokê kurdnas ê fransî yê di sala 1804ê de di qesra mîrê Bazîdî ye. Wextê Mehmûd Paşa fewt dibitin û birayê wî hebûye Îbrahîm Beg, ji qezayêd Bazîdê li qeza Xamurê mîr bûye Ew Jubir jî emwal û eşyayêd xwe hedîne qewî meqbûle daye Qasim Axayê û jinê û ikram kiriye qonsolê Erziromê ingilîzan Musyu Brendê. Ewî Musyu Brendê kurekî Qasim Axayê navê Mehmûd Axa hebû, bîstûpenc france wezîfe li wî Qasim Axayê dîzdar gîredaye ku *“mîrofekî frengî hinde xweyî mirwet û insanî bibitin, gelek şûle. Kesek belko ji ehlê îslaman heta niha ev terze insaf û merwet nekîrine illa ku navê qencî û insaf û merweta wî, hesêb ke anegora xwe wekî navê Nûşîrwan²²⁵ adil di nêva Kurdistanê mayî”* Ev hevok di nav Kurdistanê axayên wek Nûşîrwan adil hene buyera Jubir jî eve renga qewimiye û ekserên ekradên Bazîdê pê dizanin.

Çîroka sî û heşt ji aliyê nêrîna civakê ya li hemberî biyaniyan ve girîng e. Naveroka çîrokê li ser esîrgirtina gerokê Frensî ye. Ev gerok li gorî Ziya Avcî Kurdnas; li gorî hin çavkaniyan jî casûsekî Napolyon e, ji bo peywîrê bi dizî diçe

²²⁴ Sultan ‘Ebdulhemîd Xan: Sultanê dewleta Osmanîyan e.

²²⁵ Nûşîrwan: Kesekî adilî di nêva Kurdan da naskiriye.

Îranê. Her çi dibe bila bibe ji bo me ya girîng lehengê çîrokê ango A. Jaubert, ev serpehatiyên xwe piştî vegeyriyaye welatê xwe kiriye pirtûk û weşandiye. Di seyhatnameya xwe ya bi navê “*Voyage en Arménie et en Perse*” de behsa serpehatiyên xwe yê rêwitiya Îranê û bûyerên li Bazîdê jiyaye jî dîke. Li gorî îfadeyên Jaubert, çîroka Bazîdê rasteqîn e, çîroka Bazîdê û serpehatiya Jaubert ji aliyê naverokê de yeka yek e. Tenê ferqî ev e ku, serpehatiya Jaubert bi nêrîna xwe; Bazîdî çîroka xwe bi nêrîna civaka kurdan vegotiye.²²⁶

Di nav vê çîrokê da kesayetiyên dîrokî:

- 1- Mehmûd Paşa yê Bazîdê
- 2- Mirofekî seyah bi nave A. Jaubert
- 3- Nûşîrwan
- 4- Îbrahîm Beg birayê Mehmûd Paşa
- 5- Qasim Axa û jina Wî Rehîme Xatun

3.39. Şiroveya Çîroka Sîûnehê

Di vê çîrokê da kesayetên wek, 1824-1825 bûye sefera Îranê û Romê, wî weqtê axayê tayfa Sîpkan Silêman Axa û axayê tayfa Zîlan Huseyn Axa, ew herdu di gel êlên xwe li xaka Îranê bûn, xizmeta Şahê Îranê dikirin. Bi layê nivîskar ve qehremanên çîrokê hatine hilbijartin.

Çîroka sî û nehê, qewimînên siyasî û tesîra tevger û exlaqê kurdan yê li ser bûyerên demê, bi awayekî vekirî dide pêşberî me. Malûmî herkesî ye ku Îranî û Osmanî ji ber ku du dewletên xurt bûn, ji berê de raqîb û dijminên hev bûn. Her du dewletan hêzên kurdan ji bo serketinê, herêma wan jî wekî herêma tampon û sînorên ewlehiyê bi kar anîne. Şerê Îranî û Osmaniyan ya di sala 1824-1825 zayînî rista kurdan, serfiraziya dewletan diyar dikir.

Çîrokên li ser mijara şerê Îran û Osmaniyan esasên xwe daniye, lê li ser mijara li hember heqaretê tewirgirtinê bîna bûye. Zeman Xanê li Îranî Ayromî di hizura Ebbas Mîrzayî Abbas Mîrza wê demê warisê texta Îranê bû de ji Silêman Axayê Sibkî û Huseyn Axayê Zîlî re dibêje zen qahpe (jina qahpe). Abbas Mîrza pêşî deng nake lê dû re ji hizûra xwe diqewirîne. Lê Silêman Axayî tehemul nake û

²²⁶ Bazîdî, *Cami'eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 59-133.

di bin vê heqareta Zeman Xanê de namîne. Dibêje ez êdî li vir namînîm. Ji Îranê vedigere. Huseyn Axayê Zilî²²⁷ bi wî re venagere li wir dimîne.

Silêman Axa piştî vedigere bi qedereke li benda heyfihilanînê dimîne. Silêman Axa ji bo heyfa zen qehpetiyê ji Zeman Xanê hilîne, her dem wî dişopand. Berî şerê Îran û Osmaniyan biqewime dihere cem waliyê Wanê Sert Mehmûd Paşa dû re vedigere welatê xwe. Dema şerê Îran û Osmaniyan li deşta Eleşkîrê diqewime û artêşa Osmaniyan têk diçe bi hefsed siwarên xwe êrîşê bir ser artêşa Zeman Xanê Ayromî bera wî dide û wî dil digre.²²⁸ Ev heqîqet çîrokê da wisane: “*Weko nêzokê muharebeyê bûyî, nayêb el-Seltenet ‘Ebbas Mîrza, Silêman Axayê Sîpkî û Huseyn Axayê Zilî xwestiye yekî ji wane du şalêd şemle zîqîmet û şîrêd zîrîn îhsan kirî û gotiye wan ku hûn xulamêd sadiqêd Şah in.*” Ev hevok dide nişandan ku axayên Kurdan qehpe nînin xwe firoş nînin lêbelê talî xerabe, bê xweyîne “*ji xanên welatê Rewanê xanê tayfeya Ayromiyan Zeman Xanê kurê Qasim Xanê ji hesedê gotiye ‘Ebbas Mîrzayê ku, şah im, eve çî ye ku tu hinde rexbet û ri’ayetê di nêva xwanenên Îranê li van axayên ekradan zen qehbe dikî. Eger çî ‘Ebbas Mîrza ji vê xeberê sil bûye û Zeman Xan teqdîr kiriye. Lakin Silêman Axayê Sîpkî ji xîretan nehemilandî, li wê huzurê gotiye ku Zeman Xan subeyê zen qehbetê kifş dibitin.*” Ew jî hatiye ji Qulpê jortirê li çiyayê ‘Ebas şerê Rom û Îranê li deşta Eleşgîrê bûyî tolê ji Zeman Xanê bistîne ku ji Rewanê Huseyn Qulî Xan emrê Zeman Xanê Ayromî tol sitandîye û kuştîye jêra gotîye lêbinhere qehpe kiye. Mizginî xeber daye Mehmûd Paşayê Wanê.

Di nav vê çîrokê da kesayetiyên dîrokî:

- 1- Tayîfa Sîpkan Silêman Axa
- 2- Tayfa Zîlan Huseyn Axayê Zilî
- 3- Rewanê xanê tayfeya Ayromiyan Zeman Xanê kurê Qasim Xan
- 4- Sultan ‘Ebbas Mîrza
- 5- Mehmûd Paşayê Wanê

²²⁷Huseyn Axayê Zilî: Axayekî ‘eşîra zilîya Kurdane.

²²⁸ Bilge, *b.n.b.*, 61-62.

3.40. Şiroveya Çîroka Çilê

Di vê çîrokê da kesayetên wek; tayfeyekê leşkerê Romîyan bûye jê ra Siwarê Lond digotin. Li hemû welatên Romê ew leşkerên London hebûn û qewî leşkerekî serbest û bêperwa bûn û gelek zilm û te'da li gundan û re'ye û feqîran dikirîn digel wan Melike Xatun xanima Mîr Şemdîn ku keça paşayê 'Imadiyeyê û tayfa Yengeçiryan (Yenîçerîyan) û Londbaşi Axasi Hafîz Axa bi layê Mele Mehmûd ve hatine hîlbijartin.

Di vê hîkayete da tê amaje kirin tayfa London hemû mazin û biçûk fermanlo ne gel û gundewar dişelandin, şelandin û ji gundan diraf tomar dikirin û gel dikirîne kole. Paşê rol û cesarete jine derdikeve pêş dawîye da ferset û zîrek buna Melike Xatunê mîrîtiya Akreyê²²⁹ bi xweser gihaye destê Melike Xatunê. Lakin eve şûle bi cesarete Melike Xatunê bûyî meşhur e kirine waliyê Mûsilê.

Ji bo bêaqilî û qurnazî mînaka herî xweş çîroka çilî ye. Rewşa civaka gelên Osmanî ya dawîya sedsala XVII an û rêxistin û rêveberiya mîrekiya Behdînan²³⁰ li ber çavan e. Di çîroka de eqil û cesareta Melîke Xatunê hatiye vegotin. Belaya lewendan û mucadeleya xelasbûna ji lewendan wekî mijar hatiye hûnandin. Serketina şeran tenê bi hêzên eskerî naye bidestxistin, eqil jî hêmaneke girîng a şerî ye. Hetta mirov dikare bêje aqil çeka herî bi hêz e. Gelek şer hene ku ne bi zorê hatiye bi dest xistin û şerên bîaqil û qurnazî serfiraz bûne ne hindik in. Hinek ji van jî bûne mijarên destanan.²³¹

Di nav vê çîrokê da kesayetiyên dîrokî:

- 1- Leşkerên London
- 2- Keça paşayê 'Imadiyeyê Melike Xatun xanima Mîr Şemdîn
- 3- Tayfa Yengeçiryan (Yenîçerîyan)
- 4- Londbaşi Axasi Hafîz Axa

²²⁹ Akre: Bajarekê Kurdan a kevnareye ku îro gîredayî bajara Dihokê ye.

²³⁰ Mîrekiya Behdînan: Ev mîrekiya di herêma Akre, Îmadîye, Zaxo, Dihok, Hekkarî û Şemzînan da hatiye damezrandin.

²³¹ Evin, *b.n.b.*, 63; Bazîdî, *Cami'eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, 59-133.

Tabloyek Derheqê Kesayetiyan Dîrokî Da

Hejmara Çîrokê	Mijara Çîrokê	Kesayetiyan Çîrokê Yê Dîrokî
1	Çavbirsîti û temahkarî	-
2	Şîret û xwe necihanîna wê	Pêxember, Cebraîl, Firîşte
3	Şîret û xweşbawerî	Mele Bazîdî
4	Dizî û heramzadeyî	Mîrzoeyê Reş û Memedê Selmasî
5	Xiyanet û desthilatdarî	Mîrê Xînûsê Mihemed Beg, Kor Yusuf Paşa, Walî Paşayê Daxistanî
6	Cehalet, bêeqilî û çavbirsîti	Îbrahîm Paşayê Bazîdî, Delî Îsmâil Axa
7	Dijminahiya olî û baweriye	Mele Mihemedê Qulpî û Mihemedê Heyderî
8	Kuştin, evînî û bawerî	Poloyê Rus, Bernika Mexînî û Şemsê Êzîdî
9	Kursî, berjewêdî û mekrên jina	Şêxî Beg, Îbrahîm Xan Mîrê Hekaryan û Adîle Xanim, Mu'tela Beg
10	Kursî, berjewêdî û malê dinyayê	Hesen Begê Mankî, Mahmûd Paşayê Mîrê Bazîdê, Xelîl Begê Eleşkîrê û Leşkoyê Ermen
11	Malê dinyayê û kursî û êsalet
12	Evîna dil, îxanet û fêlbazî	Hesen Axayê Hesamiyan, Çeleng Axa û Lalîxan
13	Camêrî, bedewî û êşq	Tîmûr Paşayê Milî, Siyamend û Şems
14	Kuştî, telebazî, hesûdî û bêbextî	Mîrê Xoşabê 'Ebdurrezaq Beg, Îbrahîm Beg û Mensur Beg
15	Xweşbawerî, telebazî, bêbextî û hesûdî	'Eladdîn Begê Rojkan, Îsmâil Begê Elcewazê, Şêx Ehmedê Çiplak, Sadiq Beg û Ehmed Beg

16	Zilim, berjewêndî, îxanet	Hecî salîh, Selîm Paşayê Rojkî, Şêx Ehmedê Çiplak, Sultan Xanim Mixoyê Fileh
17	Namûs, îxanet û jehr dayîn	Elî Nasrîn Herîrî, Werdêya Bûk
18	Xapandîn, bawerî û cehalet	Mele Osman Xanî
19	Camêrî, namus, îxanet	Cergo, Güzel Hatun û Kiret
20	Talankirin, dizî û cehalet	‘Ebdulqadir Axayê Bexdayî,
21	Dexesî, çavnebarî, meqamê dinê	Îbrahîm Xan, Şekir Axayê Hertoşî, Çeteci ‘Ebdullah Paşa, Mîr Mehmûd
22	Zilim, zordestî, bawerî, talakirin	Heçî Şaqeyê Miksê, Şomo
23	Zîrekî, fêlbazî, zordestî û cehalet	Çeteci ‘Ebdullah Paşa
24	Bêaqlî, cehalet û kurnazî	Mam Bapîr
25	Camêrî, sexawêtî, dilsafîbûn	Sisoyê Burukî, Sultan Murad
26	Namûs, îffet, îxanet û fêlbazî	Cinar Axayê Wanî, Leylê, Îbrahîm Axayê Wanê
27	Dizî, dijminayeti û tolsitandin	Îbrahîm Xan, Îsmâil Axayê Şikeftiyan, Domo û Terlan Axayê Herkî
28	Bawerî, meqam, xapandin	Mela Mehmed, Îsmâil Axayê Şiketiyân
29	Cesaret, talankirin û zilim	Sisoy Berazan, Kelhê û Ehmê, Eyyub Axayê Milî û Namik Paşayê Xelebê
30	Îftira, derew, fêlbazî, deq û dolabên jina	Huseyîn Axayê Zilî, Ehmed Feqî, Belo û Madoyê File
31	Bawerî, xapandin û cehalet	Mîr Îzeddin Hekarî, Keloy3e File
32	Paqijî, tendustî, cehalet	Îshaq Paşayê Bazîdî, Huseyîn Qulixan, Mîr ‘Elî Hekîm
33	Dostanî, mewandarî û bêrûtî	Şeref Axayê Elîkan, Şêx Tarîê ‘Ereb.

34	Zilim, te'dayî, dakirkirin û azayetî	'Eskerxanê 'Ecem, Xan Ebdalê Dimdim, Mîrê Çepilzêrîn, Gewher Xanim û Asme Xanim
35	Xîyat, dêmarî, namus û exlaq	Mîre Begê Adıyan û Dijwar
36	Xapandin, şêlandin, bawerî û cehalet	Hezretî Hizir, Weliyê Xwedê
37	Çavbirçîtî, xezîne, dua, mewandarî û rêzgirtin	Şatirê Filê û Paşayê Wanê
38	Casûsî, talankirin, camêrî û azadî	Mehmûd Paşayê Bazîdî, A. Jaubert, Nûşîrwan û Rehîme Xatun
39	Bêxîretî, bindestî, serxwebûn û mêrxasî	Sileman Axayê Sipkan, Huseyîn Axayê Zilî, Zemanxan Ayromıyan û Sultan 'Ebbas Mîrza
40	Zilm û te'dayî, şêlandin, rêgirtin	Melîke Xatun, Hafız Axa

ENCAM

Mele Mehmûdê Bazîdî di warê dîrok, ziman, edebiyat û çanda Kurdî da xebatên giranbiha kirine. Girîngîya Mele Mehmûdê Bazîdî yê zana û piralî ancax piştî ku sed û pêncî salî zêdetir derbas bûye, ango ve sedsalê roja îroyîn zêdetir tê famkirin. Her ku berhem û xizmetên wî dibin mijara lêkolînên zanistê, careke din derdikeve meydanê ku Bazîdî pêşengîya gelek cûreyên wek zanist, dîrok, edeb û di warê gelek mijarên Kurdî yên din kirîye. Ji van cureyan yek jî çîrok nivîsandin û kesayetên dîrokî yên di nav hikayetên xwe da hebandine, ku bûye mijara vê xebatê.

Çîrokên Mele Mehmûdê Bazîdî hem ji hêla dîrok, folklor û wêjeyî hem jî ji hêla civaknasiyê ve girîng in. Meriv dikare bêje ku, wî bi çîrokên xwe wêneyê civaka dema xwe kişandiye. Di resma ku kişandiye da her civak bi rengê xwe neqîş kiriye li ser wêneyê. Çi etnîsîte, çi bawermendên dînên cuda cuda, çi eşîr, çi malbat çi ermenî, nastûrî, frengî, ereb, tirk, faris, êzîdî, kizilbaş, sunnî, êris hemûyan renk dane van çîrokan. Ji ber vê jî taybetmendiyên çîrokên Mele Mehmûd Bazîdî raste rast di nav erdnîgarî û civaka Kurdan da yên tên gotin û berbiçav, wekî gotinên edebî, pendên mezinan, tecrubeyên sîyasetmedaran hwd. curbicur in.

Em di dawîya xebatê yek bi yek di derbarê van çîrokên gelêrî da gihîştin vê geneetê. Naveroka çend ji wan çîrokan ev in: Çîroka yekê, di derbarê tamahîya Meleyan a ji bo malê dinê û menfeetperestî û ezûezîtîya wan de ye. Çîroka çaran di derbarê rêbirîya di Kurdistanê de û encamên wê yên di civatê de ne. Çîroka pênc û şeşan, rola pere û tamatîyê ya di mejî û hindurê însanê de nîşan didin Çîroka 9an, mesela bûyera di navbera Şêxî Begê mirê Miksê yê mamê Xan Mehmûd û Xan Evdal û birêvebira Kela Şaxê Adîle Xanimê de qewimî ye de ye. Çîroka 12an, di derbarê serpehatiyeke evîniyê ku li Kurdistanê gelek belav e de ye, yanî li ser evîniya Hesên Axa û Lalîxana Goveyî de ye. Çîroka 13an, bi varyant û naveke cihê, di derbarê serpehatiya bûyera evîniyê ya Siyabend û Xecê de ye. Çîroka 15an, di derbarê bûyera di navbera mala Elaeddîn Begê hakimê Rojkan Şêx Ehmedê Çiplaq û Îsmâil Begê hakimê Elcewazê de ye. Çîroka 21an, di derbarê kuştina Şekir Axayê mezinê Eşîreta Giraviyan a girêdayî federasyona Hertuşîyan de ye. Ev Şekir Axa di nav xelkê de bi navê Şekir Axayê Mezin jî tê naskirin. Wisan dixuyê ew yan bapîrê Ebubekir Axayê Giravî yan jî bapîrê bavê Ebubekir Axa be. Çîroka 34an, di derbarê bûyera tiltezin û xwînavî ya Kela Dimdimê de ye. Çîroka 39an jî, di derbarê

serpêhatiya gerokekî fransiz ê navê wî Pierre-Amedee Jaubert a di sala 1804an de li Bazîdê qewimiye de ye.

Belê, li vir lib lib li ser sekinandina hemû çîrokan ne mimkun e. Çîrokên din jî, di derbarê bûyerên civakî yên di nav gel de yên wekî dizîya dêran, şelandin, kuştinên li ser meseleya namûsê û yên wekî wan de ne, ku dixuyê piraniya wan rast bin, di nav xelkê de hatibin axavtin û Mele Mehmûd jî ew çîrok berhev kiribin û nivîsandibin.

Mele Mehmûd layekê din va bala mirovan dikşîne li ser navê leheng û qehremanên herêma Kurdan yên rasteqîn in. Navên lehengên dîrokî û karakterên wan hevûdu dipêjirînin û tamam dikin. Bi xweşikbûn, pakbûn, îfet û cesareta xwe Guzel Xatûn, bi mêrbûn û cesareta xwe Cergo; bi dilpîsî û nankorî û hêstên gemarî Kirêt, bi ‘edelet û durusbûna xwe va Nuşîrwan, bi safbûn û mêwandariya xwe ve Sisoyê Birûkî û Elî Nasrin û dilêrî, qehremanî, ceng û berxwedana xwe ve ehlê kela Dimdimê û herdû birayên dilêr Ehmê û Kerhê derdikevin pêş.

‘Adat û nêrîtên civakî di gelek çanda miletan da dişîbin hev û gelek çand li hember bûyerekî, bertekên nêzîkî hev didin. Wek mîna kuştina jinên nesadiq û bê îfet, di çîrokan de wekî dehatûya sadiqbûnê ye. Di çîrokên Bazîdî da jî tê amaje kirin aqûbet û dawîya Werdê, Leylê û dêmariya Dijwar mirin e. Bazîdî ji bo vê ‘adetê Kurdan di berhem û çîrokên xwe da wiha dibêje: *“Bedgumanî nakin îlla ku xerabiyê bibînin û yeqîn bikin elbette bilmecal ewê jinê dikujin û mêr jî. Êdî ewan xwîn tune. Kesek li wan nabe xweyî. Ekrad hemû qebehetan dibine xweyî lakîn li şolê xerab nabine xweyî. Lewranê li nik wan qewî eyb e.”*

Ev çil çîrokên ji aliyê Mele Mehmûdê Bazîdî ve hatine nivîsandin, xwediyê hinek taybetmendîyan in û wekî ew çîrokên ku em dizanin nîn in. Ew hemî ji bûyerên rasteqînî yên di nav xelkê Kurdistanê de qewimî ne pêk hatine. Mele Mehmûdê Bazîdî ew bi wersiyona di nav xelkê de tê gotin nivîsandine û ew kirine çîrok û bi awakî xweşik û hêja pêşkêş kirine. Ew navên kesan, gundan, cîyan û heta tarîxên tê de hatine bikaranîn, hemî yên rasteqînî ne. Ji ber vê, her yek ji wan li ser serpêhatî û bûyerekê ye.

Di nav vê berhem û hinek çîrokên Mele Mehmûd da şerê Mîrektiyên Kurdan jî hatîye bahskirin. Dema mîrektiyên kurdan beşek ji dîroka Kurdan e. Lê di derheqê mîrektiyên Kurdan de zanînen me kême û qels in. Lêkolînen xurt divê li ser mijara

dîroka mîrekiyên kurdan bê kirin. *Şerefname* û *Dîroka Kurdan Mêjûwa Dewlet û Mirneşînyên Kurd* ya M. Emin Zekî Beg di vî warî de berhemên girîng in. Di çîrokên Mele Mehmûdê Bazîdî de temaya têkoşîna desthilatdariyê ya di navbera mîrên kurdan û têkoşîna Osmanî-Îranî û Osmanî-Bizansiyan jî gelekî balkêş e. Di van çîrokan de cureyên tekoşînê ên wekî dîplomasi, siyaset, şer, hîle û deq û dolabên jina bûne mijara çîrokan ku tev jî hatiye bikaranîn.

Di dawiyê de em dibêjim ku bila gora Mele Mehmûdê Bazîdî tijî nur be ku evan çîrok, berhem û bi dehan berhemên din ji me re li pey xwe hîştine. Bi hêviya ku em bikaribin rojekê hemu berhemên wî wekî orjînalên wan bi xwe transkirîpteyê alfabeya latînî û gelek zimanên dinyayê bikin, ku nivşên nû bikaribin jê sûd werbigirin. Li ser berhem û gotinên wî zêdetir xebat û lêkolînan bikin.

ÇAVKANÎ

Adak, A. (2014). *Destpêka Edebîyata Kurdî Ya Klasîk*, Stenbol: Weşanên Nûbiharê.

Alexsandre Jaba, (2000). *Çîrokên Kurmancî*, Stocholm: Weşana Çanda Nûjen.

Avcı, Z. (2012). “Mele Mehmûdê Bazîdî (1799-1867)”, *Kovara Bîr*, Hejmar: 10.

Baba Tahîrê Merdoxî, (2012). *Mêjûy Edebî Kurdî*, Hewlêr: Weşanxana Korî Zanyarî Kurd.

Babaoğlu, İ. (2013). “Kurteçîrok Hestên Kurdan in”, *Kovara W*, J. 47, Stenbol, 52

Bilge, E. (2013). *Ji Hêla Naverokê ve Dahûrîna Çîrokên Mele Mehmûdê Bazîdî*, Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî, Teza Lîsansa Bilind, Mêrdîn.

Bozkoyun, M. (2015). “Beşek Ji Folklorê Kurdî: Çîrok,” *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, 2, 142-157.

Can Dost, “*Muqaddimetü Kitâbî Âdâtî'l-Ekrâd ve Tekâlîdühüm li-Melâ Maħmûd el-Bâyezîdî*”, <http://www.medaratkurd.com/?p=60>, Ragîhandin: 28.06.2018.

Cemal Nebez, (2003). *Emîr Al-Kurdî Mîr Mihemed El-Riwanudizî* (Wer: Fexrî Sîlahşor), Hewlêr: Weşanên Aras.

Cewerî, F. (2003). *Antolojiya Çîrokên Kurdî (1856-2003)*, I-II, Çapa Yekem, Stenbol: Weşanên Nûdem.

Cindî, H. (1996). *Hikyatên Civata Kurdan*, (Transikrîpsiyon: Şefîk Kaya) Stockholm: Weşanxana Apec.

Çelik, M. (2015). ‘*Adat û Rusûmatnameê Tewayîfê Ekradiye ya Mele Mehmûdê Bazîdî (Metn û Lêkolîn)*, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Teza Lîsansa Bilind A Çapnebûyî, Mêrdîn.

Demîrhan, U. (2007). *Ferhenga Destî Kurdî Bi Kurdî*, Agrî: Weşanên Sewad.

Denîz, S. (2013). “Destpêka Çîrokê” *Kovara W*, J. 48, Diyarbakır: Weşana Enstîtuya Kurdî ya Amedê, 64.

Ebdullah Varlî, (1997). *Dîroka Dûgelên Kurdan (600-1500)*, Stenbol: Weşanên Sîpan.

Ebdullah Varlî, (2004). *Dîwan û Jînewarî Ya Ehmedê Xanî*, Stenbol: Weşanên Sîpan.

Ehmedê Xanî, (2005). *Cewheru'l Me'anî Fî Şerhu'l Dîwanu'ul Ehmedî Xanî*, (Wer.: Tehsîn Îbrahîm Doskî), Duhok: Weşanên Spîrêz.

Ehmedê Xanî, (2008). *Hemû Berhem* (Berhevkar: Kawa Nemir, Selîm Temo), Weşanên Lîsê, Stenbol.

Ekinci, M. (2017). *M. Emin Bozarşan'ın "Meselokên Lawiran" Adlı Hayvan Masalları Serisinde Yer Alan Hayvan Motifleri Üzerine Bir İnceleme*, Muş Alparslan Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Teza Mastirê, Muş.

Enwar Muhammed Tahir, (1998) "Rola Kovar Hawar Jibo Pêşhistina Çîroka Kurdî Ya Hunerî", *Kovara Metîn*, J.75, 35.

Epözdemir, Ş. (2015). *Medreseyên Kurdistanê*, Stenbol: Weşanên Nûbiharê.

'Elaeddîn Seccadî, (2011). *Mêjûy Edebî Kurdî*, Senendeç: Weşanên Întîşarata Kurdistanê.

'Êlî Ekber Kurdistanî, (2010). *Ferhenga Kurdistanî*, (Wer: Jan Dost), Stenbol: Weşanên Nûbiharê.

Fûad Temo, (2013). "Çîrok", *Kovara Rojî Kurd*, Çapa Yekem, Stenbol: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, 121-122.

Gültekin, M. "Di Arşîva Osmanî de Mela Mahmûdê Bazîdî", *Kovara Nûbiharê*, h. 130,16-18.

Gültekin, M. "Di Arşîva Prof. Ferdinaand Justi de Mela Mahmûdê Bazîdî", *Kovara Nûbiharê*, h. 131,11-8.

Gültekin, M. "Mîrên Herêma Bazîdê û Seraya Îshaq Paşa", *Kovara Zend*, h. 24, 3-8.

Gültekin, Mehmet-Nihat-Bahar, (2013). *Salnama Ehmedê Xanî 2012*, Stenbol: Weşanên Belge.

Güzel, Ş. (2018). *Lêkolîneke Sentaksî Li Ser Berhema Camî'eya Rîsaleyan û Hikayetan*, Zanîngeha Mûş Alparslan Enstîtuya Zanistên Civakî Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Teza Mastirê Ya Çapnebûyî, Mûş.

Haşîm Ahmedzade, (2004). *Ulus ve Roman*, (Wer. :Azad Zana Gündoğan), Stenbol: Weşanên Pêrî.

Îzeddîn Mustefa Resûl, (2012). *Mêjûy Edebî Kurdî*, Silêmanî: Weşanên Honrewy.

Îzolî, D. (2013). *Ferheng Kurdî-Tirkî, Tirkî- Kurdî*, Stenbol: Weşanên Deng.

J. S. Mûsaêlyan, (1988). “Mele Mehmûd Bayezîdî”, *Kovara Roja Nû*, H.54.

Kerîm Şareza, (1961). *Koye û Şairên Wê*, Hewlêr: Weşanên Sipîrêz.

Kurdistan Mukrîyanî, (1980). *Honrewy Afretî Kurd Lêkolînewe*, Hewlêr: Weşanên Aras.

Kutlay, N. “Mele Mahmûdê Bazîdî”, *Kovara Nûbiharê*, h. 109,37-38.

Mazi, Ç. (2014). *Baxek Ji Folklorê Kurdî*. Stenbol: Weşanên Berbangê.

Me’ruf Xeznedar, (2010). *Mêjûy Edebî Kurdî, I-VII*, Hewlêr: Weşanên Aras.

Mele Mehmûd Bazîdî, (2012). ‘*Adat û Rusûmatnameê Ekradiye*, (Amd.: Jan Dost), Stenbol: Weşanxana Nûbiharê.

Mele Mehmûdê Bazîdî, (2010). *Cami’eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, (Amd.: Ziya Avcı). Stenbol: Weşanên Lîs.

Mele Mehmûdê Bazîdî, (2007). *Şerefnameya Şerefxanê Bidlîsî Tercumeya Mele Mehmûdê Bazîdî*, (Amadekar: Seîd Dêreşî), Duhok: Spîrêz Pres.

Mele Mehmûdê Bazîdî-Alexandrê Jaba, (1860). *Recueil De Notices et Récits Kourdes*, St. Petersburg: Weşanên Bîblografîqa.

Mohmed Emin Zekî Beg, (2001). *Mêjûwa Dewlet û Mîrneşînyên Kurd*, (Wer.: M. S. Cuma), Hewlêr: Weşanxana Zanyarî Kurd.

Muhammed Emîn Zekî Beg, (2011). *Dîroka Kurd û Kurdistanê*, Stenbol: Weşanên Nûbiharê.

Muhsin Seydâ, “*Mellâ Maḥmûd el-Bâyezîdî ve'l-ḥurûc ‘ani'l-me’lûf*”, <http://www.syriakurds.com/2007/adab/mulla.html>. Ragihandin: 10.07.2019.

Murad Celalî, (2016). “Mele Mehmûdê Bazîdî (1797-1867)”, *Kürt Tarihi Dergîsî*, H.27, 5-11.

Murad Celalî, (2016). *Mele Mehmûdê Bazîdî û ‘Adat û Rusûmatnameê Tewayifê Ekradiye*, Stenbol: Weşanên Nûbiharê.

Omer Marûf Berzencî, (1978). *Lêkonînewe û Biblografyay Çîrokî Kurdî (1925-1969)*, Baxda: Korri Zanyarî Kurd.

Ordîxan - Celîlê Celil, (2013). *Zargotina Kurda I-II*, Amed: Weşanên Aram.

Öncü, M. (2014). *Çîrokên Efsaneyî Yên Kurda*. Stênbol: Weşanên Nûbiharê.

Öner, A. (2017). *Di Edebiyata Gelerî ya Kurdî da Di'a û Nifir*, Zanîngeha Wan Yüzüncü Yilê, Enstitüya Ziman û Çanda Kurdî, Teza Mastirê, Wan.

Öner, A. (2019). *Tarihi ve Kültürü ile Doğubayazıt*, Zanîngeha Wan Yüzüncü Yilê, Enstitüya Zanîsten Civakî, Teza Mastirê, Wan, 10-20.

Öztürk, M. (2018). “Çîrokên Werger Ên Mele Mehmûdê Bazîdî (1797-1870)”, *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, H. 8, 33-63.

Pertev, R. (2009). *Zarok û Çîrok (Destpêka Pedogojiya Kurdî)*, Stenbol: Weşanên Doz.

Pertev, R. (2015). *Edebiyata Kurdî ya Gelêrî*, Stenbol: Weşanên Avesta.

Pîrbal, F. (2000). *Mele Mehmûdê Bayezîdî (1799-1860) Yekemîn Çîroknûs û Pexşannûsî Kurd*, Hewlêr: Weşanxane Aras.

Pîremêrd, Tewfîq Silêmanî, (1939). *Guldestyî Şu'era'yî Haw'esrim (Gulçîna Gulistanê)*, Silêmanî.

Qanatê Kurdo (2010). *Tarîxa Edebyeta Kurdî*, Stenbol: Weşanên Lîsê.

Reşîd Findî, (2006). *Pirtûka Adad û Rumetnameya Ekradiye Ya Mele Mehmûdê Bazîdî*, Spîrêz, Çapa I, Hewlêr, 3.

Rohat Alakom, (2014). “Bir İzmir Lavanteni Auguste Jaba”, *Kovara Kürt Tarihi*, h.11.

Ronî War, “Şaristanî” *Kovara W*, h. 25, Stenbol 2009, 38-42.

Sağniç, Feqî Huseyn (2014). *Dîroka Wêjeya Kurdî*, Stenbol: Weşanên Enstîtuya Kurdî Ya Stenbolê.

Sedîq Borekeyî Sefîzade, (1951). *Mêjûyî Wêjeyî Kurdî*, Sine: Weşanên Tebrêz.

Sönmez, N. (2018). *Dîwana Şêx Muşerrefê Xinûkî*, Çapa 1ê, Diyarbakır: Weşanxaneyê Seyda.

Şerefxan Bedlîsî, (2012). *Şerefname Dîroka Kurda*, (Wer.: Zîya Avcî), Stenbol: Weşanên Avesta.

Şukriye Mustafa Resul, (1982). *Dab û Nerîfê Kurdekan*, Çapî Yekem, Bexda: Weşanxaneyê Korî Zanyarî Kurd.

Şukriye Mustafa Resul, (2009). *Rolê Magred Rudenko Zindikirdina Keleporî Kurdî Da*, Çapî Yekem, Hewlêr: Weşanxaneyê Zankoyî Selaheddîn.

Têmûrê Xelîl, <http://www.pen-kurd.org/kurdi/Mehmudbikurdi.html>, Ragihandin: 21.007. 2019.

Torî, Mehmet Kemal, (2004). *Ferhenga Torî*, Stenbol: Weşanên Berfin.

Uzun, M. (1995). *Antolojîya Edebîyata Kurdî*, Stenbol: Weşanên Aram.

Xelîl Duhokî, (2002). “Mele Mehmûdê Bazîdî” *Gulîstan*, Hejmar I, 73-84.

Yıldırım, K.- Pertev, R. - Aslan, M. (2013). *Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî*, Mardin: Weşanên Mardin Artuklu Üniversitesi.

Yıldız, A. (2017), *Hunera Vegotina Bedew a Devkî û Nivîskî*, I-II, Weşanên Lorya, Stenbol, 229.

Yusuf, Abdulreşîb (1988). *Şairên Klasîk Ên Kurd*, Uppsala / Sweden: Weşanên Jîna Nû.

Zagrosî, Aso. “Mele Mehmûdê Bazîdî” <http://aso-zagrosi.overblog.com/article-mella-mehmude-beyazidi-1797-1870-50904238.html>, Ragihandin: 10.07.2019.

Zahir Rojbiyanî, (1997). *Çîrokê Hunerê Kurdî (Şewê, Şewaz û Bunyad)*, Çapî Yekem, Hewlêr, Çapxaneyê Rewşenbîrî.

Zana Farqînî, (2004). *Ferhenga Kurdî-Tirkî*, Stenbol: Weşanên Enstîtuya Kurdî Ya Stenbolê.

Zeynelabidîn Zinar, (2006). “Hunera Folklorê Kurdî”, *Kovara Nûbiharê*, J. 99, Stenbol, 18

Zeynelabidîn Zinar, (1989). *Xwençe I-XII*, Stokholom: Weşanên Çanda Kurdî.

Zeynelabidîn Zinar, (1991). *Nimûne Ji Gencîneya Çanda Qedexekirî*, Stockholm: Yekîtîya Nivîskarên Kurd.

JÎYANAME

Di sala 1976'an de li navenda bajara Hewlêrê ji dayîk bûye. Perwerdeya xwe yî seratayî li navenda heman bajarê biriye serî û amadeyî li Hewlêrê teman kiriye. Zanîngeh jî Selaheddin beşa Ziman û Edeba Kurdî li sala 2000-2001 da qedandîye. Pişt ra ji wek mamostê Ziman û Edeba Kurdî di Wezerata Perwerdehîyê da dixebite.

Di asteka bilind da zimanê Kurdî û Erebî û Farsî heta radekî jî Îngilîzî dizane.

